

K.T
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YÎLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



TEZA LÎSANS A BİLİND

**ROLA ROJNAMA BÎZAV DÎ PÊŞXÎSTÎNA HELBESTA KURDÎ LÎ DEVERA
BEHDÎNAN**

Qabeel Muhemed Mawlwd MAWLWD

14950001072

VAN – 2016

**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

Yüksek Lisans Tezi



**BEHDİNAN BÖLGESİNDE KÜRT ŞİİRİNİN İLERLEMESİNDE BİZAV
GAZETESİNİN ROLÜ**

Qabeel Muhemed MAWLWD

14950001072

Danışman

Yrd. Doç. Dr.Nesim SÖNMEZ

VAN – 2016






T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, QABEEL MOHAMMED MAWLOD MAWLOD tarafından hazırlanan “Binyata “ROLA ROJNAMA BİZAV Dİ PÊŞXİSTİNA HELBESTA KURDÎ Lİ DEVERA BEHDÎNAN” adlı bu çalışma, 16/12/2016 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan (Danışman) :	Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ	İmza: 
ÜYE :	Yrd. Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR	İmza: 
ÜYE :	Yrd. Doç. Dr. Ayhan TEK	İmza: 
ÜYE :	İmza:
ÜYE :	İmza:

Yukarıdaki imzalar, adı geçen öğretim üyelerine aittir.


Prof. Dr. Murat DEĞİREKEL
Enstitü Müdürü


ETİK BEYAN SAYFASI

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada (**ROLA ROJNAMA BIZAV DIPÊŞXISTINA HELBESTA KURDÎ LI DEVERA BEHDÎNAN**);

- ✚ Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- ✚ Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- ✚ Tez çalışmada yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
- ✚ Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- ✚ Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

Qabeel Muhemed MAWLWD

16/12/2016

**EV NAME GER XIRAPE GER QENC
ME KÊŞAYE DIGEL WÊ DÛSED RENC**

XANÎ

NAVEROK

NAVEROK.....	I
SUPASÎ:	II
KURTE:.....	IV
ÖZET	V
SUMMARY	VI
KURTEBÊJE.....	VII
PÊŞGOTIN:.....	VIII
DESTPÊK:	1

BEŞA YEKEM

1. SERHELDANA ROJNAMEGERYA KURDÎ	6
2. DÎROKA ROJNAMEGERYA KURDÎ:	7
3. ROJNAMENIVÎSA KURDÎ JI ALIYÊ NAVEROKÊ VE.....	12
1. Rojnamenivîsa Edebî.....	12
2. Rojnamenivîsa Hunerî:	14
3. Rojnamenivîsa Zansitî:	15
4. Rojnamenivîsa Perwerdeyî.....	16
5. Rojnamenivîsa Aburî:.....	17
4. Rojnamegerya Kurdî Dinavbera Salên (1898-1909)an de.....	18
1. Kurdistan (Rojname, 1898-1902):	18
2. Hevkarî û Pêşketina Kurd (Rojnamey, 1908):.....	26
3. Rojhelat û Kurdistan (Rojname: 1908):.....	30
4. Peyman (Rojname, 1909):	31
5. Amîd û Sewda (Rojname, 1909):	32
5. Pêşengên Rojnamegerya Kurdî.....	33
1. Pîremêrd: (1867-1950):	34
2. Seîdê Kurdî: (1873-1960):.....	38
3. Sureyya Bedirxan: (1883-1938):	41
4. Xelîl Xeyalî:	42
5. 'Ebidulla Cewdet: (1869- 1932):	47

BEŞA DUYEM

ROLA ROJNAMA BİZAV DÎ PÊŞXÎSTÎNA HELBESTA KURDÎ LÎ DEVERA BEHDÎNAN.....	50
1. ROJNAMA BİZAV:	51
2. ÇI DERBARÊ ROJNAMA BİZAV HATIYE NIVÎSÎN	54
3. KUM KIRIN SAXKIRINA BELAV KIRYÊN VÊ ROJNAMÊ:.....	54
4. DR. NAFI' AKREYÎ JIYAN Û BERHEMÊN WÎ:.....	55
5. Rolê Rojnama Bizav Dipêşxistina Helbesta Kurdî Li Devera Behdînan: .	56
6. ÇEWANYA HATINA 'ERÛZÊ DI HELBESTA KURDÎ DE:	57
7. HELBEST DI ROJNAMA BİZAV DE:	59
7.1. RUXSARÊN HELBESTÊN ROJNAMA BİZAV:	61
7.1.1. Kêş:	62
7.1.1.1. Kêşa 'Erûzî:.....	63
7.1.1.2. Kêşa Xomalî:.....	66
7.1.1.2.1. Kêşên Sade	67
7.1.1.2.2. Kêşên Lêkdayî:.....	68
7.1.2. Helbesta Nû:.....	76
7.1.3. Helbesta Nûxaz:	78
7.1.4. Serwa.....	79
7.1.4.1. Serwayên Êkgirtî:.....	80
7.1.4.2. serwaya hemereng	81
7.1.5. Zimanê Helbestê:	84
7.2. NAVEROKÊN HELBESTÊN ROJNAMA BİZAV:.....	86
7.2.1. Helbestên Nîştîmanî û Siyasî.....	86
7.2.2. Helbestên Evînî û Viyan:	93
7.2.3. Pesin (Medih):.....	97
7.2.4. Helbestên Biyanî û Ewên Ji Latînî û Sîlavî Hatine Zivrandin..	102
7.2.5. Helbestên Civakî	105
7.2.6. Helbestên Ayînî:	108
7.2.7. Helkeft û Bîrewerî (Munesebat):	110
7.2.8. Pêgutin û Tazî:	113
7.2.9. Helebestên Zaroka:	114
7.2.10. Biyanî Peristin:	115
ENCAM.....	117
LÎSTA JÊDERA.....	119

SUPASÎ:

- * Supas ji bo xwedayê mezin ku ez gehîştîme vê rojê min xwandina xwe bi xweşî
temam kir.
- * Supasya (Yird. DOÇ. Dr.Nesim SÖNMEZ) dikem ku erkê şêwermendê ji min re
kir û hertim digel min harîkar bû her ji dana zanyarî û asankirin û şîretan û digel
min mandî bûy.
- * Supasya hevsera xwe dikem ku hemî dema hander û harîkara min bûye li nivîsîna
vê namê.
- * Supasya malbat û xuşk û birayên xwe dikem ku hertim piştevanê min bûn.
- * Supasya malbata (Seîda Mela Mihemedê Îmam) dikem bi taybetî (M. Minîb Mela
Mihemed Îmam) ku hertim piştevanê min bû.
- * Supasya (Dr. Erdelan Îsma'îl 'MER) ku yekem kes bu her ji dest pêkê heta dawyê
ji hemî aliyan digel min harîkar bû .
- * Supasya hemî mamostayên diwanawendya mela ehmedê îmam bi taybetî (M.
Liqman Hekîm, M. Beyar Sedîq).
- * Supasya (Dr.'Îmad Weysî, Dr.Mes'ud Cemîl, Dr. Newzet Ehmed, M. Behroz
Mîru, M.Mekinun Mihemd, M.awad mirad) hemî wan heval û mamostayan ku
harîkarya min kirine.

Qabeel Muhemed MAWLWD

VAN – 2016

KURTE:

"Rola rojnama bizav di pêşxistina helbesta kurdî li devera behdînan de"

Rojnama bizav rojnameyeka rojaneye siyasî ye giştî ye, her weha rojnameyeka hikumî ye yekem jimara wê li 1/8/1989 li şarê bexda dest bi weşanê kir, dawî hijmara wê jî (56) bû bi egerê nebûna parey dewletê piştigîrî lê nekir li 28/8/1990 hat ragirtin ta niha jî ji aliyê tu kesî tu aliya hewl nehatiye dan ku ev rojnameya dîsa dest bi weşana xwe biket ve.

rojname bizav giringyeka zor li kurdistanê hebu bi taybetî devera behdînan hebû, ev rojnamaye mîna penagehekê bû ji bo rewşenbîr û nivîser û ronakbîr û hejê kerê helbesta kurdî, her weha vê rojnamê ji çendîn aliyê din rolê xwe hebû bi taybetî di meselên siyasî çendîn babet bi awayekê raste rast bi hsa qezya netewa kurd û serkirdên kurdan dikir eva he li wî serdemî tiştekekê pir giring bû çunkî jiber zulm û zordarî û direndeya rijêmê kes nediwêra çî bas û babetan veket, vê rojnamê rolekê baş dibiyavê wergêranê hebû hijmareka zora helbestan ji zimanên biyanyan veguhastîne ser zimanê me.

rolê here sereke divê rojnamê de me xwast ji ser biskinin û mijara xwe ji ser piraktîze bikîn li jêr navê" rolê rojnama bizav dipêşxistina helbesta kurdî li devera behdînan de", helbest zêdetir hemî babetbên dinê edebî bandora wê li ser civakî hebû, ji aliyekê din mîna weçerxaneka nû di helbesta devera behdînan ji aliyê naverok ruxsarê ve berpa kir, helbest ji wan qeyd û zincîrên kevin rizgar kirku hozanvanên kilasîkî pê hatbûne girêdan û nedikarîn ew hest soz û meremên xwe bigehînin, serwa jî ta astekê here baş berev pêş çû hijmareka zora wan helbestan serwayê nû bikarînayne nehatbûne girêdan bi çend serwayên diyarkirî.

Ev rojnameye take rojname bû li wî demî bi devoka behdînî derbikevît her ev egere jî bûye ku hijmareka zora hozanvanan ji her dû regezan mîna şoreşekê li hember wan kawdanên siyasî û ew hemî hezu viyan meremên siyasî û aynî û civakî û..... Hud xwe zêdetir bi awayî cevengî(sembol) binvêsn belav biken, helbestên rojnama bizavê bi kurdiyeka resen dûr ji peyvê biyanyan dihatine belavkirin.

ÖZET

BEHDİNAN BÖLGESİNDE KÜRT ŞİİRİNİN İLERLEMESİNDE BİZAV GAZETESİNİN ROLÜ

Bizav gazetesi günlük çıkan genel bir siyasi gazetedir. İlk sayısı 01.08.1989 yılında Bağdat şehrinde yayınlamaya başladı. 28.08.1990 yılında maddi sıkıntılardan dolayı devlet yardımı da olamayan gazete, 56. sayısında yayını durdu. Bu güne kadar da hiç kimse tarafından tekrar yayına başlaması için bir çaba da olmadı.

Bizav gazetesinin Kürdistan da özellikle behdinan bölgesinde bir ağırlığı vardır. Bu gazetenin Kürt şiiri yönüyle aydın, yazar ve akademik çevre üzerinde etkisi oldu. Birkaç yönüyle daha özellikle de siyasi meselelerde birçok konuda doğrudan doğruya Kürt milleti ve Kürt öğrencilerinden bahsediyordu. Buda o dönemde çok önemli bir şeydi çünkü rejimin korkusundan zalim ve zulme karşı kimse cesaret edemiyordu ki bir konuda görüş beyan etsin. Aynı zamanda bu gazete birçok sayısında yabancı dillerden şiir çevirisi de yapıyordu.

Bu gazetenin en önemli rolü behdinan bölgesinde Kürt şiiri üzerinde durmasıdır. Bizde istedik bu konun üzerinde duralım. Bölgede bütün konularda şiirin toplum üzerinde edebi bir tesiri vardı. Başka bir yönüyle de behdinan bölgesinin şiirlerini içerik yönüyle bir yayın evi/matbaa gibi göz önüne getiriyordu. Şiiri şairlerin bağlı olduğu klasik kayıt ve yapıdan kurtardı. Böylece vezin ve kafiye modern bir aşamaya geldi.

Yeni imajlı gazetenin birçok nüshasında şiirlerin içerik ve şekil yönüyle ilerlemesi sağlandı. Bu dönemde bizav gazetesi behdinan lehçesiyle çıkıyordu ki birçok sayısında şairler içerik ve şekil bakımından her iki metotla- eski, yeni- o günkü siyasi ortamda bir dava gibi toplumsal, ekonomik ve siyasi görüşlerini dile getirdiler... Taki sembolik bir tarzda daha çok yazarak yayılması için bizav gazetesinin şiirlerini yabancı kelimelerden arınmış bir şekilde düzgün bir Kürtçe ile bastırıp yayılmasını sağlamak hedefliydi.

Anahtar Kelimeler: Gazete, Bizav gazetesi, Kürt şiiri, behdinan bölgesi.

SUMMARY

" The role of Bzav newspaper in developing Kurdish Poetry in Bahdidan region"

Bzav Newspaper is a daily newspaper, political, general as well as it is a government newspaper. Its first copy started publishing on 1/8/1989 in Baghdad city, and its last copy was (56) and stopped to be published because of financial problems the government didn't support it and on 28/8/1990 it stopped publishing and till now no one wanted to try to help it to start publishing again.

Bzav Newspaper had a special importance in Kurdistan and specially in Bahdinan region, it was like a home for educated people, writers, thinkers and Kurdish poetry lovers, as well as, this newspaper had its important role in many other sectors specially in politic issues, there were many topics deals with Kurdish matter and their leaders directly and this situation was an important thing because of iniquity and atrocity of Iraqi government at that time and no one was able to talk about it, this newspaper had a great role in translating poems, there were so many poems translated from foreign languages to our language.

We wanted to focus on the main role of this newspaper and deal with it practically under the name " The role of Bzav newspaper in developing Kurdish Poetry in Bahdidan region" poetry affected on the society more than other literature subjects, on the other hand, it was a great movement in developing that changed poetry in Bahdinan region in substance and form, it rescued the poetry from old chains that classic poet used to write according to it and they couldn't appear his feelings and wishes, rhyme had been developed too many poems had used a new type of rhyme that had not been depended on ordinary rhymes.

It was the only newspaper that published with the Bahdinani accent and that was the reason behind the great number of poets, male and female published their poets in this newspaper, it was like a revolution for them against political, affectionate, religion, society issues ...etc. they used symbolism in publishing their poems, poems that published in Bzav newspaper used a pure Kurdish language far from foreign words.

KURTEBÊJE

Bnr : Binêre

Ç : Çap

H : Teqwîma Hîcrî

b.n.b : berhema nav borî

Hwd : Her wekî din

J : Jimar

N.M: Nama masterê

N.D: Nama Diktorayê

R.B: Rojnama bizav

C : Cild

Ç.P: Çav Pêkeftin

T: Teb'e

Ko : Kovar

M : Teqwîma Mîladî

R : Rûper

S.x.l : Silava Xwedê Lê be

Wer : Werger

Weş : Weşanger/Weşanxane

P.m: Pêş Mîladî

PÊŞGOTIN:

Rojnamegerya kurdî zimanê qonaxên cuda cudayên jiyana siyasî gelê kurd bûye, her weha xodîka roşenbîr û bwarê rûnakbîrê xwe bûye, diheman dem da dest pêkek bû ji bo drust bûna desteka roşenbîrê şareza di vî bwarî de, ku xizmet bi rojnamegerya kurdî biken û hewla dirust kirina ayindeyekê geş ji bo milletê xwe berhev biken, her weha deng û azar û xem û jan û gazin û hezê xwe bi rêya van kovar û rojname û amêrên gehandinê bigehînin bi hemî dost layengirên xwe li hemî cîhanê.

Li destpêka salên heftêyan ta nohetê ji sedê burî pêvajuya helbesta kurdî li devera behdînan berev weçerxanekê bû îdê helbest bi qalbekê nû û cuda ji caran dihate vehandin, lê neku veqetiyane bû ji kelturî, belku nûkirina dîtin û alavên ş'ri bû, piştî bi rengekekê yan yê dî ketî ye jêr bandora pêlên nû kirinê, ew jî demê helbesta kevin nikarî wekî pêtivî derbirinê ji serdemê taze biket û berisiva pirsên nû bidet, evca helbesta nû rêya xwe girt û bû derbira rasteqîna giyanê çaxê.

Rojnama bizav ta astekê here baş rol hebû di guhrîna helbesta kurdî bi taybet li devera behdînan bi rengekê weha ku dibinyatê wê diforim û tazekirin peyda bûn, ku helbesta serbest dumahîk berê wê bû, helbet eve jî ji bo helbesta kurdyaya devera behdînan diyardeka nû bû, lê heta niha jî jibîlî çend gotar û amajekirinan li vêrê yan li wêrahe, hêj vekolînên ekadîmî li ser helbestê vê rojnamê nehatine kirin, ji ber vê yekê me bi baş zanîn ku vekolînê ji bo rojnamê bikeyn.

Egerê Helbjartinê:

Egerê sereke helbjardna evê nav nîşanî heza vekolerî buye ku babetekê weha dest nîşan biket ji bo dû meremên sereke, yekem babetekê weha ku ta niha tu kesê bi awayê ekadîmî û ne pertûkê taybet ji ser ne nivêsabî, duyem nav nîşanekê weha bit ku dû beşan (ragehandin û kurdî) bi xove bigrît, dîsan behis kirina serheldana rojnamegerya kurdî û berçav kirina jiyana û berhemên çend raberên rojnamegerya kurdî, her weha dest nîşan kirin û piraktîzekirin û şirovekirina ji bo çendîn helbesta ku ewên dirojnama bizav de hatine belav kirin, hozanvanên vê rojnamê mîna raber yan serkêşê bizava nukirin û berev bêş birna helbesta behdînan dihêne niyasîn.

Armanca Mijarê:

Armanca sereke di evê mijarê de xwandineka hor ji bo helbestên hemî jimareyên rojnama bizav, eve bi rêya xwandineka veşartî ji bo têksitê helbestê hatine encamdan, dîsan armanca jê rawestiyane li ser pêkhata huneryên berhemên hozanvanan û diyarkirina rolê ewan pêkhatan diber çavkirina şiyana û ezmûnên huneryên hozanvanan, anku dest nîşankirina ruxsar û naverokê helbestê wana .

Giringya Vê Mijarê:

Herçende gelek mijar dibiyavê rojnamegeryê hatine encamdan, lê ji bo dest nîşankirin û berçav kirina vê rojnamê piraktîzekirina helbestên wê ku bi devoka behdînî nehatine nivêsandin, eve yekem mijare ekadîmîye dihelbestên rojname bizav de hatiye encamdan, her çende dirojnama û çend pertukan de bi kurtî vekolîn

dibwarên cuda cuda li ser vê rojnamê hatine kirin lê behra pitir jiwana gelek şaşî têda têde hene, giringya vê mijarê jiwê çendê xuya dibît ku bi awayekê berifireh behsa derketina rojnamê û girtina wê û rolê helbestê ji aliyê ruxsar û naverokê ve dipêşxistina helbesta kurdî bi taybet li devera behdînan.

Mîtoda Mijarê:

Ev mijare bi mîtoda wesfî şirovekarî hatîye encamdan, vekolîneka wesfîye çunkî saluxetên helbestên rojnama bizav hatîne kirin, dîsa mijareka peraktîkye çunkî hijimareka zora helbestên divê rojnamê de hatine ji aliyê naverok û ruxsarêve hatine peraktîzekirin . .

Arîşên Mijarê:

Nahête veşartin di cêbecêkirina vê xebatê de vekoler tuşî çendîn astengan bû, li pêşya hemyan hejarya pertûkxana kurdî bi jêderên pêtivî, çunkî babetê rojnamegerî babetekê negelekê kevîne taze giringî pê hatî ye dan, her weha arîşa zaravan êk ji astengan bû ku geleg caran neçar bûye pena ji bo dirust kirina hink zaravan bibet, pêxemet bikarît berdewamyê bidete mijara xwe.

Sinurên Mijarê:

Ev mijare li jêr nav nîşana (rolê rojnama bizav dipêşxistina helbesta kurdî li devera behdînan de), anku ev mijare bi dû şeweyan hatiye sinurdar kirin, ji aliyekî ev mijare ji bo dest nîşan kirin û şirovekirina serheldana rojnamegerya kurdî û janerê rojnamegerya kurdî terxan kirye, ji aliyekê din ev mijare taybete bi rolê rojnama bizav dipêşxistina helbesta kurdî li devera behdînan her weha çendîn helbestê vê rojnamê ji aliyê ruxsar û naverokê ve hatine piraktîzekirin û şirovekirin.

Peykerê Mijarê:

Di vê mijarê de kurte bi zimanê (kurdî û turkî û îngilîzî) hatiye nivêsandin, dîsa û supasî û kurtibêjî naverok û pêşgotin û destipêk û ev mijare ji dû beşan pêk dihêt, di destipêkê de bi kurtî behsa rojnamenvîsyê û çemk û cor û dîrokawê hatîye kirin, bi rengê weha ronakyek me daye ser wê çendî ku derketina cara here pêşî li dinyayê û çend welatan mexuya kirye her weha peyva rojname bi çend zimanan me nîşan daye mîna rê xoşkerek ji bo çona nav vî babetî.

Beşa yekem li jêr navê (Serheldana Rojnamegerya Kurdî)ye, di evê beşey de me rojnamenvîsya kurdî ji aliyê naverokê ve çend cor hatine behis kirin, her weha rojnamegerya kurdî dinavbera (1898-1909) çend rojname mîna (Kurdistan û Peyman û Umîd û Sewda ûHud) bi dirêjî hatine berçav kirin, dîsa jiyan berhemên çend raberên rojnamegeryê mîna (Pîremêrd û Seîdê Kurdî û Xelîl Xeyalî ûHud) hatine behis kirin.

Di beşa diwê de, ku li jêr nav û nîşanê (Rolê Rojnamê Bizav Dipêşxistina Helbesta Kurdî Devera Behdînan De), ku têda behsê derketin û girtin û zêdebarî kurtiyek li ser jiyan û berhemê sernivîserî hatîye kirin, her weha behsê rolê helbestên rojnama bizav dipêşxistina helbesta kurdî li devera behdînan de ji aliyê ruxsar (kêş û serwa) û ziman û naverokê ve hatîye kirin, li dawyê de giringtirîn encamên mijarê hatine dest

nîşan kirin û ew jêderên ji bo mijarê mifa jê hatine wergirtin dilîstekêde bi awayê ebcedî hatine rêzkirin.

Li dawyê de dixazim bibêjm ji ber dewlemendya vê rojnamê me nekarî hemî layenên edebî werbigirîn tinê helbest hatiye wergirtin, ev mijare tinê mîna nasandinek bi vê rojnamê û helbestê wê giringî pê hatiye dan, ev xebate jî bê kêmu kasî nî ye lê hîvîdarim karîbim hinek layenê windabûyê vê rojnamê xuyabikem û tiştekê nû dinav cîhana rojmagerya kurdî de zêdebikem.



Qabeel Muhemed MAWLWD

VAN – 2016

DESTPÊK:

ROJNAMENIVÎSÎ: ÇEMK Û COR Û DÎROK:

Rojnamenivîsî wekî her çemk û zarevekê din yê zanistên mirovayetî tinê lêkdanevek ji bo nehatiye kirin belku çendîn boçûn pênasên cuda cuda bo têne kirin, diher guşew avirdaneveyekê ev zarave lêkdaneve bo hatiye kirin lê eve wê çende nagehinit ewa ku pêkhatew naverok û taybemendiya xwe ji dest bidet, belku bayex û giringya xwe jînav zansitên din jî de zêde diket .

Rojnamenivîsî bi giştî erkê wê hişyarkirin û rê nîşandan û bo çûna giştî û bêzarkirina komelgeha kurdî li milî daye, dikarîn bi bêjîn li piştî hersê desthelatê yasa danan û cêbecêkirin û dadiwerî, rojnamegerî bi desthelata çarê li qelem dihête dan, bo carê êkê ev zarave li (sala 1828 ji bo rojname û rojnamenivîsîyê hatiye bi karînan, bi taybetî piştî wê çend rojnamenûsê jêr ew hewalên ku peywendîya wana bi kar û reftarê mîr û kar bi destan ve heye)¹.

Rojnamenivîsî ew çeke ku dû devê wê hene ji aliyekî pêşengî û perwerde cemawerî xelkî diket, û ji aliyekê din jî de bi pêçewane rê rûnker û têkderî rêze yekgirtûyên rolên gel ye, eger bihêt bi xirapî û şaşî bihête bikarînan)².

Lêkdaneva me divê mijarêda ji wê rewangê serdigirî ku bo çoneka rojnamenivîsî ye, rojnamenivîsî ku ji henav û laşê edebî ve ji dayk bûye çunkî ta niha em nikarîn pişka edebê ji rojnamegeryê cuda bikîn, rojnamenivîsî û rojnamegerî rengdanava hemî bwarên jiyane ye û bûye kesek yan endamek ji endamên hemî xêzanan li jiyana rojane de (rojnamenivîsî dilê komelgehê ye û laşê û hestê wane, ew awêneye ku hemî tiştên di rojane me de rû di den nîşa me di den, ne bi tinê her ew tiştin ewên din jî ewên ku li piştî perdeyê rû di den ku em nizanin, rojnamenivîsîyê dihêt ji bo me aşkira diket)³.

Taserdemekê zor tenê rojnameyên çapkirî hebûn jiber vê çendê zaravê rojnamenivîsî li hember corinalîzm û pirêsişda hatye, belê li piştî hatina kenalên mediyayên din pêşkeftina teknîkî di niha de lehemberî rojnamegerîyê dihêt rojnamenivîsa jî bi beşekê serekî pirosa rojnamegeryê dihête hijmartin.

Rojnamenivîsî hunerêkê gelek kevîne dikarîn bi bêjîn digel çap û dahênan û dihête berhem anîn, rojnamenivîsî karekê gelek dîrokî ye û mirov her ji kevîne ve bi hemî hêza xove li hember berjewendî û taybetên xwe dest daye piru pagendekirinê, bi giştî bîru raya vê rêbazê girtiye wekî êk ji pêdivyên jiyane rojane .

1. Kemal Mezher, *Têgeştinî Rastî*, Çapkirawekani Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 1978, r.19.

2. Ebdulcebar Cebârî, *Mêjûy Rojnamegerî*, Weş Jîn, Sulêmanî, 1970, r.17.

3. Isma'îl Îbrahîm Se'îd, *Edebî Rojnamenûsîyê Kurdî Bexda, 1970-11974, Qonaxeka Nû Ye*, Li Belav Kiryên Dezgehên Roşenbîrî û Belav Kiryên Kurdî Wezareta Roşenbîrî 'Îraq J (11), Weş Îlaf, r.7 .

Rojnamenivîsî di latînyê da bi (Journalism) dihêt, ku ji peyva Journal ve hatiye wergirtin, ewîş li peyva Jourî ferensiyê hatiye wergirtin, bi ramana "roj" dihêt, Journal li ferensiyê da bi ramana rojane dihêt, diferhenga ukisford zaravê (Pires) bi ramana rojnamenivîsî dihêt, mebeseta wî ji vê peyvê tişteke peywendiya wî bi çap û belavkiryên zanyaryê nûçeyan ve hebit)⁴, rojname dizimanê îngilîzîda zaravê (Newspaper) ji bo dihête bikarînan*, her weha dizimanê 'erebî da bi zaravê da (El sehafe) ji bo bikar dihêt ku ew kes wî karî dizanit hewalan kom diket li rojname yan govar belav diket*.

Şêx Mihemed Xal dibêjît: (rojnamegerîy: mişxul bûn bi derkirina rojnamê dibexşe)⁵, her weha Dr. Kemal Mezher jî dibêje: (nivîserên kurd zaravê rojnamegeriyê jibo "Elsehafe" bi kardihînin , Belê qisa çend biraderên şehreza e zi welêkirim "rojnamenivîsî" bi karbînim, çunkî zêdetir digel destura zimanê kurdî de lihev dike)⁶ . Li virda em dikarî zaravên (rojnamenivîsîy, rojnamegerî, rojnamewanî) bi van şêwazan bi din niyasîn:

1. Rojnamenuse: herkesek ji bo rojnamê binivîst, îdî ne şerte di nav rojnamê de bit û li dîf kom kirina zanyariyan biçit.
2. Rojnameger: herkesek teknîk li rojnamê de bikarbînt ji bo kom kirinê yan tomalkirinê yan çap kirinê yan dîzayn yan belavkirina rojnamê.
3. Rojnamevan: herkesek li rojnamê da karbiket yan babetan ji bo rojnamê amade biket û li dîf kom kirinave û romalkirina zanyarî yan biçt û bikete babetê rojnamenivîsî, anku layenî pirofîşînalî li rojnamenivîsî ye da digirîteve.

Hemî rojnamevanek rojnamenuse lê eger teknîk bikarîna rojnameger jî belê ne şerte rojnamenuse û rojnameger û rojnamevan bit.

Li serdemê yunanyan de ragehandin biawayekê giştî xwe li wtarê siyasetzan û wesfa dastanên nemirî şeran de ve di dize, mîna ew nivîsên elyade û homîrosî derdikevin, her weha li kitêba komar eflatûn (ku pir bû li zanyaryên bi mifa bi nirix li gotin û tiştên baş û li mezinî û biçûkî ya komarê de xwedî kirina xelkê nêzikê

⁴ .Bnr. Advanced Learners Dictionary, Oxford, 1989, r.981.

*.(Newspaper) Peyveka Lêkday Ye Ji Herdû Peyvên (News) Nûçe (Peaper) Kaxez Ya Rupel Hatîye, Bi Ramane Rupelê Nûçeyan Li Dûmahîya Sedê Hevdê Ev Zarave Di Zimanê Îngilîzî Yê De Hatî Ye Çespandin, Jibo Zanyar Zêdetir Bnr. Li (Sulêman Heyderpur De'wa Îsra, 2001, r. 73)

*. Di Zimanê 'Erebî Da Zaravê (Sehîfe) Yan (Cerîde) Ji Bo Bikar dihêt, Ku Ji Di Bineret Da Li Peyva (Sehîfe) Hatî Ye Bi Ramana Rû Yan Pêst (Beden) Hatî Ye, (Sehîfe) Bi Ramana Rupelek Ku Li Herdû Barada Hatbête Nivîsîn, Dizimanê Kurdî Ji De Bo Cara Êkê (Hacî Qadrê Koyî) Li Sala 1870m Dinivîsînê Xwe De Zaravê Rojname û (Cerîde) Bi Karînaye, Bnr. (Kemal Foad, 2000, r.9), Her Weha Şêx Mihemed Xal Jî Li Ferhengî Xal Nivîsiye: (Rojname: Nivîsîneke Roj û Mang û Sal Nîşan Di Den, Ew Nivîsên Çapkiryê Roj Bi Roj Der E Ji Bo Bi Lav Kirina Nûçeyên Nû) Bnr. (Şêx Mihemed Xal, 1964, 184).

⁵ .Şêx Mihemed Xal, *Ferhengî Xal*, Weş Kameran, C2, Sulêmanî, 1964, r. 184 .

⁶ . Kemal Mezher Ehmed, *Têgeştinî Rastî*, r.5.

desthelatî û feylesufan razî kirina wana bi şewazê hikumiran yê, ji aliyê eflatûnî ragehandin hokarekê giringê çespendina desthelatî ye)⁷, eger çend li dîroka rojnamegerî binêrîn tiştên seyru bal kêş dibînin, êk ji wana tiştên ji wana li dîroka kevin vedigêrin rûdaweka dîrukî ye demê yarîzanekê exirîqî ji bo serkeftina supayê welatê xwe bi esîna rabigehînt (36km) bi bezîn (rakirin) dibirît piştî hingî ji mandî bûnya de dimirît, li vir de derdikevt ku ta niha bi aweyekê zelal dîroka rojnamegerya dunyayê nehatî ye zanînin, lê serbarê vê çendî jî rastyeka rûn aşkira heye ewe her milletekî dîrokeka taybetî bi xwe ve heye, ew dîrok jî girêdaye bi çendîn fakterên cuda cuda, ji ber vê çendê hewceya wê bi runkirineva gelek layenên jiyana siyasî û civakî ve heye, rojnamên kevin jî destekê bilind li razandina şaristanyeta pêşî de heye û rolê xwe li beref pêş birina rojnamenivîsî yê de dîtî ye deskeftên rojhelatyan li vê meydanê beref pêş bir, bêtir li dû hizar sala berî niha "Yolyos Qeyser" dest kir bi belavkirina ew wtar û mijar û gengeşên ku di "encûmenê pîran" rû di dan, ta wî demî ew hewal li çar çovê encûmenê pîran û endamanê fermanrewa ne diçûne derê)⁸, ta we lê hat ku bi bîte karekê rojane belavkiryên rojane lê dirust bibin, diyare eve jî karekê giringe bo roja xwe, dîsa li ewrupa jî (li sede ên naverast belav kiryek peyda bû bi navê "Bamifilt"*, ku di şeweyê (nişire, belavok) û kitêbên biçûk da belav dikir ev bamvîltê hanê li sedê yazdê li gelek cihên ewrupa dihatine belav kirin)⁹, naveroka van bamvîltane ji bo mebesta siyasî û rexne li zulm û zordariya rijêm hatbûne terxan kirin, her weha çendîn bizutînewên cotyarên ewrupa li wî serdemî bamvîltî taybet bi xwe belav dikirin)¹⁰, eva derkeftî divan belav kiriyan behsa zulm û zordariya axa û karbedestên dewletê kirye û dawakarên xwe ra digehînin, li wî serdemî de li encamê beref pêş çûna ticaretê dinavbera şar û welatan de, dinavbera ewrupa û asya da xwedî mal gelekê din jî zêde tir li caran li dîf nûçeyên wan cihan diçûn ku kel û pel ji bo dinardin yan kel û pel lê dihatin, li "vînîsya" (Bindiqye) dezgayekê taybet bo kom kirineva kirye nûçeyên şarê vînîsya xezetek dihate firoştin, "xezete" (Gazzetta) navê diravekî ye li zîvî hatbû dirust kirin)¹¹.

Dema ku em serguzešta rojnamegerya tirkî dinêhrîn, wan rojnameyên ku cara herî pêşî, di nav tirkî de derketine, bo cara yekemîn dinav dewleta osmanyê de rojnameya ku herî ewl derketiye "buletîn de nouvelles"e, li pey şoreşa mezîna a fîrensî ji bo armancên şoreşê de agehî bide, derheq komara kun û hatiye avakirin û nûçeyên di ferensayê tîne holê de gelê ku fîrensî lê ne li ferensayê dijî xeberdar bikeve vê rojnameyê derket, ev rojname li kunsulxaneyên ferensayê, pazde rojan

7. Mihemed 'Ebdulqadr Hatem, *elray el'am Weel D'aye*, r.8 .

8. Kemal Mezher Ehmed, *Têgeştî Rastî*, r.20.

*. Li Pamphilus Latînî Hatî Ye Wergirtin, Dû Ramanên Wê Hene, Komîdiya û Galtecarî û Kurte Nûçe û Kitêbên Biçûk.

9. Tara Tehsîn Yasîn Es'edî, *Rojname Umêdî Îstiqlal Li Rûy Teknikewe*, N.M, Zanîngeha Selahedîn Kolîja Adabê Beşê Zimanê Kurdî, 2003, r.15 .

10. Kemal Mezher Ehmed, *Têgeştî Rastî*, 1978, r.21.

11. Kemal Mezher Ehmed, b.n.b, 1978, r.22.

carê , 6-8 rûpel çap dibû)¹², li gor kovara gelanetî dinvîse ermenyan di sala 1821 bi navê "tavîmî vekayî" rojnameyek bi tirkî ya bi herfên ermenîkî derxistine, bi awayê ku Salahî r. û Sonyel dinvîse, rojnameya pêşîn a ermenyan, di sala 1839an de li îzîmîr tête weşandin, navê wê rojnameya ermenyan "şafake", di bîst û pênc salên dawî yê, împiratoryeta osmanî de rojnameyên ku ermenî dertînin, ne di bin çarde heban de hene)¹³.

Herçend ta niha bi awayekê zelal ji bo me xoya nebûye ku bo cara êkê li kîjan welatê dunyayê peyva rojname hatiye bi karînan, lê weku tê zanîn rojname (kîn ban)a çînî li sala (911 p.z) ku kevintirîn rojname ye li cîhanê da bi zimanê çînî rismî hikumeta çînê derçûye, her weha yekem rojname resmî li ewropa ji aliyê "Yolyos Qeyser"î ve li kanûna duwê sala (58 p.z) ji dayk bû derçûye li jêr navê (Dituruna Urbis Act) ku navê kovara nûçeyên rojane digehînt¹⁴, divê rojnamê da nûçeyên heme cor û giring têda berçav diketin ku peywendiya wan bi heza cemawerî û xelk giringî ya peyamnêrîn dervey welatî di de .

"Yusûfusnî" dîroknus ferensî li pertûka xwe da dibêjît: babilya rojname hebû rûdawên rojane tomarkirîne, li heman jêder da dibêjît: romanya li (58 p.z) yekem rojname der diçû (Elweqayh Elresmî)ye¹⁵, dîroka rojnamenivîsî li her welatekî ewropa bi awayekê cuda cuda hatine nivîsîn, li îngiltera li sedê şazdê û li elmanya û îtalya li sedê pazde li giringtirîn hoyên nûçeyên nivêsay geşekirina bazirganî veguhastinê bi taybetî li (Bindiqye)î îtalî, hewal kom dikirin bi dest dihatine nivîsîn û dihatine firuştin hewal bi navê diravê wî demî hatbûne nav lê nan bicanatan)¹⁶

Piştî vedîtina amêrê çapê li sala 1436 qonaxeka nû li jiyana çapemenî û belav kireve rojnamenivîsî yê dest pê kir û "lagazêt" bi yekemîn rojname dihête danan piştî peydabûna amêrê çapê ev rojnameye heftane der diket hewalên ferinsa bi ewropa belav dikirin, her weha piştî vê rojnamê (curina dî sanan) eveş rojnameka siyasî bû li sala 1665 der diçû her li wî demî rojname ta astekê pêşkeftin bi xove dît)¹⁷.

Li nîva êkê sedê hevdê da çendîn corên rojname li çend welatên mîna îngiltera û îspanya û holenda der diçûn, her weha hewalname yan dilxoş name û rojnamegerî edebî li ferensa seriyan helda)¹⁸, li sedê nozdê de digel pêşkeftina amêr û hoyên gehandinê (kumînî kasyun) ragehandin, rojnamenivîsî pêş keftineka berçav bi xove

12. Dilgeş Felat, *Rojnameya Kurdî Ya Pêşîn Kurdistan, Weş Ensîtûtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 1992, r.15 .*

13. Grolier Interinational Amercan Encyelopedia, C 3, r.94 .

14. 'Ebdulcebbar Cebârî, *Mêjûy Rojnamegerî*, r.28 .

15. Heval Ebu Bekir, *Çend Hengawêk Li Rageyandin, Rojnamenusî û Ray Giştî, Ç 2, Sulêmanî, 1997, J10, r.45.*

16. Heval Ebu Bekir, *Çend Hengawêk Li Rageyandin, r.7.*

17. Tara Tehsîn Yasîn Es'edî, *Rojname Umêdî Îstiqlal Li Rûy Teknîkewe, r. 17.*

18. 'Ebdulkirîm Şêxanî, *Li Mêjûy Rojnamegerî Cîhanewe, Rojnamevanî, 2000, J(1), r.98 .*

dît mîna (li sala 1869 da li zanîngeha waşinton mîna waneyeka zansitî dihate xwandin û li 1908de yekem fêrgeha rojnamenivîsî yê li kolumbiya hatevekirin)¹⁹.

Li piştî lêkolîn û xwandina dîroka rojnamegeryê husa derdikevît, ku rojname ji kevin da hebûye, zêdetir pêş keftî ye ta sedê nuzdê bi hoy serheldana corên dinê ragehandinê mîna telegiraf û biruskname li sala 1840 peydabûye, her weha sînema û radiyo û rojnamên axftinker, bi kurtî dikarîn bi bêjîn piştî van corane şêweyê, ragehandinê li dest pêkê de sade sakarbûn mîna tepil lêdan ji bo agehdarinê dihate bi karînan ji bo gehandina her hewalekî li piştî vê qonaxê peyama li biser zarî li cihekî bo cihekê din dihatine veguhastin bi çendîn coran dihatine encam dan, piştî hingî ev piroseye çend pêngava beref pêş çû amêrê baş bo belav kirina hewal û zanyarî ta gehiştê hewalê, elkitironî



¹⁹. Heval Ebu Bekir, *Çend Hengawêk Li Rageyandin*, r.7.



BEŞA YEKEM

SERHELDANA ROJNAMEGERYA KURDÎ

BEŞÊ YEKEM SERHELDANA ROJNAMEGERYA KURDÎ

1. DÎROKA ROJNAMEGERYA KURDÎ:

Rojnamegerî dimêjûya hevçerxa kurdî de, şoreşeka hizr û wçerxaneka mezin û dawya sedê nozdê ye, hewceya wî bi mijar wesf kirinê heye....

Rojnamegerya kurdî zimanê qonaxên cuda cudayên jiyana siyasî gelê kurd bûye, her weha xodîka roşenbîr û bwarê rûnakbîrê xwe bûye, diheman dem da dest pêkek bû ji bo dirust bûna desteka roşenbîrê şareza di vî bwarî da, ku xizmet bi rojnamegerya kurdî biken .

Destipêka peydabûna rojnamegeriyê her gelekî dîrokeka taybeta xwe heye, ew dîrok hatiye girêdan bi gelek fakterên cuda, ji ber vê çendê rûnkirineva wê hewceya wê bi gelek layenê jiyana û sîstemê civakî ve heye, serbarê peydabûna rojnamegerya kurdî ji bilî mercên nav komelî, çend hoyên derve jî rolê xwe têda dîtî ye, êk jiwan hokaran peydabûna rojnamegerî û beref pêş xistina rola jiyana rûnakbîr û siyasî û gelanî nawçeyên kurdan)²⁰, serheldan û belavbûna rojnamegerî di dîrok û keltûrên milletan da bi diyardeka şaristanî dihête hijmartin û rêjeya hoşyarî wan milletan pê dihête helsengandin, belavbûna yekem rojnameya kurdî "Kurdistan 1898-1902" weçerxaneka nû bû di dîroka ronakbîriya kurdî)²¹, berî vê dîrokê kurd di giringya rojnamenivîsa yê gehşitî ye, Hacî Qadirê koyî êkemîn hozanvanê kurde ku ta niha hatbîte zanînin ku zaravê (Cerîde) û (Rojname) di nivîsînên xwe de bi karîna bit, eve jî li sala 1870 da bûye ku li helbesta "xakî cizîr û botan" de dibêjît:

Sed qaîme û qesîde kes naykirê bepûlê

*Rojname û cerîde kewtûnete qîmet û şan*²²

Her weha di malkeka din de di helbesta (zemane) de dibêjît:

Le dewrî ême roman û cerîde

*Eger çî meqsede, zanîni bawe*²³

Eve wê çendê digehînît, berî derçûna yekem rojname bi zimanê kurdî Hacî Qadirê Koyî li mifa û giringya rojnamê gehîştû, her jiber vê yekê bû, bi bû mamostayê

20. Kemal Mezher Ehmed, *Têgeştinî Rastî*, 1978, r.43.

21. Hîmdad Husên, *Rojnamewanî û Edebyatî Niwêy Kurdî, Leblawkirawekanî Binkey Jîn, Weş Şîvan, Sulêmanî*, 2008, r.340

22. Serdar Hemîd Mîran, Kerîm Mistefa Şareza (*Lêkolînewe û Lêkdanewe*), Dîwanî Hacî Qadrê Koyî, Kokirawekanî Şare Kitêbî Mîdiya, Sene 2707 Kurdî, r.81 .

23. Serdar Hemîd Mîran, b.n.b, r.99 .

kurên mîr Bedirxan Paşa wane bi Emîn 'Alî Bedirxan û Mîqdad – Medihet û 'Ebidurehman digûtin)²⁴

Li dayk bûna rojnama "Kurdistan" bi berdê binaxe û bi rêkeftin û çalakî û rojnamenivîsa xebata gelê kurd dihête danan, rojnamegerya kurdî li rêya têkuşana xwe de, çendîn efîrandin û dahênan û peyvên xebatgêr pir li naverokên bi soz û şoreşgêr dij bi zulm û stem dahênaye, serheldana rojnamegerya kurdî berî zêdetir li sed salan rêkeka pir zehmet û bi azar û nexweşî bû û herdem têkhelî xebat û şorşa neteweyî bûye, jiber vê çendê digel edebê de rengvedan di vî baru doxey bûye û herdem hevaleyê bûye hîwaw û awatê netewayetî û niştîmanê gelê xwe bûye, rojek ji rojan edeba kurdî dest berdarê kêşên siyasî xwe nebûye.

Rojnamegerî kurdî herdem wekî cewherekê guzarşit li barudoxê siyasî û saykolocî û civakî gelê xwe kirî ye, hewl hatiye dan mîna bwarekê çalak bejdarî li xebat û têkuşanan de biken û bibîte çekêkî karîger bo rûb rûbûna hemî ew zulm û stemên derheq bi milletê kurd dihatine encam dan, li vir de taradeyekî baş li hevhatin dinavbera edeb û rojnamegeryê de hebit ku herdûka wekî rengvedanek qonaxa têda dijîn dibînin, beref pêş birina edeba kurdî bi temamî bi peresendina jiyana civakî û siyasî gelê kurd bende ..., ev çende jî di dirust bûna civakî nû ji aliyê hemî gelên rojhelatîve êk jiwana gelê kurde li destipêka vî sedê niha)²⁵.

Eger çavekî bi dîroka geşekirina rojnamegerya kurdî bixşînin li êk li parçeyên Kurdistanê mîna başur Kurdistan (Kurdistana 'êraqê ewa divî bwarey da dikarî dîroka rojnamegerya kurdî divê parçê de diyar bikî mîna kenalêkî karîger li geşedan bi bwarên heme corên edebî, diyare ji destipêkê ne bi tinê li Kurdistanê belku li hemî li ewropa jî li derkirina rojname û kovaran nivîseran dewrekê mezin dîtî ye li cîhana edebî ve hatîne dinav rojnamegeryê, li Kurdistana başur jî da ewên destipêkê behira pîtir nivîser û hozanvan û xelkên roşenbîr bûn, piştî bi dawîy hatina cengê êkê cîhanê îngilîz dagîr ker bûn çavê wana li dizîn û samanê welatê xwe bû belê serbarê vê çendê jî çend sedeyek bû xwedî amêrê çap belav kirin li welatê wana hebû şarezayî û twanayeka zor divî bwarey da hebû ji aliyê wana zora giring bû ku nîşanî gelên 'êraqê biden ke wana giringyeka zor bi keltûr û edeb û zimanê wan netewan heye mebesta wana beref pêş biben, ev kare wana her mebestek hebûbit û li jêr herperdeyekî dabit ewana karî mezintirîn xizmet bi edeb û ziman û roşenbîrên kurdî biken ku em hevber bikî digel dagîrkeran cîhanê bihemî şeweyekî dijî belavbûna xwendewarî û rûnakbîrî bûn, ev dû hev berkirine zor bi aşkira derdikevî demê hatina îngilîza piştî demekî kê m dest kir bi li çapdana rojname têgehiştina rastî piştî hingî jî rol li derkirina çendîn rojnama de hebî, rojnamên dest pêkê zêde babetê edebî belav dikirin gelek giringî bi nûçe û zanyarî ne di dan, evejî nîşaneka diyar û berçave ku ji aliyek bandora edebê li ser babetên rojnamê da hebû ye, ji aliyekê din jî ewên kar

24. Ferhad Pîrbal, *Çend Basêk Lebarey Mêjûy Rojnamenusîy Kurdiyewe*, Dezgehê Çap û Pexşê Hemdî, Sulêmanî, 2007, r.21-22.

25. Marf Xezinedar, *Kurte Mêjûy Edebî Hawçerx*, Wergêran Li Rusiyewe 'Ebdulhemîd Şexo, Rojnamewan, J(3), Hewlêr, 2001, r.155 .

kirî jî xwedî selîqeka rojnamenivîsa nebûn (jiber vê çendê em nikarîn bi dirustî lêhatî û şarezayî li livîna edeba hev çerx û nûxaz bigehîn, eger bi dirustî li beref pêş çûna edebê negehîn)²⁶, wekî derdikevît çend edeb û rojnamegerî tamamkerê êk dûne ewa hatiye dîtin rojnamenûsên rojnameyên kurdî behira pitir dibit behreyeka edebîyan herhebit ta bikarin deqê nivîsîna rojname û zanîna hunerên teknîkî rojnamegerî hebê û her weha (rojnamegerî bi çendîn qonaxan têperî, li hemî qonaxan de derbirîna xwasta gel bûn û jêderê runakbîran bûye, her ji ber vê çendê mirovên mezin gelek giringî bi rojname ya day û li devê rojnamenûsan yêt tirsyan)²⁷

Geşekirina rojnamegerya kurdî li Kurdistana 'êraqê bend bû bi layenê siyasî û roşenbîriya wî demî, belê li çî deman de mîna serdemê şêx mehmûdî serkirdayetî Kurdistana 'êraqê nekarî ye û karîger jî nebûye, lê eger layenê edebî û bi helbest û pexşan û wtar û çîrok gelek pêşkeftin bi xove dîtûn belê layenê hunerî rojname û teknîk zor disade û sakar bûn, li virda bi li dayk bûna rojnameyeka kurdî ku bo cara êkê bi hemî desthelatan ve û bi serbestî bîru rayê waqî milletê xwe bi cîhanê geyandî diruşmê wî li ciwanî û xulya û evînya welat û axa xwe bû ye, ev çend jî ji aliyê helbestvanên kurd mîna bêkes, Ehmed Muxtar Caf, Pîremêrd, gelek nivîser û helbestvanên din ku bi sere pênivîsê wan rojnamenûsan rûpelên rojnamê hatbû razandin (li encamê ew bayex dan û wesf kirina rojname û kovarên kurdî, tinê mebesta wana wiryakirin û mizgînya qutabxana geroke, helkirina çirayeka hizrî dişeve zengeka tarî û bê ageh de pesina her rojnameyek û belavkirîyek, ji bo wê çendê bîte hokarê giftugoya civakî û axiftinkerê komelgehî dinav xwe de)²⁸.

Li mawê deshelata şêx mehmûdî de rojnamegerya kurdî bi aweyekê berfireh geşe kir, lê dema desthelata wî zor nebû belê digel vê çendê jî wana karîn çar rojnameyên kurdî berhem bînin mîna (Bangî Kurdistan li 2î aba 1922, Rojî Kurdistan li 15 tişîrîna diwê 1922, Bangê Heq li 8marsê 1923)²⁹, û Umêdî Îstiqlal li 20 eyluna 1923)³⁰, derçû, çend sal piştî vê mawey "Komeley Lawan" dirust bû li bexda li sala 1933 ku urganeka taybet bi xwe hebû bi navê "Yadigarî Lawan" ev urgane em dikarîn bi yekemîn kovara taybetmenda kurdî li bwarê rewşenbîr û lawan bihête hijmartin, li dûmahî ya salên sîhan de kovara "Gelawêj" derçû û bo mawê deh salan berdewam bû, bi êk ji kovarên here bi nav û bangê nav dîroka rojnamegerya kurdî dihête danan, xizmeta kurdan kirî ye û em dikarîn bibêjîn mîna qutabxanekê bû ji bo hişyarkirina gel û hozanvan û edîban belê ragirtina vê kovarê bi êk ji pêngavên kevîne peristane di mêjûya desthelat darên 'êraqê û helwîstê wana li hember rojnamegerya kurdî li qelem dihête danan.

26. Mehmûd Zamdar, *Dewrî Rojnamegerî Kurdî Le Jiyânî Roşenbêrî û Komelayetî Gelî Kurd, Roşenbêrî Nwê*, J 113, Bexda, 1978, r.232 .

27. Hîmdad Husên Bekir, *Rolî Govarî Hîwa Li Pêşxistinî Hunerekanî Edebî Kurdî*, N.M, Zanîngeha Selahedîn, 1995, r.50 .

28. Mehemed Dilêr Emîn Mehemed, *Rojnamenûsî Kurdî û Bizutînewey Edebî Lesayey Yekemîn Deselatî Kurdî*, N.D, Zanîngeha Sulêmanî, Kolîja Ziman, Sulêmanî, 2000, r.108.

29. 'Ebdulcebbar Cebârî, *Mêjûy Rojnamegerî Kurdî*, Sulêmanî, 1970, r.83-85 .

30. Refîq Salh, *Sê Rojnamey Rojgarî Şêxî Nemir*, Sulêmanî, 2001, r.21 .

Di dîroka gelê 'êraqê şoreşa 14ê temuza sala 1958 bi serokayetîya "'Ebidulkerîm Qasm" sîstemê siyasî li 'êraqê de li Paşayetyê ve hate gohrîn ji bo komarî desturê demkî 'êraqê behsa li hevbeşiya kurd û 'ereb hatî ye kirin, hindek gorankarî bi xove dîtin li li çarçovê wan gorankarya bû, ku li komara 'êraqê hatbûne rûdan, mîna çend kovar li van coran belav bûn ku hemî taybetmend bûn, wekî kovara "Nîştîman" ji aliyê desteyeka mamosta û xwendikaran li sala 1959 hatbû derxistin, her weha kovara "Afîret" organên yeketî afîretên 'êraqê û kovara "Hîway Kurdistan" ji aliyê xwendikarên sulêmanyê û "Dengê Qutabiyên" ji aliyê yeketî giştyê qutabiyên 'êraqê derdiketin)³¹, digel rûdana van gorankaryan li 'êraqê de barudoxekê li bar ji bo karubarê siyasî û rojnamegeryê hate pêş bo cara êkê li 'êraqê parteka siyasî karî rojnamekê bi navê (Xebat) li 4/4/1959 li paytexta 'êraqê derbiken, ev çende jî wê rastyê der dêxît ku geşekirina rojnamegerya kurdî bende bi helumercên siyasî û civakî û serdememê xwe li rûdanên mezinên dîrokî li nawçê da karîgerya xwe danaye li ser rewî jiyan û pîrusa geşekirina civakî komelî kurdî danay qonaxeka din pir li berhem û belav kirineve û azadî rojnamegerî kurdî li 'êraqê da.

Dîsa rêkeftina 11ê adarê 1970ê weçerxaneka dîrokî bû li bwarê roşenbîriya kurdan bi giştî rojnamenivîsa yê bi taybetî, dinavbera 1970 ta adira 1974 bi demekê zêrîn dihête danan ji bo rojnamenivîsa ya kurdî, li wî demî da bi dehan kovar û rojname û belav kirî der diçûn)³², divê salê de bi hoyê vê rêkeftinê şorşî Kurdistan û hikumetî 'êraq rojnamenivîsa kurdî jî çuye qonaxeka din, jimareyek ji wan rojname û kovara berçav diketin ku ta astekê baş pêşkeftin bi xove dîtû, mîna kovara "Zanyarî" û kovara "Korî Zanyarî Kurd" ku taybet bûn bi lêkolîneve û kovarî "Nûserî Kurd" taybet bi edeb "Perwerde û Zansit" taybet bi perwede û xwandina kurdî û "Gêtî Pûl" taybet bû bi pûl pûlixwazî û "Hîvî" liqa dihokê yeketî mamostayên Kurdistanê, "Estêre" taybet bû bi zarokan û "Hoşyarî Kirêkaran" taybet bi kirêkaran û "Bo pêşewe" taybet bû bi yeketî mamostayên Kurdistanê liqê hewlêr.....Hud)³³, ev maweye bi mawê zêrînê rojnamenivîsa ya kurdî dihête niyasîn li hemberî van kovar û rojnamane ji aliyê taybetmendî û pisporyê ve û ji aliyê naverokêve hunerê rojnamewanyê jî pêngaveka giring bû.

Ev serdeme nebitinê rojnamegerîyê beref pêş çû belku zor li dezgehên kurdî bo yekemîn car dirust bûn û mîna "Yeketî Nivîserên Kurd" û çendîn rêxirawên dinê pîşeyî û civakî û ku herêk karî belav kirî û çapemenî xwe belav bikeneve, belê cihê daxê ye behara azadiya kurdî gelek nevekêşa piştî çend sala rijêma 'êraqê li hemî wan Peymanan bi kurdan dabû puşman bû ve û bi hemî şeweyan kefte dijayetî ya kurdan, careka din derkirina rojname û kovaran berdewam bûn hindek ji layen hêzên niştîmanî 'êraqê hatine qedexe kirin, hindekê din jî mîna "karwanî werizşî" kovarî

³¹. Mihemed Kerîm Ehmed, *Rojnamentî Kurdî Taybetmend*, N.M, Zanîngeha Sulêmanî, Beşê Ragehandin, 2010, r.56.

³². Azad 'Ubêd Salh, *Karîgerî Şorşî Eylul Leser Rojnamewanîyê Kurdî 1961-1075*, Weş Roşenbîrî, Hewlêr, 2007, r.81 .

³³. Mihemed Kerîm Ehmed, *b.n.b*, r.56.

"Tendirustî û Komel", hindekê din li wê ji aliyê take kesan derdiçûn wekî "Hawdeng" û "Dengê Me" û "Nêrgiz" û edebî "Aburî Zan", ji bilî vane hindekê din li şax (Çiya) dahatine belav kirin mîna "Nûserî Kurdistan" û "Gizing" û "Bang" û kovara "Terazû" ku taybet bû bi yasa û mafperweyê, baru doxê taybetî bizutineva rizgarîxwazî kurd û siyasetê diyarkerên kurdan karekê weha kirî ye, rojname û parte siyasyan li barudoxêkê nehênîda derbikevin û beşekê giring li rojnamenivîsa yê pêk bihînin, ev rojname û belavkiriya siyasetê part û armancê xwe dihindur de rûn dikirin û belav dikirin helwîstê siyasetê xwe li hember rûdawan derdibirî, li virda dibînin hewl şiyana şax ne her bitinê li tewerê çek û pelemaru dan û nehatiye girêdan belku êk ji sîmayên şoreşa kurdan rojnamenivîsa bûye)³⁴.

Hemî jêderên dîrokî bi taybetî ewên behsa dîroka rojnamegerya kurdî hatîne nivîsîn, qunaxên dîrokî geşekirina rojnamenivîsa dabeşê dû qonaxan diken, ew jî nehênî û aşkira, ev boçûne temam raste belê bi karhênana peyva (Şax) li pey peyva nehênî ji bo rojnamenivîsa ya temame)³⁵, çunkî hijimareka zor li rojnamenivîsa ên kurdî li şaxî der diçûn û bi nehênî li nawçeyên jêr desthelata rijêma be'si der diketin.

Ji nav çûn nemana rojnamenivîsa aşkira yên bi kurdî derdiçûn, buye egerê serheldana jimareka zor li rojnamên nehênî nûy ku rolekê giring li karwanê rojnamenûsyê bi bînin, ev core bi rojnamên şaxî hatbûne niyasîn)³⁶, bi serkirineva naverokên rojnamenûsyê nehênî karekî ne hisan bu, çunkî behira pitir li rojname û kovarên li barudoxekê di ji war de hatîne çapkirin û helgirtina wana karekê bi zehmet bû, ji bilî vê çendê jî nehatîne erşîf kirin û nehatîne helgirtin, herwek tîrajê çapkirinên wana kêmbûne hindek ji wan belav kiriyan bi amaje pêkirina serî bi endam û layengirê xwe got bî piştî xwandina wana ji nav dibirin û behira pitir bi dest dihatine nivîsîn)³⁷, her weha barê taybet û aluziyên Kurdistanê behira pitir li nivîserên kurd ji ber nebûna azadî rojnamenivîsa û giranî û nebûna bazarê çapemenî kurdî bi bûne kosp û nehêştî ye rojnamenivîsa kurdî berdewam bît û ta mîna rojnamê bi temen li vê qonaxê da me hebin ji ber vê çendê behira pitir li belav kiryan jimareyên wana kêmbûne)³⁸.

Rojnamenivîsa li herêma Kurdistana 'êraqê da li piştî raperîne gelek gorankarî bi serda hatin, bi taybetî li ser astê rojnamenûsyê ji aliyê amêr û derkirin û nivîsên û çapkirin û karên hunerî rojname û kovaran de, hokarê wê pêşkeftinê taradeyekî vedigiriyê ji bo dirust bûna doxekê li bar û ber firehtir azadî bo ronakbîran û nivîseran û bi karhênana amêrî pêşkeftî mediyayê û her weha vekirina sinûrên Kurdistanê ji hindek aliyan ve bi rûyê ewrupayê, ev berfireh bûn û pêşkeftina

³⁴. Newzad 'Elî Ehmed, *Berew Sereta, Pirojey Parastinî Destinusekan J (8)*, Weş Zamwa, Sulêmanî, 1998, r.10 .

³⁵. Newzad 'Elî Ehmed, *b.n.b*, r.11.

³⁶. 'Zedîn Mistefa Resul, *Hewl Elsehafa Elkurdî*, Metbe'e Dar Elcahiz, Bexdad, 1973, r. 12-13 ..

³⁷. Newzad 'Elî, *Hunerekanî Edeb Li Rojnamegerîyê Nehênî Kurdîda 1961-1991*, Weş Rûn, Sulêmanî, 2005, r.42.

³⁸. Mihemed Kerîm Ehmed, *b.n.b*, r.58.

rojnamegeryê kurdî taradeyekê ya bêseru ber bû lê em dikarîn bi bêjîn bi xala dest pêkê bo serheldana rojnamegerya kurdî dihête danan, eger kurda berî vê dîrokê tenê rojname hebûbît lê piştê 1991ê hemî kenalên ragehandinê beref pêş çûn, sîstemê ragehandinê bi awayekê modêrin (Rojname, Radiyo, Televiziyon, Enterininêt, Torên Civakî,...) Hatîne damezrandin, serbarî çend kêma kasên biçûk û azadî raderbirîn.... Lê em dikarîn bibêjîn dihemî dîroka kurdan da baştirîn helumerc ji bo geşekirin û pêşçûn hemî bewareni jiyana kurdan peydabûye bi giştî û bo rojnamenûsan bi taybet, eger li serdemê yekemîn desthelata kurdan li seda burî çend rojname kovar derktbin ya diyare ku gelek eger hebûyne lê ya here aşkira li bwarê rojnamegeryê ez dixwazim bibêjim li piştî raperînê ta niha jî li Kurdistanê nêzîkê sedan rojname û kovarên û hikumî û taybet derdikevin.

2. ROJNAMENIVÎSA KURDÎ JI ALIYÊ NAVEROKÊ VE:

2.1. Rojnamenivîsa Edebî:

Di dest pêka serheldana rojnamenûsyê de, wek beşekê giring ragehandine, lihevhatineke weha dinavbera ragehandinê dirust bû ye, bi corekê weha ku bi êk dû hatine girêdan ku bi hisanê jêk cuda nabin, rojnamenivîsa bûye hokarek ji bo geşesendina edeb û hêza twansitî bandorî pê di bexşî û cewherê wê jî diyar kirine, bi şiklekê weha ku edîb û hozanvan û feylesufan fikiru bîrên xwe ji bo belav kirinê hebûn, dest bi belav kirinê kir ji bilî belav kiryên nûçe û rûdawê zansitî, ferhengê siyasî heta nîva dûyê sedê nozdê bi awayê gêraneva çîrokên bal kêş, rûdawên wana bi şewê dîrokî û ji ber çav girtina ewlyet zimanzanî dihatine belav kirin, mîna hewal û raporte hewalên berê şerî wekî çîrokên balkêş bi behis kirina ceh û helatina rojê dest pê dikir, barudox û keş û hewa û wesfa dû kela seharê hingî dihatine ser çewanya dest pêkirina şerî³⁹, ji bilî van hemî yan mamostyên bwarê rojnamenûsyê jî li wî serdemî heman rêk girtibî çunkî pertûkên taybet bi rojnamenûsyê nebû, mamoste ya behira pitir pişt bi xwe dibest beşekê zor ji vane edîb bûn, belê serbarê vê çendê jî babetên wana baş û serinîc rakêş bûn⁴⁰, belê eger li rojnamenûsya sedê bîstê li hemberî salên burî dibînin ku bi temamî hatiye guhartin, lê ta niha jî li çendîn welatên paşkeftî hema nivîser û edîbin⁴¹, dinav gelê kurdî jî ev çende ya reng veday bi corekê weha ku karê rojnamenivîsa kurd gelek aloz û ketine dinav êk dû de, beşa here zor nivîserên wana li herdû bwaran de kar dikin⁴², belê dibit agehya me ji wê çendê bit ku rojnamenivîsa gelek ji edebê berfirehtire, çunkî gelek ji kesên binav û bang di rêya rojnamenivîsa de hatine nasandin û meşhur bûy ne⁴³, em dikarin bibêjn peywendiya edeb û ragehandinê peywendiyeka li hevhatiye dibeşekî de encamê

³⁹. Umêd Mes'udî, *Binamakanî Nusîn Le Rageyandin*, Wer: Ciwamêr Marabî, Ji Belavkirên Binka Edebî û Ronakbîrî Gelawêj, Weş Sîma, Sulêmanî, 2005, r.18.

⁴⁰. Mehmud Fihmî, *Elfen Sehufî*, Dar Elme'arf Bî Mîsr, Qahîre r.19 .

⁴¹. Kazm Mu'temîd Nejad , *Rojnamegerî*, Wer: Mecîd Salh, Weş Tîşk, Ç2, Sulêmanî, r.19 .

⁴². Erselan Bayz Îsma'îl, *Rageyandinî Şorş û Bizutinewey Şî'rî Kurdî*, Weş û Ufistî Rûn, Sulêmanî, r.14 .

⁴³. 'Bdal'zîz Şerîf, *Wesayl Ele'lam We Mişkîllete E_ seqafe*, Dar Elcîl, Beyrut, r.86 .

wana nêzî hev dûne, belê Pêşketina teknolocya serdem beref dûrketinê birîne, her ji ber vê çendê roj bi roj giringî bi van zanistan tete dan beş û liqên nû jê cuda dibin)⁴⁴.

Eger lînêrîneka ser pêy bi raberên rojnamenûsên kurdî û qonaxên rojnamenûsyê de bikin dibînîn ku jimare ên kovar û rojnamên edebî ji hemwan zêde tirin.

Behira pitira rojname ji bo meremên siyasî der diçûn rojname "Kurdistan" di pila êkî de ji ber ku behira pitir babetên wana siyasî bûn kêm di edebî bûn, di jimare (3)de hatiye nivîsandin ku hindêk ji mîru axa ên kurda name hinardine dawa kirye ku behsa hel û mercê niha ji bo binivsin û helbestên kurmancî jî ji bo belav bikin, ew jî Peymanê jêra di den ku beyt û hîkayetê qincyan ji bo binivîsn, her di heman jimara rojnamê de dest kirye bi belav kirina (Mem û Zîn)a Ehmedê Xanî)⁴⁵.

Ronakbîrên kurdan baş ji wê çendê gehşit bûn ku millet ji nezanînê û paşkeftinê rizgar nabit, heta bi awayekê baş li zansit û xwendewaryê negehin, ne ku her wekî niha der bi der mal wêran paşkeftî li jiyana xwe de dimînin, ji ber vê çendê hewl da çend komel û rêxirawên rewşenbêrî damezrînin û rojname û kovar û namîlke ên rewşenbêrî belav biken, heta astê hişyariya millet û gehandina dengê millet û mafê kurdan bi gelan, ji bilî vê çendê nivîser û edîbên vê serdemî eger bi tinê jî bin wana ev layene pişt guh nexistiye, ji ber hindê dibînîn ku "Cemal Baban" nivîserekê kurde vî serdemey yekem kovara edebî ku yekemîn belav kirye jî di dîroka rojnamenûsya kurdê li 'êraqê de li jêr navê "Bangî Kurd" bi zimanê kurd û tirkî li 18î şiwata 1914ê li bexeda derxist, belê nivîserê pertûka "Mêjûy Rojnamegerî Kurdî) diwê bawerê daye ku yekem jimara xwe di 26/12/1913ê de derxistî ye⁴⁶, belê pişt bestin bi çendîn çavkanyan 8ê şewata 1914ê bi rastir dizan in⁴⁷, her li wî serdemî dawyê de çendîn belav kiryên din derçûne, eger sercemê hemya binêrîn rûpelên taybet ne bûne bi edebê, belê edebê beşeke zor ya girtî, ev çende ji bo wê dizivrît ku behira pitir nivîserên wî serdemî edîb bûne, her bi wî şêwey hatine nasandin, ku (Edeb û Ramyarî), yan jî (Edeb û Civakî)e, li wan jî Rojî Kurdistan ku hijmare(1) li 15/11/1922 li sulêmanî, kovara diyarî lawan li (11)ê marsa 1925 li bexda, kovara zarê kurmancî hizîrana 1926 li rewandiz û kovara ronakî li 11/7/1935 li şarê hewlêrê, kovara gelawêj li kanûna yekema 1939 li bexda)⁴⁸.

Li Kurdistanê de têkheîlî û lihevhatineka zora hey dinavbera edeb û huner her ji ber vê çendê gelek caran belav kiryên taybet bi van dû bwarine bi hev re derdiçin û jêk cudanabin, wekî kovara (Êsta) ku kovareke edebî û hunerî ye mehane der dikevt jimare yekema wê li (1)ê temûza 1966 li şarê hewlêrê derxistî ye, dîsa kovara (Ayînde) dezgeha çap û pexşî serdem jimare (1) li temuza 1999ê de der xistî ye ku giringî bi edeb û hunerê hev çerx di det, ta niha jî di dome, mîna ev corey pihevre

44. Mihemed Dilêr Emîn, *Peywendî Nêwan Edeb û Rageyandin*, Ko Gelawêj Wê, J (10), Sala Duwê, Teşrîna Yekem, 1998, r.38 .

45. Newşêrwan Mistefa Emîn, *Çend Laperyek Le Mêjûy Rojnamewanî Kurdî*, 1898-1918, r.60-61 .

46. 'Bdalcebar Mehîmd Cebârî, *Mêjûy Rojnamegerî Kurdî*, Weş Jîn, Sulêmanî, r.81.

47. Faroq 'Elî 'Umer, *Rojnamegerîy Kurdî Le 'Êraqda (Beray Yekan 1914-1939)*, r. 70 .

48.'Bidulcebar Mihemed Cebârî, *Rageyandinî Şorş û Bizutinewey Şîrî Kurdî*, r. 84-122.

derdiç in, lê layenê edebî bandora wê bi ser hunerê zêdetire, ji bilî vê çendê jî li rojnamên giştî jî de ev çende ya rengveday, ji ber zoriya berhemên edebî nivîserên wî bwarî tiştêkê weha li şêwermendên rojnameyan kirî ye ku bi bayex li edebî binêr in ji xwe dûr nekin, her ji bo vê meremê jî li pal derxistina rojnameyên giştî de paşkoyeka taybet bi edeb û hunerê derkirye, lê behira pitir berhemên wana edebî ne, belê babetê hunerî jî reng veda ye, her ev jî bûye (Edeb û Huner) li rojnama Kurdistana nû jimare (1) li 28/10/1993 der çû ye)⁴⁹

Bi vî awayî dibînin ku peywendiya edebê bi yekemîn pêngava serheldana rojnamê dest pêkirye, herdûk li hevhat bûn, dinav kurda û li 'êraqê jî ewên dinav rojanaman de kar dikir behira pitir edîb bûn, ew edîban jî li rêya karê rojnamenûsyê xizmet bizutineva siyasî û edebî kurdî kirî ye, her demê bîrokeya damezrandina rojnameyê hatbite pêş, edîban ji bilî belavkirina berhemên xwe bûy ne rêveber nivîserê siyasî û nivîsna raporên cuda cuda gelek caran jî hewal jî nivîsîne)⁵⁰.

2.2. Rojnamenivîsa Hunerî:

Huner êke ji wan bwarên çî li kevin de çî li serdemê nû de bayexeka zor li jiyana şaristanyetê de heye û pêgeyeka aşkira heye bi çend şêwaz û ast ji aliyê mîdiya yê ve kar digel dikin û rûmal dikin, li hindêk cihan de rojname û kovarên taybet bi hunerî heye, yan jî dinav rojname û kovaran de rûpelên taybet ji bo terxan kirye, gelek caran jî paşkoyekê ji bo terxan diken, hindêk caran jî wekî bwarekê cuda hindêk caran jî digel bwarekê din wekî edebê dinav rojnamegeryê de kar digel dikin, rojnamenivîsa "Huner" biawayekê giştî giringî çalakî û muzîk û upêra û stiran bi awaz daner û stiran bêj amadebû layenên peywendîdar û layenê berhem û çavdêr di det, dîsa hunerê şêwekar û wênekêş û peyker saz û wênegirtin digel çalakî û dahênên bware sînema û bi hemî regezan ve her ji ekiter an heta derhêner û wênegir û teknîkar û berhemên her wekî giringî bi çalakî yê şano û nivîser û derhêner û ekiter û teknîkara di det, digel çalakî yê radiyo û tivî bi darma û flêma û beriname û bêjer û pêşkêşkar û derhêner û wêngira û navendê, sînema û şano û pêşangehên hunerî)⁵¹.

Hunerî kurd çî cudahyeka weha digel hunerî cîhanê de nî ye, her weku welatên dewru ber cîhanê li bayex û huner gehiştine û giringî yeka zor bi hemî bwaran di det, her ji ber vê çendê me hewl daye pêş salên nohet û paş nohetê derbxeyn ku rol û giringya hunerê tê de diyar dibit lêkdaneka hur ji bo diket, li vir de çend belavkirên hunerî berçav dikin:

"Tîşkî Hunerî" kovareka hunerî bû ye, li sulêmanyê tîpa niwandin û mosîqa li (10)ê marsa 1970 bi zimanê kurdî derdiket, ev kovare yekemîn kovara hunerî ye di dîroka rojnamenivîsa ya kurdî dihête danan, ku babetê wana taybet bû bi huner muzîk)⁵².

49. Mihemed Kerîm Ehmed, *b.n.b*, r. 64 .

50. Erselan Bayz Îsma'îl, *Rageyandinî Şorş û Bizutinewey Şî'ri Kurdî*, r.33.

51. Asma'îl Abrahîm, *Elsehufî Elmuxteses*, T2, Dar Lîlneşr We Eltewzî', Elqahîre, 2006, r.41 .

52. Asma'îl Abrahîm, *b.nb*, r.41 .

Kovara "Hore" ku taybet bû bi muzîk û ji layen komîta şax yeketî hunermendên Kurdistan der diket, hijmare (1) li kanûna yekema sala 1985ê belav kirye dawî jimare jî (3-4)e, di êk berg de li kanûna yekem 1990ê de derketine, komîta şax heman rêkixiraw jimare (1)ê kovare (Rengale) taybet bû bi hunerê li zistana 1990ê de direketiye, jimare (2) ku dawî jimare jî di heman salê derketiye, Komela sînemayê Kurdistanê (1)ê kovara (Sînema)ê li eyluna 1991ê de li şarê hewlêrê derketiye, dawî jimare jî di sala 1992ê de derketiye, tîpên taybet bi şanoyê giringyeka zor bi rojnamenivîsa huner li nav û nîşanê şanoyê daye, wekî tîpa şanoya ezimûngerî, kovara "Ezimûn" li sala 1991ê de bi zimanê li şarê sulêmanî derdiket, tinê ev jimare jê derketiye, her weha tîpa şanoyî Kurdistan li sulêmanyê kovara "Şano" li adara 1996de tinê jimarek jê derketine.....)⁵³.

Li vir de ji bo me diyar dibit kupşitî salên 1991an de jimareyeka zora rojname kovarên cuda cuda der ketine ku taybet bûn bi hunerê kurdî ku çî cudahyek nebû li hember rojnamenivîsa cîhanî, ku taybet li Kurdistana 'êraqê de der ketine, van rojname û kovaran rolekê baş hebû dipêşixtina edeba kurdî bi awayekê giştî.

2.3. Rojnamenivîsa Zansitî:

Rojnamenivîsa ya zansitî kardiket ji bo ve guhastina zansit û zanyariyan ji bo xwendevan li astên cuda cuda de, bi egerê şirovekirin û hisan kirin û zansit belav bûna rewşenbîriya zansitî, ew zansitên li rêya ekadîmî û mijarên rast û dirust de bi dest dihên, ku peywendiya wana bi serdemê pêşî û niha û ayinde ve hebit, ev zaniste jî zansitî û zansitên siruştî, teknolocya, zansitî ramyarî, civakî, felsefe....)⁵⁴, zansit giringyeka zora hey roj bo roj pêşketinê mezintir bi xove dibînt û liq û beşên zortir jê peyda dibin, ji bo gelê kurd mifa wer girtin li zansit û pêşkeftinên teknolocyan giringyeke zora hey ta ji wê rêyê mifayê komelgehê kurdî bigehînt, bi taybetî piştî ew hemî der bi derî û pêşnekeftina kurdan li hember welatên pêş keftî de bi xove bi bînt, rojnamenivîsa ya kurdî ya hewl day li vê dergê bidet û çendîn belav kiryên taybet bi zansit û teknolojiyayê hebit, mîna: kovara "Zanyarî" kovareka zansitî bû li (1) tişîrîna yekema sala 1970î de yekem jimara xwe ji aliyê komeleka diketorên kurd bi navên (Dr. 'Ezîz Gerdî, Dr. Saman Mecîd, Dr. Cwamêr Mecîd, Dr. Dara Reşîd,...) Der diket, ev kovara bi yekem kovara zansitî tete danan, jimare (6) ku diwahemîn jimara wî ye li sala 1973ê der ketiye)⁵⁵.

Kovara "Zansit û Lawan" kovareka zansitî serbixoyê bû ye, ku giringyeka zor bi zanistên cuda cuda daye ji aliyê komeleka nivîsera jimare (0) li adara 1993ê de li şarê sulêmanyê der ketiye (3) jimare jê hatine belav kirin.

⁵³. Mihemed Kerîm Ehmed, *b.n.b*, r.66.

⁵⁴. Asma'îl Abrahîm, *b.n.b*, r. 90 .

⁵⁵. Heme Salh Ferhadî, *Çend Layenêkî Rojnamenusî Kurdî*, WeşElhewadis, Bexdad, 1988, r.90 .

Kovarî "Zansitî Serdem" kovareka werziye dezgehê serdem taybete bi zansitên (Nûjdarî, Derunasî, Kîmya, Vêterinerî, Sêkisanî, Fîziya, Kompyoter, Zîr'at, Dermanzanî,..... Gelekê din) der diket, jimare (1) li temuza 1999ê de hayte belav kirin.

Li serdemê cîhangîriya entirinê de kompyoter mobayl û setlayet bi beşekê giringê teknolojiya zansitî dihête danan, ne bitinê bûyne pêtiyên giringê aliyekî belku bûyne beşekê giringa rijêma siyasî û aburiya nûya cîhanê, roj bi roj hewadar û bi karhênerê wana zêde dibin, ji aliyê rojnamenivîsa kurdî jî ta astekê baş li giringya vê corey gehîştine ji bilî rojname ên giştî çend saytê taybet hene dinav teknolojyayê yan jî ay tî yê de, dinav rojnamenivîsa kurdî de çend lapere û sayt peyvan dibinin: mîna:

rojnamey "enterinê" rojnameyeka ehilî taybete bi enterinê ve, jimare (1) li meha 10/2001ê de li şarê sulêmanyê derketiye ta niha jî di dome, ev rojnameye bi yekemîn belav kiriya kurdî tete danan ku hemî rûpelên xwe taybet kirine bi enterinê û ta niha jî di dome.

kovara "Bayt" ku taybete bi kompyuter û enterinê (IT) ji aliyê çend lawên hewlêr û ranye, jimare (1) li 10/2/2010ê de derketiye û ta niha jî di dome⁵⁶.

Di encam de ji bo belav kirên bwarê teknelocya û zanyarî de, li ruxisar de bi çapeka pal kêş û renga û reng der diket, giringyeka zor bi şiklî di det, dinaverokê jî de cext dikete ser nûtirîn dahênan û nimayîşkirinê, pêkhatên her yek ji teknelocyayan, rêy nîşan kirin ji bo bi karhênana pêngav bi pêngav û nûtirîn hewalê teknelocya ûhud.

2.4. Rojnamenivîsa Perwerdeyî :

Rojnamenivîsa perwerdeyî giringî yê di det bi bejdarî kirina meselên fêrkirina seretayî binema ên xwendewarî bi zaorkan û bejdarkirina wana li piroşên nehşetina nexwendewaryê û harîkarya wana jî ku li temenekê mezin dane taku bi ser nexwendewarya xwe zal bibin û dîsa pêşkêşkirina rewşenbîryeka sertaserîy û arastekirina siyasî û civakî û harîkarî kirina pêkhatên perwerdê⁵⁷, her weha di qonaxa seretayê dibistanê xwendekaran fêrdiken ku çewa hels û keftan digel mirov de biken û bi çi şeweyek gengeşê digel mamoste û endamên xêzanê xwe de biken, bi vê çendê rêyeka baş rahênanyan fêr diken.

Bi vê away rojnamenivîsa perwerdeyî dikarît rolekê giring bi bînt bandoreka mezin li ser hevvelatya dirust biket, bi bê cudahî astê temen û regez, li kurdistana 'êraqê de li piştî raperînê çend belav kirên bi vê şewey dibînin, ku jimareyeka kêmbû, belê amanc lê handana xelkan bû li ser xwendin û perepêdana astê zanîn û zansitî û pêş

⁵⁶. Mihemed Kerîm Ehmed, *Rojnamentusî Kurdî Taybetmend*, r.68.

⁵⁷. Vladîmîr Hudîtis, *Elmirîşd Fî 'Lim Elsehafe*, T/ Menezeme Elsehufin El'alemîn, Bexda, 1987, r.190 .

kêşkirina zanyaran li vê bwarey bi hisantirîn şewe, dawya salên nohetan de ta astekî baş ev core beref pêş çû, ji bo vî corey jî çend mînakên bwarê perwerdeyî berçav bikîn:

Kovara "Perwerde û Zansit" kovareka mehane bû bi zimanê kurdî û 'erebî rêveberiya giştî ya xwendina kurdî li bexda der diket, jimare (1) li sala 1971ê de der ketiye û jimare (10) li sala 1980ê de der ketine)⁵⁸.

Kovara "Rêbazî Perwede" jimare (0) di adara 1996ê de ji aliyê rêveberiya giştî ya perwerda hewlêrê derketiye, (3) jimare jê hatine belav kirin, vê kovarê giringî di de felsefa perwerdeyî, perwerde kirin û xizmet kirina niştîman, rojnameya "Ayindey Perwerde" taybet bû bi konfirasên perwerdeyî wezereta perwerdê, jimare (1) li nîsana 1997ê de bi zimanê kurdiyu 'erebî derketiye, tinê dû jimare jê hatine der xistin .

2.5. Rojnamenivîsa Aburî:

Aburî êke ji pêkahtên here giringên mirovayeti û zareveke ji bo hemî wan kar û çalakya bikardihêt, ku peywendiya wana bi dahat û feydey û ziyar û tîcaret û hemî jiyana mirovan heye, bayexeka zor bi vî bwarey têtê dan li cîhanê de, hemî ya behira pitir ji mirovayeti yê bi tîcaretê mijûlin, her ji ber vê çende rojnamenivîsa bi hemî hêza xo ve bayexê bi vî bwarey di det, rojnamenivîsa aburî bayex bi layenê darayî waburyê di den, di her cimû coleka dirav li bazarên cîhanê de heta behayê kersitên xav garîgerên serekî li aburiya cîhanî de û çalakên bankan û berhem hênan û tîcarea cîhanê û xomalya welatekî, dibit ew belav kiriyane bi giştî yan jî taybet bin bi çalakî dezgehekê aburî diyarkirî)⁵⁹, bwarê aburyê peywendiya wê bi jiyana hemyan ve heye, mîna: bê karî, behayê xarin û vexwarina, sutemenî, paşkeftî yê kesên dewlemend, rêja feydeyê bankan, bazarê kel û pel, weberhênan,, bwar gelekin nebitinê bazirgan belku hemî kes giringî pê di den, rojnamenûsê wî bwarî dibit agehya wî li hemî gorankarên tîcarea û pîşesaziya nav xoyî, hewal, xwedî kar...., hebit, zimanê nivîsnê rojnamenivîsa taybetmend divê bwarey de dibit yê sade û zaravên hisan bit, heta her kes bi hisanî têtê bigehin)⁶⁰.

Rojnamenûsê aburî çend erkan dibînt ji wana:

- *Rûdawê aburî bi awayeka rast û dirust berçav biket.
- *Hemî raw boçon derbarê karubaran yan jî komkirin bi hejaran berçav biket.
- *Xelk han bidet û rabhint ji bo bejdarkirin li zivrandina kar û barê komel bejdarî kirin di çalakyên aburî de.
- *Hewl dan pişt bi kersitên xomalî bi bestin û pere pê biden kêmtir pişt bi kersitên biyanî bi bestin.

⁵⁸. Heme Salh Ferhadî, *Çend Layenêkî Rojnamenûsî Î Kurdî*, r.56 .

⁵⁹. Kirim Şilbî, *Mistelhat Ela'lamî Ye (Ancilîzî - 'Erbî)*, T2, Dar Elcîl, Beyrut, 1994, r, 282.

⁶⁰. Dîbora Poter, *Rênuyî Rojnamewaniy Bêlayan*, Wer: 'Ebdurezaq 'Elî, Weş Aras, Hewlêr, 2007, r,93 .

- *Kar kirin ji bo vedîtina gendelî bi taybetî ewên pare û mulkî nîştimanî jinav diben.
- *Dest nîşan kirina wan pirisgirekan ku bû ne rêgir li hembere berhem hênanê)⁶¹.

Di nav rojnamenivîsa kurdî jî de çend belav kiriyan dibînin:

Li şarê sulêmanyê ji aliyê çend nivîseran kovareka ser bixoyî bi navê "Aburî û Komel" li gulana 1992ê de derketiye tinê jimarek jê derketiye.

Komîta bilind yeketî aburî nasan û jimêriyarên Kurdistanê jimare (1)ê kovara "Aburî" bi zimanê kurdî û 'erebî derxistine)⁶².

Li dawiyê de dixwazim vê bêjim ku çend corên din jî mane wekî (rojnamenivîsa werizî, rojnamenivîsa yasayî, rojnamenivîsa ayînî, rojnamenivîsa zarokî, rojnamenivîsa civakî). Lê jiber ber firehya vî babetî ev çend mînakên me li jor de behis kirine .

3. Rojnamegerya Kurdî Dinavbera Salên (1898-1909)an de:

Di navbera van salan de çend rojname derketin hindê hikûmî bûn hin ji wana taybet bûn, ji aliyê naverok û ruxsarê ve ta radekî pêşketî û giring û gelek tiştên balkêş derbarê milletê xwe bas dikirin, dîsa van rojnameyan zêdetir agehî ji xelkî re belav dikirin û xelk han dida ta bixun in wekî hermillêtên cîhanî şarezayê zansit û dîrok û ayîn û aburî Bibin, ji aliyekî din van rojnaman serbarî nebûna keş û hewayeka aram û zolim zordariya dewletan û derbederî û nebûnî û xerîbî rolekê baş hebû û karî ye hemû edîb û nvîser û şa'êrên me yê kurdan li dewrî van rojnaman kom biket û berhem û bo çûn û agehî û fêrî xwandin û nivîsînê biken ji xelkê xwe re rûn aşkira biken. Li vir de me çend rojnameyên pêşî weku mînak berçav kirîne:

3.1. Kurdistan (Rojname, 1898-1902):

'elaedîn secadî* dibêje: (*netewa kurd li serdemên pêş de diyardeka weha ji bo nehatbû pêş ji bo wê çendê zimanê xwe bi nivîsîyê aghdar bike û belav bike tinê hêzek bi destê wan vebû ew jî xwe parastin ji zulim zordariya dewletan taku bimînin zindî*)⁶³, demê em biyanûya bo vê gotinê dihînin ku gelê kurd direng hest bûna xwe kirye.

61. Isma'îl Abrahîm, *Elsehufî Elmuxteses*, r. 276-277.

62. Mihemed Kerîm Ehmed, *Rojnamentusî Kurdî Taybetmend*, r.86

*. 'Elaedîn Secadî (1915-1983) Li Şarê Sulêmanîy Ji Dayk Bûye, Diwazde Kitêb Di Dibwarê Edeb û Dîrokê De Çap Kirîne, Nivîsnê Xwe Di Kovara (Gelawêj)De Belav Kirîne, Dîsa Ser Nivîserê Ko(Nizar) Bû, Li Beşê Kurdî Li Kolîja Adabê Zanîngeha Bexda, Wane Bêj Bûye, Endamê Korê Zanyarî Kurd Bûye.

63.'Elaedîn Secadî, *Deqekanî Edebî Kurdî*, Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 1978, r.4 .

Li destipêka raberên rojnamegerya kurdî de hatiye, (derketina êkemîn rojnameya kurdî li demê xwe de bi zimanê kurdî bi navê "Kurdistan" li 22ê nîsana 1898an li qahîre weçerxaneka dîrokî bû bandora wê li bizava rizgarîxwaza kurdî da hebû)⁶⁴.

"Kurdistan" pêşengê rojnamenivîsa ya kurd ye 22ê nîsana hemî salê bîreweriya derçûna vê rojnamê nû dikin, ger geştekê bi nav rûpelên vê rojnamê bikîn ewên niha kopîkirî û ji ber destên me dibînîn komeka edigar û taybetmendî berceste dibin ku layenê bi qiwet û pêşkeftî ên vê rojnameyê derdixît bo me rûn diket, (eger ew helumerce weha aloz nebiwane ku bizutinewa kurdayetî xwedî bedirxanî ye azadîxwaz û nivîserên vê rojnameyê pêda derbaz bi bûn û bûye sebebê ragirtina vê rojnamê ewa xizmeteka mezin bi kurd û Kurdistanê dikir, her weha xwendikarên xwe bi bê omêdî nedihêlan)⁶⁵.

"Kurdistan" mîna yekemîn hewlên kurda di bwarê ragehandin û nivîsînê de, bi hukmê pêşengî karye corek li kilêşa rojnamewanî û rojnane derkirin bi havêjî nav navendeka rê xoşker ji bo rojname û belav kiriyên piştê xwe çunkî ta niha jî bwarê mîdiya û rojnamenivîsa mîna êk ji zansitên miruvatiyên xwedî tuxim û rêsa gelekê cihgîr nî ye ku bi awayekê sîstematîkî berçav kirbît, jîber vê çendê li dest pêka serheldana rojnamê li cîhanê da taybetmendiya rojname û hunerê rojnamenivîsa yê dest nîşan nekirîne heta astê baş û xirapî rojnamê ji bo me diyar biket, belku beruvajî taybetmendên tuxmên rojnamevanyê baş derçûn li encamê beref pêşçûna rojnamê hatine derkirin, mîna dahênana dezgehê çap û pêşkeftina teknîkî çapemenî û gehandin û ve guhastin nexiş li dirust kirina form û naverokê rojnamê hebû.

Derkeftina rojnama Kurdistan mîna diyardeka şaristanî, digel vê çendê biwe amirazekê çalak û rikaberê siyasî û aburî û civakî û nîştîmanî, mîna şoreşeka mezin di bwarê rewşenbîrî û roşengeryê li cîhanê da ber pakir, bi taybetî li sedênazde û bîstê de ku dihindur de bi dehan rûdawê mezin û gorankarî binçîne li hemî bwarên jîyanê de ser heman jî weçerxaneka aburî û pîşesazî girte xwe sîmayekê din ev gorankaryane bûna gelên jêr dest bûye, (eger rolê rojnamê li welatên serbexo û xwedî qewarekê erdingarî û kiyanê siyasî çî garîger hebûbit, dibît ji bo neteweyekê bê nîştîman û dabeş bûy dibît bandoreka mezin hebît)⁶⁶.

Bi jêderê dîrokî dihête zanîn ku malbata Bedirxanyan dinav civakê kurdan de xwediyê paşerojeka pir giring in û kevnare, (ev malbate di nav kurda de her dem bi rûmet û jan kirine û bi vê rûmeta xwe jî di dilê kurdan de cihekê girtine, bi taybetî di herêma botan de çendîn salan hikumiranya xwe berdewam kirine û dem bi dem ev hikumiranye berfireh bûye gehaye hemî cihên Kurdistanê, pêşe roja wan ya dirêje çawa gelek rojên wan yên bi rûmet û serkeftî çêbûne, rojên wan yên pir tengasî

⁶⁴. Cemal Xezinedar, *Raberî Rojnamegerî Kurdî*, Bexda, 1973, r.12 .

⁶⁵. Îdrîs 'Ebidula, *Lebarey Rojnamegerî Kurdiyewe (Çwarde Lêkolînewe)*, Weş Xanî, Dihok, Ç1, 2008, r.1 .

⁶⁶. Mumtaz Heyder, *Dewrî Rojnamenûsîy Kurdî Le Pê Geyandinî Hosiya Neteweyî û Bizava Rizgarîxwazî Kurdîda*, Ko (Karwan), J 120, 1998, r.20 .

derbas dibûye jî çêbûne, Bedirxanyan di navbera salên 1843-1846an li botanê li hemberî dewleta wî demî serheldanek pêk hînbûpşitî serheldanê malbata Bedirxanyan hatbûne mişext kirin, hikumeta osmanya begî şandin girtê û piştî ku Bedirxan Beg jiyana xwe ji dest da malbata wî çû stenbolê)⁶⁷.

Ji ber ku Bedirxanyan malbateka delemend bû, mensebê wê malbatê dixwandin û dema ku li stenbolê bûn ji rêvberî ji kurdan re dikirin, ji ber rewşenbêriya Bedirxanyan pirî cara ji aliyê rêveberiya dewletê dihatine derb derkirin, di encama vê yekê demê em mensebê malbata Bedirxanyan li her derî û welatan belav bi bûn, ji xeyrî van Mîqdad Medihet Bedirxan ji ber nexoşya çavê xwe çû bû misirê, çî ji ber taybetmendîya Bedirxanyan çî ji ber nexweşya Mîqdad Medihet BedirXanî û zulm û zordariya dewletê bû sedem ku ev rojnameya "Kurdistan" li dervey welat de ji ber van sedema çêbû Mîqdad Medihet Bedirxan li misirê û li wê derê tevgerên xwe yê welatparêzî bi derxistina rojnameya "Kurdistan"ê berdeham bû.

Derketina yekemîn rojname bi zimanî kurdî li dawya sedê nozdê û li dervey axa kurdan dest pêkeka nû bû ji bo aşina bûn bi cîhana roşingerî li dinya û pexiş kirin û xwastên nîştîmanî bi dinyayê nasand, eve ji aliyê naverokê ve dîsa ji aliyê teknîk û çap rojnamewanî ve bişêweyekî seretahî dest pê kirye, belê eger digel barudoxê wî demî hevbeş bikîn dibînîn hunerê rojnamenûsyê gelek paşkeftî nebû çunkî ji aliyekî karê rojnamegeryê ji aliyê gelên din û wê nawçê bi wî radey pêşneketbû ku bi bîte cihê mendehoşyê ji aliyekê din jî rojname li qahîre derket ew dem ce û binkew serheldana çapxane û pêşkeftina rojnamegeryê bû pêşengên rojnamegerya kurdî jî sud ji wan helu mercan ji aliyê huner û teknîk û şêwazê nû wergirtiye, karîn yekemîn rojname kurdî li yekemîn jimare de xwe li hindek kêr û kasyan derbaz bikin ku bo kurd û roşenbîran ta niha ji hindek layanive cihê mînaqêşekirinê ye)⁶⁸.

Em dikarîn divê rojnamê di dû agehyan lêkolîn bikin, agehya yekem ev rojnameya dema li qahîre derket û agehya dûyemîn jî demê ku ev rojnameya li ewropa derket, dema ev rojnameya li qahîre derket zêdetir bangê Kurdistanê dikir û zêdetir nêzîkê gelê kurd bû ji ber vê yekê ji aliyê erdingaryê ve qahîre nêzî Kurdistanê bû, ev rojnameya divê agehya yekemîn de pirtir çap dibû û li ser gelê kurd bi bandor bû.

Li ser vê yekê celîlê celîl dibêje: *Mîqdad Medihet berdirxan li tirkîyê baz dabû qahîrê wek mihacirekî li qahîrê dijiya, rojname organe tu Komela û rêxistinên siyasî nebû, Mîqdad Medihet berdirxan têkuşerekê welat parêz û roşenbîrekê zana bû, dikarî rojname û çapî, digeşkirin û pêşve birine çanda netewî de geşitî bû jiber vê zanayetyê û bîru baweryê bû ku ev rojnameye derket hewceya wî biraynî ye).*⁶⁹

67. Murat AKTAŞ - Mihemet YONAT, *Dîroka Çapemenya Kurdî Dema Osmanya*, r.28.

68. Xazî Hesên, *Pêşkeftinî Hunerî Li Rojnamegerî Kurdîda*, Ko (Karwan), J (120), r.67 .

69. Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, b.n.b, r.30.

Mîqdad Medihet Berdirxan* tinê pênc jimareyên rojnamê derxist, sê jimareyên dest pêkê li çapxane "el hîlal" û dû jimareyên dinê rojnamê di çapxana xwe da bi navê "çapxana rojnamê Kurdistanê" der xistin, ev çapxaneye yekemîn çapxaneya kurd ye ji aliyê Mîqdad Medihet BedirXanî hatiye damezrandin⁷⁰, (rûpelên rojnameyê bi qebarê (32.50 x 25.50 sm) nezêde mezin bûn⁷¹, her car dû hizar hep dihatine çapkirin, li ser rûpelê rojname ya yekemîn hatiye nivêsandin ku mehê dû car derdike ve, lê belê ji ber zorî û rewşa xirap bi aweyekê bê ser û berî derineketîye, rojname bi kirmanciya jor û bi devoka cizîra botan hatiye nivêsandin, aşkiraye ku ev di wî demî de di nav kurdan de pir belav bûye û xwediye rojnameyê bi xwe jî bi vê devokê axfitî ye)⁷².

Dema mirov di naveroka van pênc jimarên li qahîre derketine di nêhrî, mirov di bîne ku aliyê rojnameyê ya perwedehî û çandî giran û mijarên polîtîk ji kêmin, ev rojnameya pir caran li ser arîşên kurdan sekinî ye, ji bo vê em dikarin nivîsek di jimara yekemîn de mînakekê bidin, di wir de dibêje ku: *heyfa min tê ji kurdan re, kurd ji gelek qewman zêdetir xwehîş û zekane, camêr in dîner xwe de rast û qewî ne, xurtin û dîsa wek qewmên dî ne xwandîne, nedewlemend in, dinya yê de çi dibe, cîranê wan mosqof çawaye, wê çi bike nizanin loma riya xwedê de min ev cerîdeyê ha nîvîsî. Bi îzina xwedê te'ala paş niho her pazde roja de carekê ezê cerîdekê binivîsm navê wê min kirye "Kurdistan" vê cerîdeyê di ezê behsa qencya 'îlim û me'rîfeta bikem: li ku derê mirov di 'lime, li kuderê medirese û mekîtebên qenc hene ezê nîşa bikem, li kuderê çi şer dibe dewletên mezin çi dikin, çewa şer dikin tîcaret çewa dibe: ezê hemya hîkat bikem*⁷³.

Rojnamey "Kurdistan"ê ji ser sûryê re belavê Kurdistanê dibû, di nav kurdên ku ji bo xebatê hatbûn şamê de jî gelek xwendevanên ve rojnameyê hebûn, heta em dikarin bêjîn ku girseya xwendevanên "Kurdistan"ê yên herî pir li şamê bûn, "Kurdistan" çi l ser giyanê van xebatkarên kurdê, ku li şamê bûn û çi l ser biryarên wan xebatkarên bandoreka bilind danabû, em dikarin vê bandorê di nameyeka rojnamê de jî bi bînin, di nemayeka xwendevanan weha derbas dibe "rojnameya emîr Mîqdad mîthed

*. Mîqdad Medihet Bedirxan, Herdem Navê Wî Digel Yekem Rojnama Kurdî Dihêt Ku Li Qahîre Li (22)Ê Nîsana Sala 1898ê De, Dîsa Yekem Kese Gutarên Rojnamegeryê Bi Zimanê Kurdî Nivêsabî, Karye Digel Çend Hevalên Xwe Rojnameka Kurdî Bi Navê "Kurdistan" Der Biken, Ta Hijimare (5)A Rojnama Kurdistanê Wekî Ser Nivîser Domye Pişt Re Birayê Wî Bûye Ser NivîserîWê Rojnamê, Babê Wî Mîrê Cezîra Botan Bû, Li Sala 1891ê De Ji Ber Nexoşî û Têkçûna Barê Siyasî Wî Demî Qesta Misrê Kirye, û Di Sala 1910ê De Digel Nivîser û Hevalên Xwe Zivîrîneve Stenbolê, Lê Mixabin Ku Ta Niha Tu Kesî Sala Dayk Bûn û Mirina Wî Bi Drustî Diyar Nekirye, Di Karim Bi Bêjm Nehatye Zanînîn .

⁷⁰. Ferhad Pîrbal, *Mêjulkey Yekemîn Çapxane Kurdî Yekan*, Ko (Rabûn), J (10-11), Stokholm, 1994, r.123-130.

⁷¹. 'Ebidula Zengene, *Rojnamegerîyê Kurdî Le 'Êraqda (Beray Yekan 1914-1939)*, r.57.

⁷². Celîlê Celîl, *Jiyana Rewşenbîrî û Siyasiyan Kurdan (Di Dîwana Sedisala 19an û Destipêka Sedisala 20an De)*, Jîna Nû, Uppsala , 1985, r.33 .

⁷³. Dilgeş Felat, b.n.b, r.33 .

Bedirxan gehîşte destê min, min tev kurdên der û doran berhevker û rojnameyê nîşanî wan da, bi xweşî ewan maç kirin û danîne ser serê xwe, ji pişt re min ji wan xwand pir kêfixweş bûn, di naveroka wê baş gehîştin û dilê wan da runişt û biryar dan ku dest ji h bideneber xwendinê ji bo ku hînê pîşe û hunerê din jî bin)⁷⁴, wek vê meselê di kovara "Rojî kurd"ê de jî nivîsekê wekî vê heye, di wirda jî qela gundekî ku li şaristanyê dûre, dike li mizgeftê wî gundê ku di kovara "Rojî Kurd"ê da qela wî tê kirin, kovareke kurdî heye û ew kovar di wê mizgeftê de wek quranê tê paristin. Dema kuv î mirovî ku qela vê buyerê dike, ji gundiyan di pirse û dibêje: ev çiye? Gundî dibêjin ku ev mecimwa yekî kurdî ye û dîsa gundî dibêjin kum e çend caran vê mecimwayê bi millê gund da xwandin û gundî dibêjin: "Kurdî û Nivîs!" dema ku gundî vî tiştî dibêjin û ew kovar dixwîn in, li gor gotina ewî ku vê bûyerê dighîjne me: ji çavê gundiyan de hîsir dibarin)⁷⁵, ev bûyere ji bo hestên wî demî mînakekê başe.

Emê li pênc jimarên rojnameya destipêkê bi nêhrîn dibînîn ku ji xeyrî nameyên xwendevan hemî nivîs ji aliyê Mîqdad Medihet BedirXanî ve hatbûne nivêsandin, ev jî ji aliyê nivîsê van tenêtya Mîqdad Medihet Bedirxan dikevît holê, lê Mîqdad Medihet Bedirxan ji bo vê yekê pirisgirêkê çareser bike, ji xwendikarên kurd ku li erbîlê û sulêmanyê hatbûne ezherê û tehsîl di dîtî re pêywedî danîbû Mîqdad Medihet Bedirxan ji bo wan ciwanan dendorê xwe kom bike û dixebitî.

Eger têksit û nivîsînên jimare (1-5) rojnama Kurdistan digel jimareyên dinê rojnamê danîne ber hevdû ev çende ji bo me diyar dibît ku Mîqdad Medihet serinivîserî yekem zimanekê nerim û lîbiralî û çareser xwazane hebû gelek caran (paraneve) li hember sultan 'Ebidulhemîdî bi karhînaye, lê 'Ebidurehman serinivîserê duwemê rojnama Kurdistan zimanekê tundu tîj û yaxî û şoreşgêr hebû dawaya fîdiralîzim li çarçovê dewleta osmanya bo neteweyên jêr dest mîna kurdan kirîye.

Li vir de dixwazim bala we ji bo çend taybetmend û edigaran bikşînim"

1. Ev rojnameye herdem bi çar rûpelan derdiçû, parêzgarî ji rupelên xwe kirye, bêguman li wî demî pirisgirêkên çap û kêma ya nivîserê ku kurd yê bizanin ya zehmetî ya gehîştina babet û nameyan çunkî li derveyê Kurdistanê dihate çap kirin û kêma û narehetî û pareyên pêwîst bo derkirinê çunkî rojnameyeka ehlî bû, zêdebarê vê çendê jî gehandin bi Kurdistanê karekê hisan nebû....., diyare ev pirisgireke her hemî belku çendê din jî hebûn, çi jivane nekiribûne bi hane ta bi qebareka biçûkitir derbikin, eger niha buwaye bi van hemî pirisgirekan li waneye çendîn caran gorankarî têda dihatine kirin.
2. Ji aliyê ruxisar û derhênana hunerî ve, ev rojnameye herdem rûpelên wê li ser dû ya sê stûn dabeşkirî ye, li rûpelê ewl de li beşê serî de navê rojnamê "Kurdistan"

⁷⁴. Celîlê Celîl, *Jiyana Rewşenbîrî û Siyasiyan Kurdan (Di Dîwana Sedisala 19an û Destipêka Sedisala 20an De)*, Jîna Nû, Uppsala , 1985, r. 37 .

⁷⁵. Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, b.n.b, r.32 .

ji ber aşinabûna nivîseran bi elf bê 'erebî bi "kirdistan" hatbû nivêsandin, ev nave "kirdistan" di naverasta rûpelê û bi xetekê mezin û bal kêş hatî ye nivêsandin li jor de sala derçûnê (1315) ku ev sala hicirîye û li hemberî (1898) hatiye nivîsîn, li hemî jimareyên her çar salan ev sale diheman ceh de nivêsabû, ji aliyê rastê ev nav û nîşane rojnamê û nav nîşanê post û tîraj di her jimareyekê de hatbûne nivîsîn û ji aliyê çep jî da heman nivîsîn bi zimanê turkî nivîsîn, abûnên salane ku (80) qiriş bûn, li jêr navê "kirdistan" her carê çend riste têda dinivîsîn, car hebî mawê derçûnê têda aşkîra dikir, (pazde roja carekê têt nivêsandin, cerîde ya kirdî ye) digel hindêk zanyarî din jî, hendêk caran jî dûbare dibûneve hindêk caran tiştê din li cihê wan belav di bûn, piştî vane dû hîlê terîbê dirêj bi panaya rojnamê xistbûne jêr zanyariya navbera van hêlan sentîmetirek bû roja derçûnê her jimareyekê bi herdû rojmêra hîcirî û romê dihatine belav kirin.

3. Ev rojnameye rojnameyeka der bi der bû, ji ber vê çendê qed li cihekî diyarkirî cihgîr nedibû, belku her maweyekî li cihekî derdiket, jimare (1-5) li "Qahîre" derdiket, piştî hingî jimare (6-19)ê li "Cinêf" siwîsra derkit, dîsa careka din jimare (20-23)ê dûbare li "Qahîre", jimare (24) li "lenden" derkit, jimare (25-29)ê li "Folkiston" derkit, dîsa jimare (30-31) li "Cinêf" derkit, ev hemî mandî bûn û nîştîmanperweya xudanê wê derdixît çunkî mirovê têkuşer hewl daye bi her nirix û mandî bûnekê bît bigehte xwendevanên kurd û agehdarkirina wana)⁷⁶.
4. Ev rojname bi kurd yeka rewan û kirmançîya jûrî bi devoka cizîra botan dihat belav kirin, car caran li piştî jimare (4) bi turkî jî derdiket, bi taybetî li jimare (16) rojnamey Kurdistan behis kirye, Fewzî Beg* serperşîtê beşê turkî û berisva pirsyar û nameyên tirkî di dave, ev rastiye di nivîsên serinivîserî de der dikevît, dema dibêjît: (*geleg mirov ji min re nivîsn ku nizanin kurmançî bixunin, lewma min qismek tirkî cerîda paş nho nîmê cerîda xwe bi îltîzam xîreta xwarzî yê xwe, fewzî Begê, tirkî tehb' bikem, fewzî Beg sirarduyê (vabig) bê, lakîn... Ew jî rabî hat diyar xerîb*), ev nivîsîne serinivîserî li jimare (16) rojnamê derket bû)⁷⁷.
5. Li sercem manşêtê jimareyên vê rojnamê manşêtî mezin tinê li laperê êk û neh li çî rûpelên din nî ye, wtar jî behira pitir bê nav û nîşanin, ewê, nav û nîşan jî hey tinê êk li dû peîvên kurt pêk hatûn.
6. Li dest pêkê biryar bû dû hefte carek derbikevt pênc jimareyên yekem bi vî away derketin, lê piştî ku li (qahîre) bo (cinêf) hatiye veguhastin, dîsa careka din vegera ve (qahîre) û çûye welatên din, wekî me li jorde jî amaje pêkir derkirin û gehandina van rojname ne karekê hisan bû, ji ber vê dû hefte carek nehate derkirin û buye mehek belê heta jimare (24) jî her li ser hatbû nivîsîn (pazde roj carekê tete nivêsandin) ta jimare (25) hingî li ser hate nivêsandin(heyvê carekê

⁷⁶. Îdrîs 'Ebidula, *Lebarey Rojnamegerî Kurdiyewe (Çwarde Lêkolînewe)*, r.1-2 .

*. Fewzî Beg Kure Xuşkê 'Ebdurehman Bedirxanî Bû, Endamî Îthad û Tereqî Bû, Efserekê 'Usmanyen Bû Taze Derçû Bû Ji Ber Zulm Zordarya Dewletê Hatbû Qahîre.

⁷⁷. Ferhad Pîrbal, *Çend Basêk Le Barey Mêjûy Rojnamenusîy Kurdiyewe*, Dezgehê Çap Pexşî Serdem, Sulêmanî, 2007, r.39 .

der dikevt), ev çende jî xem xorî û rastgoya serinivîserî derdêxît beramber bi xwendevanê xwe.

7. Ev rojnameye zimanhalî ew Komela siyasya kurd ye ku li sala 1897 Mîqdad Medihet Bedirxan digel komeleka roşenbîrên kurd li estenbolê damezrandî, lê derfet li stenbolê bo nehatbû rêkxistin ev çende jî êk ji wan egeran bû Mîqdad Beg han bidet rû li qahîrê biket, siyaseta rojnamê weha bû li rêka deqên ayetên pîroz de amaje bi mafên netewe xwe dikir û bi awayekê weha hatbû nivêsandin ku bandora wê li ser xwendevanên kurd hebit.
8. Her li wtara yekem jimara rojnamê de çext li ser rol û giringya zansit û xwandinê kirîye, rolên kurdan han dayne ku bixunin li rêya bi dest hînana zansitê de milletê xwe beref pêş biben, ev çende jî jîrî û jiyara kurd der dêxît ku cihê şanazyê ye)⁷⁸.

Emê digehîneka ewrupyê de dibînin ku nêrîna rojnameya "Kurdistan"ê gelek guhirye bi taybetî jî di mijara siyasî de ev guhrîn pêk hatiye demê rojname li qahîre derket ji sultan 'ebidulhemîdî merhemet û alîkarbûyne kurdan dihate xastin û ji felleyan (ermenyan) re jî peywendiyekê zexim tûne bû, lê belê gehîneka ewrupyê de rewîş gohrî bû û li hemberî sultan 'ebidulhemîdî helwîstekê dijiber hatbû girtin, dîsa peywendiya ku ji felleyan (ermenyan) re hebû di dema ewrupyê de hatbû şandin, heta ji bo rojnameya "Kurdistan"ê bighîje Kurdistanê, bi rojnameyên felleyan (ermenyan)ve, ev rojnameya dihate şandin .

Em dikarin bêjin ku peywendiya 'Ebidurehman Beg* û tirkên ciwan jî tund û zexem bûn, ew dem ku rojnama (Osmanî) li meha 12/1897 de li "Cinêf" li paytexta suyisira ji aliyê 'ebidula Cewdet û dr. Îshaq sikutî bi zimanê tirkî û ferensî der diket)⁷⁹, ev rojnameye ji aliyê dû ronakbîrê kurd derdiket eger rê bi rojnameka kurdî jî nehête danan belê rêk xweş kir ku piştî çend mehan rojnameyeka kurdî der kevt, her jiber vê yekê navbera 'Ebidurehman Bedirxan û vê ekîba cinêfê ya partya alîkarî û Pêşketinê gelek baş bû.

Peywendiyeka mezin dinavbera rojnama "Osmanî" rojnama "Kurdistan" de hebû, ji ber vê yekê pirinis sebahettîn muxalîfê sultanî bû û di encama vê yekê di ji ber bûynê de pirinis sebahettîn dixwast ku civatên ku tirk û ên tirk nînin bikşîne aliyê xwe û muxalefetiyeke zexim dihemberî sultan çê bike, her ji bo vê yekê navbera pirinis sebahettîn û 'Ebidurehman Bedirxan gelek baş bû heta wê yekî rojnama Kurdistan li

⁷⁸. Îdrîs 'Ebidula, *Lebarey Rojnamegerî Kurdiyewe (Çwarde Lêkolînewe)*, r.3 .

*. 'Ebdurehman Medihet Bedirxan, *Serinivîserê Duwemê Yekem Rojnama Kurdî Ye "Kurdistan" Jimare (6-31), Li Sala 1890ê De Li Stenbolê Li Wezareta Me'arîf Bû, Me'awnê Rêveberê Îdarê Bûn, Li Sala 1891ê Digel Brayê Xwe "Mîqdad"Î Çûye Welatê Misrê, Digel Çendîn Nivîser û Ronakbîrên Kurda De Çendîn Komelan Damezrandîne, Ji Bo Zanyarê Zîde Tir Bnr. Li Pertûka(Ferhad Pîrbal, *Çend Basêk Le Barey Mêjûy Rojnamenûsîy Kurdiyewe, Dezgehê Çap Pexşî Serdem, Sulêmanî, 2007, r. 31-36* .*

⁷⁹. Ferhad Pîrbal, *Rojnamegerîy Kurdî Bi Zimanê Ferensî, Belav Kiryên Kovara Senterê Birayetî, J (1), Hewlêr, 1998, r.8.*

çapxana "Osmanlî" derdeket)⁸⁰, dema rojnama osmanlî yê li cinêfê derbasî londonê û paşî derbasî folgistonê bû bi wê rojnameyê rojnama Kurdistan jî derbasî wan bajêran bû, ji bo peywendiyên navbera pirinis sebahettîn û 'Ebidurehman Bedirxan di rojnameya fleyan (Ermenîyan) ev derbaz dibû ('Ebidurehman Bedirxan yekek bû bûye ku daxazî û alîkarya rojnameya osmanlî ya kirîye)⁸¹.

Rojname Kurdistanê jî wek vê rewşê nêzikê tirkên ciwan bû, lê ji ber ku hê tirkên ciwan ji aliyê fikir û ramanên xwe ve neguhrîbûn û hê sultan Evdilhemîdî ji ser text bû ev rojnameya hat girtin ev dûrîtî neket bû navbera partîya yeketîfî Pêşketinê û 'Ebidurehman BedirXanî de.

Me li jor de jî got bû ku di rojnameya "Kurdistan" ê de xenêcî nameyên xwendevan nivîsî hemû li hêla Mîqdad Medihet Bedirxan û 'Ebidurehman Bedirxan ve hatine nivêsandin, lê belê di rojnama roja nû jimare sêyemîn de, di sala 1943an di ji hêla celadet elî Bedirxan tişteke weha nivîsî ye (welê di xuyaye ku hîngî Mîqdad Beg ji birayê xwe ê mezin Emîn 'Elî Beg yê ku hîngî li stenbolê bu nivîsan xwet bûn, Emîn 'Elî Beg ji birayê xwe yê biçûk re dinav nivîserên din de teqirîrek jî rêkiribû lê na be navê xwe ji ber ku nikarî bû lê belê bi navê "Lawê Şêx E.Fetah)⁸², divir de dihête zanîn ku Emîn 'Elî Beg ji Mîqdad Medihet Bedirxan re nivîsînek şandî ye, di vê yekê de em dikarin bêjin ku ew nivîsîn bê nav hatine nivîsîn dibe di qismekê wan ji hêla Emîn 'Elî Beg hatbe nivîsîn di rojnamê de xincî van nivîsên ji hêla van hersê mirovan ve hatine nivîsîn, hîn nivîsîn din jî hebûn li gorî rêza jimaran kesên ku name teqirîz nivîs û helbestên wan di rojnama "Kurdistan"ê de hatiye weşandin, evin:

1. Hacî qadirê koyî
2. Ehmedê Xanî
3. Law şêx e. Fetah
4. Jierşîfên diyar bekirî, ş.m.
5. Mela salihê Cizîrî
6. Şêx hesen
7. Mîr ciger xûn
8. 'Umer fewzî
9. Reza
10. Rewf qullrî
11. Seîd tahrê botî)⁸³.

Rojnameya "Kurdistan"ê de hêla çendê ve jî hîn tevger hatbûn kirin. Mîqdad Medihet Beg hêla çendî gelek giring di dît û ji bo vê yekê di jimare sê yemîn a rojnama "Kurdistan"ê de dest pê çapa "Mem û Zîn" a Ehmedê Xaniyê nemir kir, ji bo

⁸⁰. Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, *Dîroka Çapemenya Kurdî Dema Osmaniya*, r.39 .

⁸¹. Celîlê Celîl, *Jiyana Rewşenbîrî û Siyasiyan Kurdan (Di Dîwana Sedisala 19an û Destipêka Sedisala 20an De)*, r.41.

⁸². Dilgeş Felat, b.n.b, r.194 .

⁸³. Ferhad Pîrbal, *Çend Basêk Lebarey Mêjûy Rojnamenusîy Kurdiyewe*, r.39-40 .

vê yekê di jimare dûyemîn a rojnamê ewha derbas dibe (her cerîdekê de ezê ji wê kitêba "Mem û Zîn" hinê binivîsîn, heta xals dibû... Ew kitêb berî dû sed sala hatiye nivêsandin, hin derê wê heşfîne, nayên xwandin, derên nayên xwandin însaella ezê bikarbim bi xwe tamam bikem, hek ji vê kitêbê destê yekê de hebitin, ez hêvî dikim ji min ra rêkit de ez ya li destê xwe de rast bikim beşê ezê dîsa kitêba wî jê re rêkim, niyata min ezê wê kitêbê tebî jî bikim, heçiya vê bila nûho ve ji min re binivîse)⁸⁴, xêncî vî çalakyê ji xwe vê rojnamê xwe cara dest pêkê kurdî nivîsê pexşane "rastnivîs" weşandiya dest pêka vê rojnamê di medireseyên kurdan de nivîsîn ku kurdî dihatin nivîsîn pexşanên herî pêşî de rojnameya "Kurdistan"ê de, ji hêla Mîqdad Medihet Bedirxan hatine nivîsîn û weşandin.

Jimara dawî ya 31ê di 14ê nîsana 1902an de tête derxistin û pey wê dîrokê rojname Kurdistanê di derinayê .

3.2. Hevkarî û Pêşketina Kurd (Rojnamey, 1908):

Rojnameyaka dînî û siyasî û civakî ye heftane ye, bi herdû zimanê kurdî û tirkî li stenbolê derdiket, li pey îlankirina meşirûtiyetê, rewşenbîrên kurd ên ku ji aliyê sultan Evdilhemîdê duwem ve hatbûne mişexte kirin, bi piristîjeka meşirûyetperwer ve stenbolê, di nav kurdên ku vegeerî bûn stenbolê de yê ku herî bipirestîj Seîd Evdiliqadirê kurê Şêx Ebidullahê mehrî bû, ev kurdan li stenbolê ji aliyê fikirên meşirûyetê ve tevgeran dikirin û dixwastin ku kurd jî, ji meşirûyetê para xwe heldin lê belê rêxistinekê ev rewşenbîrên kurdan tune bûne, ji ber vî yekê di payîza sala 1908an de Seîd Evdiliqadir û Emîn Bedirxan li stenbolê komelekê bi navê "Komela Hevkarî û Pêşketin a kurd"* (Kürît Teavûni ve Teraki Cemiyeti) komelekê damezrandin ev komelê bi kêmasî nûnerê sê binemalê kurdan ên mezin Bedirxanî, Şemzînanî, Babanî bû)⁸⁵.

Kürît Teavûni ve Teraki Gazetesi di sala 1908an de li stenbolê dest bi weşanê kirye û bi kurdî (kurmancya bakur û başûr) û tirkê derketiye, li gor ku li ser qapaxa wê hatiye nivîsîn organa belav kirina fikirên komela alîkarî û pêketina kurd (Kürît Teavûni ve Teraki Cemiyeti)e .

Di rêzimana "Komela Hevkarî û Pêşketin a kurd" (RHPK) de, hatî ye nîşan dan ku vê komelê dê di heftê carê rojnameyeke kurdî û tirkî derxe, li gor vê biryarê rojnamegerya vê komelê " rojnameya Hevkarî û Pêşketin a kurd" (KHPK) derket)⁸⁶, di bergê rojnameyê de "navgîna çapkirina fikirên cemyetê ye" dinvîse dîsa"

⁸⁴. Dilgeş Felat, *Rojnameya Kurdî Ya Pêşîn Kurdistan*, r.86.

*. Hemî Jimareyên Vê Rojnamê Li Pertûkekê Da Dûbare Li Siwîd Ji Aliyê Mamosta Mihemed Emîn Boz Erselan Hatine Çapkirin, *Gehîştîye Kurdistanê* . Zengene..

⁸⁵. Celîl, C., *Jiyana Rewşenbîrî û Siyasiyan Kurdan (Di Dîwana Sedisala 19an û Destipêka Sedisala 20an De)*, Jîna Nû, Uppsala , 1985, r. 73-74 .

⁸⁶. Malmîsanîj, *Kürît Teavûni Ve Teraki Cemiyeti*, Ve Gazetesi, 1999, Îstambul, Çapxaneyê Avesta, r.55.

rojnameyeke dînî, 'limî, siyasî, edebî û civakî ye ku niha heftê êk carê çap dibe" dinvîse.

Rûpelê nav de destpêkê de "ji aliyê cemyetê ve helbjartî xwediyê îmtiyaz û serkar û mûharrîr Pîremêrd* bûye" û serinivîser: Ehmed Cemîl Diyarbekirî* bûye, û dîsa ji kurdên xwedîy fikir û qelem re rûpelên me her wext vekirîne. "Dinvîse".

Ev rojname pey rojnameya "Kurdistan"ê a ku di sala 1898an de ji qahîre ji aliyê Mîqdad Mîthet berdirxan ve derketbû, rojnameya dûyemîn ya kurdane, dema em van herdû rojnameyan di daneber hevdu em dibînin ku rojnameya "Kurdistan"ê mehê carekê derdikeft lê "RHPK" di her hefeteyan de carekê derdikeve, ev rojnameya bi herdû şewezarên kurmançî û soranî derdiket, taybetiya xwe ya bi kurdiya soranî nivîsînê ve "KHPK" û navê, rojnameya destpêkê bi soranî nivîsye û hatbû belavkirin.

Wekî em dizanîn ev rojnameya neh jimarekê wê derkeftin û dîroka van jimareyan wehaye:

- 1- 22ê teşîrîna duwê 1908.
- 5- 20ê kanûna êkê 1909.
- 6- 27ê kanûna êkê 1909.
- 7- 3ê kanûna duwê 1909.
- 8- 10ê kanûna duwê 1909.
- 9- 17ê kanûna duwê 1909.

Wekî em li nivîskarên vê rojnameyê dinêhrîn em dibînin ku gelek nivîskarên hêjayên kurdan bûyne, demê behsa doza kurdayetê dikin dibînin dewrekê karîger li ser Komela kurdîy dîtiye, van nivîskaran tinê bi zimanê kurdî nivîsîne ji xeyrî vê bi zimanê tirkî ve jî nivîsîne, dinav van nivîskarin de ên ku tirkî nivîsîne evene (Babanizade Îsma'îl Hekkî, Ehmed Cemîl Diyarbekirî, Mezharzade Mazhar

*. Ji Bo Wergirtina Zanyaryan Li Ser Jiyan û Berhemên Pîremêrdî Li Rûpelên() Vê Namê De Bnr. .

*. Ehmed Cemîl Diyarbekirî (1872-1941) Bi Navê "" Mirikatibizade û Ehmed Cemîl (Asena) Jî Tê Naskirin, Li Dîf Nivîsa Zinar Sîlopî Ku Têde Weha Dibêje: Ehmed Cemîl Paşa û Xelîl Xeyalî, Kurdîzade Ehmed Ramiz Disala 1908an De Li Stenbolê Çapxaneyek û Dibistanekê Bi Kurdî Vedikin, Jibo Zanyarê Zêdetir Bnr.: Zinar Sîlopî, Doza Kurdistan, Stewr Basîmevi, 1969, r.23., Dîsa Li Gorî Agehyên Ku Şevket Beysanxolu Dide, Ehmed Cemîl Di Ruştîya 'Eskerî Ya Diyarbekirê û Dibistana 'Eşîretê De Xwendiyê, Di Dûr Re Mekteb - Mülkiye Temam Diket, Li Swêrg, Midiyatê, Cizîrê, Nisêbînê, Dêrk, Motkî Bişîrê û Serê Kanyê Qaymeqamî Kirye, Demekê Jî Wekîlê Serokê Belediya Diyarbekirê Bûye, Endamekê Ektîfê Cem'yet Îthad Tereqqî Ya Osmaniya Bûye, Ehmed Cemîl Bi Tirkî Ev Kîtab Nivîsîne: (Hevalê Min Ziya Gokalap, 'Eşîret: Ev Pertûke 239 Ruple, Bedirxanyên Kurd: Destivîs, Notên Tarîxa Diyarbekirê: Destinivîs) Ev Pertûkên Wî Di Erşîfa Enistîtuya Tarîxa Şoreşa Tirikan De Dibêşe Erşîf Nihat Gokalap Da Ye Hijmara Dosayê Wê (28)E, Cebbar Qadr Dinivîse Ku Ehmed Cemîl Ji Diyarbekirê Ye Jimalbata Cemîl Paşa Ye û Birayê Ekrem û Qedrî Cemîl Paşa Ye.

Diyarbekirî, mehmud mun, mela Se'îdê kurdî, Seîd Ebiduliqadir, Suleyman nezîf, Pîremêrd, Xelîl Xeyalî, Mihemed Tahir Cizîrî.....)⁸⁷.

Tiştê ku tevgerên "RHPK" herî rind û mifadar û puxte dike nivîsnên (Seîdê Kurdî yê* ji bo vê emê nivîsnên wî ya bi navê (şîretên Bediyuzeman mela Seîdê kurdî" geşteki li vir binivîsîn.

*"ey gelî kurdan îtîfaq de qwet, îtîhat de heyat, dibiratyê de se'adet, hikumet de selamet heye, kapka îtîhadê û şîreta muhebetê qewî bigirin daw e ji bi aliyê xals ke, qenc guhê xwe bi dinê: ezê tişteki jî we re bêjim: hun bizanbin ku sê cewherên me hene, hefza xwe ji me dixwazim, yek îslamyet, ku hezar hezar xûna şehîdane buhayê wê dane, ya duduwan însanyete ku lazime em xwe nezera xaliqê de bi xizmeta 'eqîl, ciwamêrîni û însanyetiye xwe nîşanê dunê bidin, ya sisêyan: mîllyeta yê ku meziyetê da me: ê berê ku bi qencya xwe saxin, em bi karê xwe bi hifza mîllyeta xwe, ruhê wan qebira wande şad bikin piştî wê sê dujiminê me hene me xirab dikin, yek feqîretî ye cihêl hizra hemalê stenbolê delîlê wê ye, ya duduwan: cehalet û bêxwendîni ye ku hezar ji me da yek "Xezete" nikarin bixwînin delîlê wê ye, ya sisêyan: dujiminî îxtîlafe ku ev 'edawet qeweta me winda dike, me ji musteheqî terbiyê dike û hikûmetê jî bê înisfya xwe zulm ji me fikir, ku we ew se kir, bizanin çarame ew ku em sê şûrê elmas bi destên xwe bigirin ta ku em her sê cewherên xwe ji destên xwe nekin! Her sê dujiminê xwe ser xwe rakin, û şûrê edil mearîf û xwandine, ya duduwan: îtîfaq muhebeta millî ye, ya ssêyan: însanê bi nefisa xwe şuxla xwe bike û mîna sefîlan ji qudireta xaliqê hevî neke û piştî xwe nedê, tê wesiyeta paşî: xwandin. Xwandin, xwandin û destê hev girtin destê hevgirtin destê hev girtin."*⁸⁸

Dema ku em di vê nivîsê de hevoka pêşî dihêrin, li ser hevbendî yeketî birayetî û hikumetê seknî ye û em dîsa pêvajoya î'lan kirina meşîrûyetê dihêrin em dibînîn ku ev tiştên ku li jor nivîsîbûn bingehe armanca vê pêvajoyê teşkîl dan anku (RHPK) meşîrûtiyet perwer û armancên meşîrûteyê ji xwe ra armanc diyar kirye, li nivîsîna serî ji bo me diyaribît Seîdê kurdî hewl daye pirisgirkên kurdan çareser bike rê nîşan bike, Seîdê kurdî "Îslametiye û Însanyet û Mîllyet" mîna cewherên kurdan pêşkêş dike, Seîd kurdî û baban zade îsma'îl heqî dinivîsnên xwe de bi navê " kurd û Kurdistan" de divê mijarê tîne ser ziman, li wê derê de weha dibêje: " *ev netewe pak û paqîş (kurd) li pêşya herî tişt îslame ... Di dayra meşîrûtiyetê de xals û bê xil û kêş osmanyake. û asta sêyem de jî kurd e.*"⁸⁹ tête xuyanê ku ev vêxistina kurdan bi temamî meşîrûtiyetperwer bûye û sêdaqeteka giştî vê îslamê û fikira osmanyetê vê girêdayî bû ye.

⁸⁷. Malmîsanij, *Kürt Teavûn Ve Teraki Cemiyeti*, r.65.

*. Ji Bo Wergirtina Zanyaryan Li Ser Jiyan û Berhemên Seîdê Kurdî Li Rûpelên (40) Vê Namê De Bnr. .

⁸⁸. Malmîsanij û Mahmûd Lewendî, *Li Kurdistana Bakur û Rojnamegeriya Kurdî(1908-1992)*. Öz-Ge Yayınlar, Ankara, 1922, r.36.

⁸⁹. Malmîsanij, *Kürt Teavûn Ve Teraki Cemiyeti*, r.137.

Di çapemenya kurdî de bo cara êkê û kêma car qala pertûkxaneyan hatiye kirin, di virda pertûkxane wek çareseriya pirisgirêkên civakî hatiye dîtin, dîsa ev kara pertûkxane vekirin pêdivye bi saziyekê ve bi bûya, ji bo tiştê jî rê û rêbaz hatiye nîşandan, ji bo perwerdeya kurdan di "RHPK"ê di gelek cihan dinvîse û derbas di be, ji bo vê yekê "KHPK" hîn vexistin pêk anye, di nav vaneda ya here diyar û aşkera dibistana kurdan a ku li Stenbolê vebûy û jî heye, ji hikumetê jî ji bo perwerde têkeve nava Kurdistanê hin tişt hatine xastin, dîsa ji bo vê yekê nivîsa Seîdê kurdê ku de "RHPK"ê de bi navê " *xîtaba Bediyuzeman mola Seîdê kurdî li mebûsan*" ve derketiye em dikarin wekî *mînak bidin, ev nivîsa hanê heta dawî derheqê meşirûtiyet û mezaca meşirûtiyet û şerî'etê de agahî deye mebûsan di dumahyê de derheqê perwerdeya kurdan de weha nivîsye*" ji ber ku ez kurdîm derheqê kurdan de ez dê hîn tşan bêjim, ewha kurdên me perwerdeyê ji xetên cewher şûrande hin bûne, ji ber çar sedeman perwerdeya nû direvin, ya yekem: *hin meselên fenê di jê hin perwerdeyên ku gel bxeletî îslam zen kirine, ya duyem hin ehlê fennê zexîra dîn hindik hîn bûne û agehyên ku derheqê dîn de kiyasê wan fennên ku baş him bûne dikin, ji ber vî yekê dikevin xeletyê. Ya sêyem: fennên nû muxalîfê medireseyane weku ev medereseyan kurdên me menba her kemalê dizanin. Ya çarem: ji ber ku ew fen bizexîrî ji welatên ecnebiyan tê çareseriya vê yekê bi aaliyên hemî diya vê dibistanan bi navê medireseyan ve, têxistina nava kurdane bi vî yekê fennên nû dê bikeve nava kurdan, wan medireseyên ku li holê rabûye jiyan din û xarin û vexwarina xwendikaran jî, ji m'arîf û evqafê (wezereta weqfan û pederdeyê) ve dayîn*⁹⁰, di virda pirisgirkên kurdan ya perwerdeyê bi awayekê baş hatiye çareser kirin, dîsa nivîsîna serî da ji dewletî hatiye xwastin ev birisgirkên hanê çareser bikin, hetta ji bo xwarin û vexwarina xwendekaran ji wezaretê perwerdeyê harîkarî hatiye xwastin, anku ji bo van medireseyan fermiyet pêwîst hatiye dîtin.

Zêdebarê wê çendê ku ev rojnameya temenekê kurt hebû belê serbarî wê çendê jî rolekê berçav di pêşxistin û beref pêş birin û rênîşandana komelê kurdan de hebû, (ev rojnameye bo mawê neh mehan domî ye)⁹¹, dîsa di pertûka dîroka çapemenya kurdî weha dibêje: (di 3ê avrêla 1909an de li Stenbolê bûyereke hemberê meşûtiyetê pêk hat, di encama vê bûyerê li Stenbolê gelek tevlehevî çêbû, ji bo ku vê tevlehevî de ji holê rake, ji selanîkê arteşeke bi navê "Hareket Ordusu" hat li Stenbol û rêveberîyê xistin destê xwe ji vê bûyerê re, di dîrokê de " bûyera 31ê adarê" têt gotin, wexta ku ev bûyera pêk hat "RHPK" hat girtin, ji ber vê yekê organa çapemenê ya vê komelê "KHPK" û şaxên vê komelê ên ku li Kurdistanê bûn jî hatin girtin)⁹².

⁹⁰. Zehra Yaycinlik, *Bedîwiziman Seyd Newresî*, Munazerat (Wer: Ayhan Meretowar), 2010, r.523.

⁹¹. 'Ebidula Zengene, *Rojnamegerîyê Kurdî Le 'Êra Qda (Berayyekan 1914-1939)*, Nama Master, Wer Bo Kurdiyê: Tarîq Karêzî, Zanîngeha Bexda, Pişka Ragehandin, 2001, r.179.

⁹². Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, b.n.b, r.51.

Ev rojnameye gelek bi lez li hemî Kurdistanê belav bi bû, di belav bûna vê komelê de tiştê herê herî bandor bû divê rojnamê da dû sê şîretên kurdan ên mezin hebûn û van weşîran aliyê pêşengiya vê komelê de ji hevdû re ketbûn reqebatê .

Wek encam em dikarin bêjn ku vê vêkxistina "KHPK" vêkxistineke kurdan ya fermî bû, xizmeteka ciddî ji kurd û kurdayetê re kir û ji bo vekxistinên başya xwe jî bû pêşeng.

3.3. Rojhelat û Kurdistan (Rojname: 1908):

Dema ku meşirûtiyet di sed sala 20ê hate î'lan kirin û derket di bwarê rojnameyan gohrîneka pir giring jî hat gorê di nav van rojnameyan de yek ji aliyê (Ehmed Şerîfê Hersikî û Bediryê Meletî û Îsma'îlê Hersekî)⁹³, derket, navê wê "Rojhelat û Kurdistan" bû, ev rojnameye bi tirkî û 'erebî bi tîpên 'erebî derket, tarîxa derketina vê rojnamê li ser jimara yekemîn de weha hatiye nivêsandin "1326:1324(1908)" sala yekem û jimara yekem, her weha di ser bergê vê rojnamê de cihê îdara wê û abonetya wê nivîsye, cihê îdara dibû "nûr _ û osmanyeyê daîre mexisûs a 49 nemire"ye, heqê abunên salê jî ji bo stenbolê 40 qurş bûn, ji botaşirayê salê û heqê posteyan bi 60 qurşan bûn û ji bo welatyên biyanî bi heqê postê û salê ve bi 80 qurşa bûn, dîsa dibergê wê de evejî hene "niha heftê dû car derdikeve"¹⁹ teşîrîna duwê 1908)⁹⁴ mudur û berpîrsê wê (Ehmed Şerîf hersikî) û serinivîskar (bediryê meletî*) bû, her nûsxeveka wê ji deh rûpelan pêk dihat, û di dawî de rojnameyek rewşa Rojhelatê ya siyasî ve şaybeya rojavayî ya li hember însanyetê û d'weta ayîne pîroz tesuyr dike û ya nivîsye,

Dema em naveroka vê rojnamê dinêhrîn em dibînîn ku rojname derbarê bosna hersikê de dinvîse, sedema vê yekê ev rojnameya ji aliyê dû mirovan derdiket, jîmareyên vê rojnamê gelek dikêmin tinê (5) jîmare derketine)⁹⁵.

Ji aliyê naverokê ve eger em li ser vê rojnameyê hûr bi bin, divê em destipêka nivîsa ku rojname li ser navê xwe bi ser nivîsa "Bedirxan"î nivîsye binêhrin, di wê derê de weha hatiye em bi hesiret û hêvî li benda hatina Mîqdad û `Evdurehman Beg ne ku li ewrupayê dest bi derxistina rojnama "Kurdistan"ê kirine, di wirda çûy ye

⁹³. 'Ebidula Zengene, *Rojnamegerîy Kurdî Le 'Êra Qda (Berayyekan 1914-1939)*, r.180.

⁹⁴. Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, b.n.b, r.52.

*. Mehmûd Bedirî Bege, Bediryê Meletî Kurê 'Elî Ramiz Efendiye, Di Sala 1877ê De Li Meletyê Hatye Dunyayê, Li Mekteba Herbyê Xwendiyê Disala 1901-1902an Desturinameya Xwe Ji (Tedrsat-1 Askiryê Mufettîş-I Umumilîği) Bi Paya Serpel Hildaye, Bediryê Meletî Çend Ziman Mîna (Tirkî û 'Erebî û Farsî û Ermenekî û Ferensî û Elmanî û Îngilîzî) Zanîbû, Hem Endazyarî û Hem 'Eskirî Kirye, Berdiyê meletî Hin Pertûk Jî Nivîsî Bû, Pertûkên Ku Nivîsî Bû Evin: (Veliahd Veya Mahkeme-I Istikbal, Kulliyat-1 Nefise - Küçüki Dikişler, Kırımızı, Kitap) Ji Xeyrî Vane Di Rojnameyên "Rojhelat û Kurdistan" û "Rojnameya Hevkarî Pêşketina Kurd" û "Mizgîna Nû"De Jî Nivîsîn Wî Hene .

⁹⁵. Kaya. F.Kürriit. Basini, *Hivda İletişim*, Istanbul. r.84 .

bêyom de ji bo parastina mafên esasên hemwelatî xeyret kirine û bi zeka û zanistya xwe de nav heval û hogirên xwe de davdarin, daxwaza me eve: esîlzadeyên ku çi heq çi ne heq dewletê ew kirine hevkarên gunehkaran, di demekê nêzîk de bigehên meremên xwe her yek ji wan li gor zanebûn û bi kêrhatinên xwe bi bin xwedî meqemekî)⁹⁶, ev nivîsîne gelek girînge jiber ku em di zanin ku Mîqdad û Evdurehman Bedirxan rojnameya "Kurdistan"ê li qahîre û bajarên dinê ewropa derxistin, lê belê dema ku meşirûtiyeta duwem hate aşkira kirin bo wan welatparêzên kurd hê nezvirîbûne stenbolê, ji ber vê yekê rojnama "Rojhelat û Kurdistan"ê daxwazekê li hikumetê kirbû, em dikarin bêjn ku vê rojnameyê bi vê hewesta xwe ve piştî rewşenbîrên kurdan girtiye û xwestiye ku di rêvberya dewletê de hingavên giring bihêne dan.

3.4. Peyman (Rojname, 1909):

Rojnama "Peyman" ji ber ku xwediyê îmtiyaz û mesul mudîrê wê û serinivîskarê wê kurd bûn û cihê ku derketbû ji bajêrekî Kurdistana tirkya bû, vê rojnameyê wek rojnameyeka kurdan dihate hespandin, rojnameya xwesera ku li diyarbekir herî pêşî derketî ye rojnama "Peymanê ye, vê rojnamê destura xwe ji hezîrana 1909an de hildaye û nêzîkê çar hefte şûn de, di (29)ê hezîrana 1909an de dest bi çapê kirye)⁹⁷.

Derbarê vê rojnameyê de ev agehî henin: Peyman rojnameyê serbixoyê ye, hemî rojên yekşemê derdiket û rojnameyê fikir û ramanan osmanyê ye, no:1, 15ê hezîran sala 1325 duşem, xwedî îmtiyaz û mesul mudîr: " Mirikatbizade Şükürü" serinivîskar: A. Bek. derê Kîtabîçlara, li makaza kira- A. Bek. Derê Kîtabîçlara, li makaza kira- î zade lutfî efendî ye, salê 24 bi heqê postê ve 32 qiruşe, nûsha wê bîst pare ye, cihê ku çap dibe çapxana wîlayetê ye diyarbekirê)⁹⁸.

Rojnama "Peyman"ê li gor " Hilmi ziya üiken", çil û heft jimare derketiye)⁹⁹, Murat 'Îsa di gotareke xwe de beyan kirye ku wî gehiştîye sî û şeş heb jimarê vê rojnameyê gelek kêr guherîn di van sî û şeş jimaran de çêbûye, di sî û şeş heftan de tenê sê mijaran de gohrîn pêk hatiye, ev gohrîn cihê firotan û serinivîskarê wê ne, cihê ku pêşî dihat firotin, derê Kîtabîçlarê Maxaza kira- î Zade Lutfî Efendî ye, cihê duduyan jî heman cihê Mazaxa Îslam Bege, serinivîskarê yekem A.Bekî û yê duyem jî a. Cî. Ye, û dîsa ji ber ku jimare pêncan dema ser sala yekem û meşirûtiyeta duwem derket, ev jimare heşt rûpel derket, jimare wê yê din hemû çar rûpel hatiye çapkirin.

⁹⁶. Malmîsanij û M. Lewendî, *Li Kurdistana Bakur û Li Tirkîyê Rojnamegerya Kurdî (1908-1992)*, Òzi Ge, Yayinlari, Anker, 1922.r.27 .

⁹⁷. Murat AKTAŞ-Mihemet YONATb.n.b, r.60 .

⁹⁸. Murat Îssa, Peyman – Dyarbekir In lik, *Hususi Gezetesi -EŞarkiyat İlmi, Araştırmalar, Dergisi*, - w w w .e-Sarkiyet. Com. ISSN: 1308-9633 Sayi:VII, Nisan, 2012, r. 94.

⁹⁹. Malmîsanij û Mahmûd Lewendî, *Li Kurdistana Bakur û Rojnamegerya Kurdî(1908-1992)*. r. 49.

Li jor jî derbas bû ku ev rojname ji ber ku nivîseke kurdî tê heye dinav rojname yên kurdan de tête hespandin, lê hin çavkanyan de tê gotin ku di vê rojnameyê de netenê nivîsekê, pir nivîsên ku kurd ye hatiye nivîsîn, weşane dema em xebata wan kesan ewên ku li ser vê rojnameyê de dinêhrin, em dibîn niku di "Peyman"ê de tenê nivîseke bi kurdî hatiye nivîsîn heye, lê derbarê kurdan nûçe û nivîsên ku bi tirkî hatine gelekî, dîsa nivîsên ku "Ziya Göklap" derheqê kurdan de nivîsîne jî bi tirkî di vê rojnameyê di çap bûne, ne vê rojnameyê û ne jî nivîsên di vê rojnameyê di xizmetê ji kurdan re nekirine .

Tarîxa derketinê:

1. 1 ê..... hezîran 1909.
2. 5 ê..... temuzê 1909.
3. 531ê..... agostosê 1909 .

3.5. Amîd û Sewda (Rojname, 1909):

Derbarê vê rojnameyê de çî zanyaryên tekûz di ber destê me de tune, ev rojnameya bi navê "Amîd û Sewda), Amîd bi wataya Amîda reş navê diyarbakirê ye yê pêşî ye, di bergê vê rojnameyê de weha hatiye nivîsîn, xwedê îmtiyaz û mudir: Şukiryê Diyarbakirî ye*. Şertên: wcareta wê ji bo welatê osmanyê ye, ji bo welatên din wcareta postê jî tête li ser, ji bo rêzekê îlanê şêst pere tête heldanê, her jimareka wê pênc rupele, ev rojname hanê rojnameka 'Imî û hunerî û civakî û edebî ye, her pazde roj carekê der dikeve)¹⁰⁰.

Rojname "Amîd û Sewda" di sala 1909an de li stenbolê bi zimanê tirkî şeş jimarê wê derketin, lê pertûkxana millî ya ku li enqerê ye dinêhrîn, em dibînin ku li wê derê de cihê derketina wê diyarbakir nîşan daye)¹⁰¹, vê tevlevyê ji ber navê çapxana vê rojnameyê ye ev rojname di çapxana "diyarbakir çar Amîd"de hatiye çapkirin, divê rojnameyê de hin nivîs û gotinên pêşiyên ên kurdî hatiye çapkirin .

Li gorî ku Şevket Beysanoğlu dinvîse, ev rojnameye ji aliyê alî Emîryê Diyarbakirî dihate derxistin, xwediyê wê Mehmed Şukiryê diyarbakirî ye (bû)*.

Serînivîskarê vê rojnamê 'Elî Emîrê* Diyarbakirî ji alîyê hezkirina pertûkan ve meşhure, 14000(çarde hizar) pertûkên wî hebûn û ev pertûkan pêş keşî pertûkxana millet ya li stenbolê hatiye ava kirin.

*. Li Gorî Hinek Çavkanyan, Navê Xwediyê Kovara Amîd û Sewda, Şukirî Diyarbakirî Ye û Wî Disala 1908an De Li Diyarbakirê Bi Navê "Amîd" Rojnamek Derxistye, Ji Bo Zanyarê Zîdetir Bnr. (Oral, Fuat, Süreyya: *Türk Basın, Tarihi, Kitap I*, Ankara, 1968, r.267.

¹⁰⁰. Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, b.n.b, r.66.

¹⁰¹. Kaya. F.Kürtt. Basini, *Hivda İletişim*, İstanbul. r.89-90.

*. Ji Bo Zanyarên Zîdetir Bnr. "Oral, Fuat Süreyya, *Türk Basın, Tarihi, Kitap II*, Ankarar, 1968, r.267

Emê hinek ji nivîsên 'Elî Diyarbekirî binêrîn ku di yekem hijmara rojnama Amîd û Sewda derketiye bi seknin, di wê nivîsê de derbarê kesên navdar ên ku ji Amed û Kurdistanê derketine dîsa derheqê başbûna meşirûtiyetê agehî henin, ji xeyrî wan agehyan derheqî damezrandina rojnama Amîdî Sewdayê de ji melumet henin, di wê nivîsê de derbarê damezrandina vê rojnameyê de van agehyan henin, dema ku min "Elî Emîrî" bi Şukirî Beg re axfit ew ji min re got, min destura du rojnameyan heldaye û ez dixwazim tu alîkarê min bi bî)¹⁰².

Mijara gotara Elî Emîrî ya bigehîn derheqê navdarên kurdan de bu ew di gotara xwe de dibêje: ku min çend salê ewl li camya fatîhê di merasîmeke îcazetê de ce girt û ew dem di merasîmê de anana*,ku hate xwandinê de min dît ku gelek navê "Amed"ê derbas dibe. Min ji hevalên xwepirîsî"Amîd li ku derê ye" hîn ji wan gotin li hindistanê ye, hindekên wan gotin li xorosanê ye, lê dema ku min got diyarbakire, hemû hevalên min di nav heyretê de man, dîsa dema ku nivîskar derbarê navdarên kurdan de agehî di de behsa Selahedînê Eyubî, îbin Teyme, mamoste Fatîh Mehmed Şemidîdî Goranî, Mala Batey û her wekê van behsa navdarên kurdan dike, paşê ev mijarê bi mijara paramayna Kurdistanê ve girêdaye¹⁰³.

Taniha di çend petûkan de tinê amaje bi van jimarên xwarê kirine, dîroka derketina wan jimarên:

1. 1.....14ê şubatê 1909.
2. 5.....23ê marsa 1909.
3. 7.....21ê şubatê 1909.

4. Pêşengên Rojnamegerya Kurdî:

Emê der heqê raberên rojnamegerya kurdî û nivîs û belav kirî û pertûkê wana hinek bisekin in, edîb û nivîser û helbestvan ên kurdan rolên wana çî cara nahêne ji bîr kirin çunkî behira pitir jiwana xoşî û mal û jiyana xwe gorî rêya rizgarîxwaz û azadî û nîştîmanperwerya welatê xwe kirine, û hewl dayne ayîndeyekê geş ji bo xelk û netewê xwe berpa biken, wana bi pênvîsê xwe dengê gelê xwe bi hemê cîhanê ya nasandî, ji aliyekê din van nivîseran rolekê gelekê giring giraye derbarê hişyarkirin û agehdar kirina gelê xwe ku take rêya serkeftina her neteweyekî xwandin û destê hev girtine, em li virde çend mînakên ji wan raberan bidin:

*. 'Elî Emîrî (1857-1923) Nivîskarekî Diyarbekirî Ye Ku Bi Navê (Osmanîlî Vilayet -1 Şarkiyesi) Wîlayetên Rojhelat Ên Osmanî, Entolojîya Şa'êrên Diyarbekirê, û Navên Şa'êrên Diyarbekirê Çend Kitêb Jî Nivîsne û Gelek Ji Kîtaban Hez Kirye. Di Zarokatya Xwe De Li Şîrwanê Li Cem Xalê Xwe (Qaymeqaymê Şêrwanê) Bûye Kurd Jî Hîn Bûye, Ji Bo Zanyarê Zîdetir Li Ser Jîyan Berhemên Wî Bnr.: Beysangolu, Şevket, Diyarbekirîlî Fikir Ve Sanat Adamları, C2, Istanbul,1960, r.139-174 .

¹⁰². [Hittp://E-Sarkiyat.Com/Makaleler/Azizasasan.Pdif](http://E-Sarkiyat.Com/Makaleler/Azizasasan.Pdif).

*. Anane, Dema Ku Hedîseka Pêxemberê (S,X,I) Tê Rîwayet Kirin, Bi Rêzê Ên Ku Wî Hedîsiyê Rîwayet Kirine Tê Gotin, Vî Gotin Anane Jêra Dibêjn.

¹⁰³. [Hittp://E-Sarkiyat.Com/Makaleler/Azizasasan.Pdif](http://E-Sarkiyat.Com/Makaleler/Azizasasan.Pdif)

4.1. Pîremêrd: (1867-1950):

Navê wî yê dirust "Tewfîq Mehmûd Hemze"ye, anku Tofîq Begê Mehmûd Axay Hemza Axayî Mesirefe, li sala 1867 mîladî û li hemberî 1288ê hicirî li taxê gwêje li şarê sulêmanî ji dayk bûye)¹⁰⁴, bapîrî wî (Wekîl Xerc) berpîrsê darîy "Ehmed Paşay diwahemîn mîrê baban" bû, her ji ber vê çendê hatiye naskirin bi "mesiref")¹⁰⁵.

Pîremêrd li temenê şeş saliyê de diçîte ber xwandinê bo cara êkê diçîte "Hucire"yê ji aliyê mela "Huseyne Goce" quran û kitêbên seretayî xwandina hucireya wî demî tamam diket, piştî hingî ji bo xwandinê diçîte def Se'îd Zilizileyî, piştî wê çendê ku dikevîte ber xwandina ayînî "Feqyêtî" dest pê diket, li dest pêkê li mizgefta bapîrê xwe ku niha jî yamay li sulêmanyê bi navê "Mizgefta Hemzaxa" ye ku nizîk bû ji malê babê xwe, ji aliyê Mela Mehmûd dersên 'erebî dixwandin, li xwandina 'erbî yê de ta astekê baş diçîte pêş û dest diket bi xwandina "Siyutî" bi dawy xwandinê de mîna hemî hozanvan û nivîserên kurd li pêşyê li dîf zansit û xwandina ayînî geryaye û dûr dikevît ta digete mizgefta şarê "bane" li Kurdistana îranê maweyekê li wê derê de dimînît piştî hingî vedigerête sulêmanyê.

- * Di eylula sala 1882ê de li temenê (15) saliyê de dibîte bi katb nifusê sulêmanyê, gelek pê naçit dibîte bi katbê dadigeha sulêmanyê.
- * Di hizîrana 1883ê de bi bû bi katbê humayunê li helebiçe.
- * Di teşîrîna yekema 1895 ê de bûye m'awn mudîrî şarê "kerbela" belê neçuye dest ji karvekêşay fermanê mîrî vekêşay .
- * Şêx mistefa neqîb kirye wekîlê xwe bo raperandina îş û karên jiyaneke baş û li bar xoliqandî.
- * Li ser de'weta sultan 'ebidulhemîd, şêx mistefayê neqîb û şêx Se'îdê hefid, karwanek rêk dixen û li sala 1898ê de diçîne tirkya, Pîremêrd jî dibîte haw seferê wan.
- * Li stebol li (mabeyn) dibin bi mêvanê sultanî, piştî salekê digel şêx se'îd û şêx mistefa û gelek rewşenbîrên din diçîne hecê Tewfîq dibît bi hacî Tewfîq, ji aliyê sultanê osmanya paya (Beg)êti xistîye pal bûye bi hacî tufîq Beg.
- * Li wê salê de "Zet Paşa" katbî derbarê şehiriyar, berisva wê namê ku "nasiredîn şa" ji bo suiltan 'ebidulhemîdî nivîsî bû, şêweyê nivêsandina namê bi zimanê farsî û zîrekî û hacî Tewfîqî gelek bi dilê wana bû her ji ber vê çendê li (14ê eylula 1899)ê de fermana sultanî bo derdiçît û dibîte endamê mecîlsa bilinda stebolê, her di wî mawey bi harîkarya "'zet Paşa" kolîca yasayê tamam diket, li temuza 1905ê de bangê meşîrûtiyet hate dan mecals têk çû, Pîremêrd bi karê mihamyeta kovar û rojnama ve bû.
- * Li sala 1907ê de "komeley kurd" bi nihênî bi serokatya (Şêx 'Ebidulîqadirê Şêx 'Ebidualiyê Şemzînî) hatbû damezrandin û li 1908 de hîzba "îtîhad û tîrîqî"

¹⁰⁴. Umêd Aşina, *Pîremêrd û Pêdaçûneweyekî Niwêy Jîyan û Berhemekanî*, Weş Wezareta Perwerde, Ç1, Hewlêr, 2001, r.49.

¹⁰⁵. Qenata Kurdo, *Tarîxa Edebyata Kurdî*, Öz Ge, Yayinlari, Anker, 1922.r.297.

kemalîstiya sultan laday, ew komel xwe aşkira kir Pîremêrd jî êk endamê komelê bû.

- * Li meha eylula 1909de bû ye devedarê (qaîm miqaîm)ê culemêrgê .
- * Li meha nîsana 1912de bû ye devedarê qeremursil.
- * Li şiwata 1915de bû ye devedarê balawa.
- * Li eylula 1916de bi heman post ji bo "bît alişbab" hate danan.
- * Li marsa 1917de bi heman post ji bo "gmuş kuy" hate danan.
- * Li meha nîsana 1918de bû ye bi "miteserf"ê şarê (emasêye) li tirkya heta sala 1923ê li wê derê bû.
- * Demê hikumeta 'êraqê li sala 1923-1924ê hate damezrandin, Pîremêrd li tirkya vegeryave bexda û li wê derê jî bo sulêmanyê, li meha kanûna duwê sala 1925de gehiştê sulêmanyê.
- * Her li wî demî biryar da ku kar li dezgehên mîrî nekete ve, li sala 1926de rojnama "jiyan" ji aliyê bajêrvanya sulêmanyê hat damezrandin û "Hisên Nazim" bû mudîrê îdarê û serokê wê, Pîremêrd jî bû serinivîserê rojnamê, di sala 1932de demê Hisên Nazim wexer diket, Pîremêrd dibît bi mudîr û mesulê rojnamê.
- * Di sala 1938de navê rojnamê digorît bo "Jîn" û heta 15ê hizîrana sala 1950 hezaru pazde jimareyan lê çap diket)¹⁰⁶.

Pîremêrd li stenbolê jiyanê dirêj jiyaye umêd aşina ji bo jiyana pîremêrd ewha dibêje: ez (*Pîremêrdê xwe*) li stenbolê li giravên ku pîrensên rûman lê bi rutbe, nîşan û endametya meclîs 'alî ve dijiyan, dema ku ez radizam min dixewnên xwe de li gurgederê ji baxçê şêx ehmedî bazlîxa hinaran di diziya)¹⁰⁷, di virde em dibînin ku Pîremêrd li giravên stenbolê jiyaneka gelek xweş derbas kirye û dîsa her li stenbolê digel jineka tirk re zewcye.

Pîremêrd li stenbolê tenê bi rewşenbîrên tirk re têkelîdar nebû ew di heman dem de bi rewşenbîrên kurd re jî dinav peywendiyê de bû bi taybetî li gor qenatê kurdo kurê Şêx 'Ebidualiyê Mehrî Seîd 'Eduliqadirî Ew Hildabû bin bandora xwe, dema ku Pîremêrd li stenbolê bû, peywendiyên Pîremêrd bi kurdên rewşenbîrên li stenbolê dijiyan jê re hebû, hin rewşenbîrên kurd ev bûn: Emîn Feyzî, Tewfîq Wehbî, Emîn Zekî Beg, Mistefa Paşa, Eşîref Hemze, Salih Zekî Beg, Me'ruf Çiyawuk, 'Ebidula Cewdet, Şerîf Salih Paşa, Kamiran Bedîrxan, Şêx Mistefa Neqîb, Şêx Mihemed Celaledîn, Şêx Mihemed Mutfî,.....)¹⁰⁸.

Pîremêrd disalên yekem de di gehiştina wî bo tirkya her di wî demî de bû bi endamê mecîlsa 'alî li stenbolê û xwendekarê hquqê bû dest kir bi nivîsîn û wegêrana helbest û wtar û zîndî kirineva edebiyata kurdî û nasandin bi cîhana nû, li virde navê wan kovar û rojnameyan dinivîsîn ku Pîremêrd xwedî û serinivîser bû ye yan jî di destên

¹⁰⁶. Umêd Aşina, *Pîremêrd û Pêdaçûneweyekî Niwêy Jiyan û Berhemekanî*, r.49-50

¹⁰⁷. Malmîsanij, *Kürt Teavûn Ve Teraki Cemiyeti*,Ve Gazetesî, r,75.

¹⁰⁸. Malmîsanij, b.n.b, r.76.

nivîseran bû ye yan jî nivîserekê çalak bû bi pênivîsê xwe rûpelên rojname û kovar razandî:

- * Kovara (reslimî kitab) xwedî îmtiyaz hacî Tewfîq Beg stenbol.
- * Rojnamey kurd yan jî (kurd û te'awn û terqî gazetesi) .
- * Digel (Faq Sebirî Beg) rojname (misewr mihît)yan derxist.
- * Di beşa here zor di rûpelên kovara (Jîn)* de li stenbolê helbest û nivîsînê wî hene.
- * Di rojnama (şemis) de gelek caran li tirkya helbest ji bo dinivîsîn û hinartin bo taran, xwediyê vê rojnamê (Seîd Hisênî Îranî) bû, Pîremêrd di vê bwarî de nivîsî ye: "gelê xizimetî xezetey şemis-mi ekirid ke Seîd Hisênî îranî xawenî bû."
- * Di kovara (ferheng) û rojnama (şefeqî surx) de li taran der diket herdem nivîsîn helbestên wî hebûn.
- * Gelek caran ser wtar ji bo rojnama (îqdam) û (hiryet) dinivîsîn.
- * Li stenbolê di sala 1904-1912de di kovara (îfîhad)de berhemê xwe û nejadê kurê xwe belav dikirin.
- * Di rojnama (tercmanî heqîqet)de mi'lim nacî de li tirkya derdiket helbestên wî hene.
- * Bi (dawd heyder kurê îbrahîm heyder)ve xwendekarê lîsansa bilindibû li ferensa dirêka wî de helebsitên nalî û nivîsînên kurdî ji bo rojnama (tan) hartin li parîs derdiket)¹⁰⁹.

Niha ew hemî helbest û nivîsîn û wergêr cuda cudayên Pîremêrdî ku di kovar û rojnameyan de dihatine belav kirin ji bilî li pazde ji marên kovara "Jîn" nebit ewên din nemayne berdest, ew wergêrên tirkî û farsî zor zehemet emê bi bînin, hebûna Pîremêrdî mîna kesekê helbestvan û edîb û rojnamenivîsekê weha di mawê bîst pênc salan dinav cîhaneka şaristanî di stenbolê de ew bi xo xwedî pertûkeka serixwe yan jî diyuanên helbestaye, li virde bo me diyar dibit ku em ta niha li beşekê giring li jiyana vê edîbê welatê xwe nizanîn.

Hacî Tewfîq ne bi tinê di aliyê rojnamegeryê xebitî ye ji xeyrî wê dema ku li sulêmanyê bû ji aliyê zansitî û çavkanyasê de jî xebitan pêk hatinî, (Pîremêrd endamê komeleka bi navê "Zansitî" bû, paşî bû skirtêrê vê komelê û dîsa bû serokê vê komelê û bi salên dirêj ve serokatya vê komelê kir)¹¹⁰.

Bo cara ewl digel belav kirina helbesta (beyanî bû le xew hestam befir baryue)da li jimare (312)ê ronama "jiyan"de sala 1932ê navî xwe li (Hacî Tewfîq Beg)î ve gohrî bo Pîremêrd, eger em bi hurî li babetên rojnama "jiyan" binêhrîn bi taybetî her jimara pêşyê heta diwayî jimara rojnama (jiyan) ku jimare (553)bû li (10)marsa 1938ê derket, behira pitir berhem û pênivîsê Pîremêrdî bi xoye, bi taybetî sere wtar û

*. Ev Kovare Li Sala 1918-1919î De Li Stembolê Bi Kurdî û Tirkî Derdiket, Berêz (Mihemed Emîn Boz Erselan) Dilsozê Kurdistanî Tirkya, Hemî Jimareên Wê Wergêrayne Ser Tîpên Latînî û Çap Kirîne .

¹⁰⁹. Umêd Aşina, *Pîremêrd û Pêdaçûneweyekî Niwêy Jiyan û Berhemekanî*, r. 54-55 .

¹¹⁰. Amedi, B., *Kürtler Ve Kürdistan Tarîhi I*, Fîrat Dicle Yayınları, İstanbul, 1991, r,173.

pendên pêşinan û helbest û wergêrên MewlewîHwd)¹¹¹ . Li sala 1938ê de ji aliyê "Mecîd ye'qub"î ku bi regez tirk bû bi biryara wî rojnama Pîremêrdî hat girtin, belê Pîremêrdî di hewl çalakyê xwe berdewam bû û çapxaneyek bi dest îna her weha îmtiyaz jî wergirt l(26)î kanûna duwê 1939ê de li ser heman jimare zincîra (jiyan)ê re jimare (554) rojnama "Jîn"î derxist û heta jimare (1015)ê li (15)ê hizîrana 1950ê de domiye, anku em bêjn çar mehan pêş mirina wî, diwahemîn jimara rojnama xwe pêşkeş bi cîhana rojnamegerî û neweyên dahatî kir .

Çalakyên Pîremêrdî ên ku herî balkêş yek jî çalakyên ji bo newrozê, li sulêmanyê Pîremêrdî cejnên newrozê vejandibû, tiştê ku ji bo vê yekê kirye heta melîk mehmûdî jî nekiryê, dinewrozê de Pîremêrdî nêzî hezar bar dar ji aliyê girdê seywan vêk dxist û li wir de çadîran çê dikir, ji bo vî tiştî karmend û xwendîkar û bazîrgan û rewşenbîra dawet dikir û gelek mesîref dikir ji bo pîrekan jî çadîrên cuda çêdikir û ew jî dihatine wê cejnê)¹¹².

Pîremêrdî di nivsînên û helbestên xwe de gelek naznav bi karanîne, ew naz nav qasê ku me tespît kirine evin:

Sulêmanî m. Tavîk (Komela Hevkarî û Pêşketina kurd ku li stenbolê çap bûbû de), m. Tafîk (Komela Hevkarî û Pêşketina kurd li stenbolê çap bûbû de), sulêmanlî tafîk (Komela Hevkarî û Pêşketina kurd listenbolê çap bûbû de), s.ti (kovara "Jîn"ê ya ku li stebolê çap bûbû de), tafîk (kovara "Jîn"ê ya ku li stebolê çap bûbû de), pîrekurd tafîk (kovara "Jîn"ê ya ku li stebolê çap bûbû de, hacî tofîq/ hacî Tewfîq, hacî tafîk, hacî tofîq Beg, Pîremêrd, bênav, bîsaranî, cêşaneyî, debaşanî, ebidul wefa, ebidul wefay kurdî, gurgederî, kesnezan, kunemasî, kiwêxe remezanî wurimiziyarî, mecizub, melay heyasî, pîrweysî xelk, qember 'Elî, qere tûxan, şêx ebidul wefa, şîrî ezîzî, tazedyuane, welî diyuane. Xak xolî, zergeteyî)¹¹³.

Pîremêrd jî bilî karê rojnamegeryê gelek berhemên din hene, berhemên wî evin:

1. Ruha mewlewî dû cilt, li sala 1935 li Weş xwe çap kirîne, metinên hewramî navê wê kirye (Esil) li hember zivrandî ye ser devoka sulêmanyê navê wê jî kirye (Roh) bi ramana roha mewlewî dihêt.
2. Mem û zîn, ku çîrokeka tirajîdî dildarye, ewe çîrok li şêweyê şanonamê de amade kirye ji hemî aliyekî li mem û zîna Ehmedê Xanî ya cudaye.
3. Diwazde siwarê merîwan 1935 nivêsandî ye.
4. Çîroka mehmûd axayê şîveklî 1942 nivêsand ye.
5. Galte û gep yan jî tirane pêkirin, 1947ê nivîsye li hinek rudanên xoşê nav komela kurdewarî, hem ji bo pêkenîne hem bo pende.
6. Romana kemaçe jen, li sala 1942 li tirkyê zivrandî ye ser zimanê kurdî.
7. Diyuana mewlana xalîdê neqşebendî – ku bi çend caran li rojnama xwe de belav kirye.

¹¹¹. Umêd Aşina, b.n.b, r.58.

¹¹². Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, b.n.b, r.128.

¹¹³. Malmîsanîj, *Kürt Teavûn Ve Terakî Cemiyeti*, Ve Gazetesî, r.69-71.

8. Helbestên welî dîwana bêsarani li hewramî kirîne ser şêwe zarî sulêmanyê.
9. Çendîn pexşanên hunerî nivîsîne.
10. Çend wtar derbarê dîroka kurda û mêrnşîna baban û xêl û tîrên cafa nivîsye.
11. Hezaran beytên şîrî pendên pişînan hene ku kakê felah hemî kukirîne û çap kirîne.
12. Çendîn bend û beytên foliklorî û çîrokên zarokan û metel ku evejî dibît bi pertûkek)¹¹⁴.
13. Sanatkar "Dünyayı Gezen Bir" ji elmanî zivrandî ye tirkî û tirkî zivrandî ye kurdî.
14. "Kürüt Darbı Meslleri" jimare van gotinên pêşiyar geştiye 4800)¹¹⁵.

Li roja 19ê hizîranê sala 1950ê mîladî de li sulêmanyê bi nexoşya sukerî (şekire) û gurçîlan ve li temenê heştê û sê saliyê de wexera dûmahyê diket û li ser wesyeta wî li girê "Mameyare" li sulêmanyê dihête veşartin)¹¹⁶ . *

4.2. Seîdê Kurdî: (1873-1960):

Di sed sala bîstan de yek ji rewşenbîrên kurdan Seîdê kurdî bû, Seîdê kurdî jiyana xwe wek Seîdê berê Seîdê nû kirye dû beş, di dema Seîdê berê de, bi mijarên siyasî û civakî ku 'alema îslamê û kurdan têkelîdar dike re gelek mijul bûye, lê dema Seîdê nû de înkîlabeke derûnî jiyaye û wextê gişt xizimeta qur'anî kirye.

Seîdê kurdî hem bi navê Seîdê kurdî û hem jî bi navê Bediyuzeman Seîdê nûrsî dihête nasîn, Bediyuzeman Seîdê nûrsî, rûmî di sala 1873an li gundê nûrsî hate dunyayê, gundê nûrsî girêdayê nehya îsparrîte ye û ew nahye jî girêdayê qeza hîzanê ku ev qeza jî qezayeka bilîsê ye, navê bavê wî mîrze û navê daya wî jî nûrî ye, Heta neh salyê li cem bavê xwe xwandye, paş neh salyê ji bo medresê bixune çû gund taxê û li cem mela Mehmed Emîn dest bi xwandinê kirye, li Kurdistanê di mediresan de xwandiyê tabî Seîdayan nebûn, Seîda tabî feqyan bûn, anku feqî kêjan Seîdayê û medireseyê helbjartba ew dikarbû li wê derê bixwîn in. Ji ber vê yekê û ji ber qerekerîta xwe ya eşîk û dij rabû Seîdê kurdî tu medireseyekê de nekarî ji bo wextekî dirêj bisekine, Seîdê kurdî di gelek medireseyên Kurdistanê de xwendin, lê dawyê de çû bayezîdê)¹¹⁷ .

¹¹⁴. Umêd Aşina, b.n.b, r. 62.

¹¹⁵. Mihemet Emîn Zekî Beg, *Kürt Ve Kürdistan Ünlüleri*, Apec Ve Öz-Ge Yayınları, İkinci Basım, Sweden, 1998, r.172.

¹¹⁶. Umêd Aşina, b.n.b, r. 50-51 .

*. Ji Bo Zanyaryên Zêdetir Li Ser Jiyana û Berhemên Pîremêrdî Hun Dikarin Li Pertûka (Mehemed Resûl Hewar)Î De Li Jêr Navê "Pîremêrdê Nemir" Binêhrin Kud Sala 1960an De Li Bexdayê Çap Bûye, Di Wirde Gelek Bi Hurî Derheq Jiyana Pîremêrd û Nivîsînên Wî De Gelek Baş û Hêja Nivîsîne .

¹¹⁷. Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, b.n.b, r.152.

Li bayezîdê bi şêx muhemed celîl sê mehan ders xwandin e, lê vê tehsîla wî gelek xerîb bû, di van sê mehan de li medireseyên kurdan de pertûkên ku xwandine wan pêwîste giştî xwand û xilas kir, anko her pertûkekê de dersek an dû ders xwand û dersên dînî nedixwand, Seîdayê wî mela muhemed celîlê rewşa Seîdê kurdî ne'ecband û îtiraz kir, Seîdê kurdî ji berisva xwe ewha dibêje: Seîda evqas pertûk û dersê, ez nikarm bixwînim û fehim bikim, ez pêşî van pertûkan qala çî dîkin hîn bibim paş pertûkên ku li gor qerekitera min û ezê bixwînim, lê diyare bû ku meqseda Seîdê kurdî di usûla medireseyan de gohrînekê pêk bîne)¹¹⁸.

Seîdê kurdî tirazek nûyê ê 'lmê û dîtbû û bi wê tirazê ders di da, ev tiraza hanê jî 'lmên fenê û 'lmên dînê mezic kirin bû, ji ber ku ew dem di navbera dibistanê nku li gor rojava der di dan de reqebet nebû, Seîdê jî ji bo vê gengeşeyê çareser bike vê modelê pêş xistbû, ji bo ku bi vê modelê ev dibistan li Kurdistanê li bajara ên wan, bilîs û diyarbakirê damezrîne çû stenbolê, ew çax ji bo kuvê vê pêşnûma medireseya xwe bi bîhsîne di gelek rojname û kovaran de gotaran weşandin, em dê li jêrê derheqê van gotaran de agehî bidin.

Dema ku Seîdê kurdî çû bo stenbolê hindê kesan wî wek dîwana nîşan dan, li ser vê yekê Evdilla Cewdet ji bo Seîdê kurdî çarînek nivîsye ku li gor min hêjaye ku em wê li vir binivîsîn:

Di serê minê dîn de agirê fikirên mezin

Di serê minê dîn de heye zekayek mezin

Ji dînê(mecnûn) min re rêber tîrêjê ulivyetê

Benda dînê (mecnûn) mine niyeteke mezin¹¹⁹

Seîdê nûrsî dema ku li stenbolê bû, ji bo zanîne li Kurdistanê belav bike pêşnûmeke mezin bi navê "Mediresetu'zi – Zehra"ye pêşkeşê hikumetê, ji ber vê pêşnûmayê pêş ket tîmarxaneyê û kete girtîgehê, lê peştê Sultan 'Ebidulhemîdê duwem Sultan Reşat hat, ew jî li ser text ji bo pêşnûmaya Seîdê kurdî pêştaçûnekê pêk hat, ew jî ew bû, hikûmet ji bo ku li kosovayê zanîngehekê veke hin amade kirbû, lê belê vê pirojê hê pêk nehatbû ku koseva di destê wana derket, ev parê hanê ev care ji bo zanîngeha "Mediresetu'zi – Zehra" hat tehsîs kirin, paşê Seîdê kurdî çû Kurdistanê ji bo zanîngehê xebitî, lê mxabin ew dem herba cîhana ya yekemîn dest pê kir û ev piroje di nivîs de ma .

Dema herba yekemîna cîhanê Seîdê kurdî jî wekî qumandanê hêzên dike ên kurdan dinav artêşa dewleta osmanya de wezîfe helda û li hemberê 'rusa şer dikir, li ê belê Seîdê kurdî divê herbê de dihête hêsîr kirin, nêzîkî sê salan li bajarê 'rusa ku bi navê kostûrmayê hêsîr hat girtin, paşê Seîdê kurdî fîrar kir û hat stenbolê, dema vê cara duyem hate li stenbolê dîsa dinav tevgerên civakî û siyasî de ce girt, ji ber bihête

¹¹⁸. Nursî. B., S., *Îçtîma*, Î Derisler, r.588.

¹¹⁹. Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, b.n.b, r.152.

dinav van tevgeran Seîdê kurdî li hemberî înglîzan de jî ce girt, ji ber vê yekê dema komara tirkîyê ava bû, Seîdê kurdî ji aliyê kemal Paşay û hevalên wî de'wata enqerê kir bûn, li wê derê ji mebûsan re axiftinekê kir, dîsa ew armanca ku wî hebûn wek armanca jiyana xwe aşkira kirbû ku ev jî mediresa zehraye li wir jî hanî li ser ziman, ji bo vê yekê tehsîs jî hilda, lê belê e dem komara tirkîyê biryara girtina medireseyan derkir û ev care jî dîsa vê pêngava mediresa zuhrayê bê encam ma.

Di sala 1922ê Seîdê kurdî hat wanê di wê derê de biryara înzîyuyayê derkir hikumetê li hemberî vê biryara Seîdî înqlabeke ruhî ku li stenbolê jiyabû ev biryare dabû û kişyabu çiya ên 'êraqê, Seîdê kurdî mişext bû sî û pênc salan dema mişext bûy bi navê rîsale _î nûr ve sed û sê parçe pirtûk weşandin, ev berhemên, berhemên dînî bûn û bûn bîngêhî li qenata nûrçîtyê, Seîdê kurdî berhemên xwe de dibêje ku ev rîsalên nûr dê bibe bîngêha mediresa zehrayê ango di mediresa zehrayê de ev berhemên dê bîngêha millê dînê teşkîl bike)¹²⁰ .

Mediresa zehra û perwedehya di zimanê zikmakî de Seîdî kurdî ji bo ku perwerdehî di nav gelê kurd de bilav bibe dû piroje pêş xistiye, ya yekem li Kurdistanê hin dibistan di dema Evdilhêmîdê duyem û dema "partiya yeketî Pêşketinê" de hatbûn ava kirin, lê belê zimanê perwerdeya wan dibistan tirkî bû û ên ku li Kurdistanê dijîn zimanê tirkî nedizanî, Seîdê kurdî jibo çareserkirina vê pîrîsgîrê ji dewletê dixwast ziman û perwerdehya van dibistanan bibe kurdî, ji bo vê yekê jî rojnameya Rojhelat û Kurdistanê de bi ser nivîsa "kurd dîsa muhtacin" û di rojnameya Hevkarî û Pêşketina kurd di ser nivîsa "kurd muhtacin" di behsa vê yekî kirye .

Piroja Seîdê kurdî ji bo avakirina zanîngehek li Kurdistanê ye derbarê vê zanîngehê de em dikarin berhema wî bi navê "munazarat"ê de agehî baştir bigerin, li virde em dikarin bêjîn ku ev zanîngeh dê bi navê mediresê ve çêbûye, sê zimanan ve dê perwerde bi daba û hem 'lmên dînê û hem bi 'lmên fenî dê di vê zanîngehê de bihate dayîn, sê ziman ku dê bibiye zimanê mediresetu'zi – zehrayê jî 'erebî û kurdî û tirkî bû, Seîdê kurdî ji bo zimanê zanîngehê ewha dibêje: 'erebî wacê, kurdî cayz, tirkî jî lazim kirin.

Em dikarin ji bo fikirên Seîdê kurdî derbarê perwerdeya kurdan de bêjîn ku Seîdê kurdî perwerdehya ewl bi zimanê kurdî û perwerdeya bilind ku ji bo wê niha em saziyên zanîngehê bi kar tînin jî 'erebî, kurdî cayz û tirkî jî lazim dîtiye .

Di dawyê de me berhemên Seîdê kurdî binbîsn, ev berhemên di bin navê "kurlliyata rîsaleyê nûr hatiye komkirin, lê belê hin berhemên wî ên ku dema Seîdê berê de hatiye nivîsîn ne di nav vê kulliyatê de ne, biqasî (130) pertûkên wî ên dînî hene, lê ev berhemên jî di bin bi navê "Îçitîmî derisler" hatiye komkirin, berhemên Seîdê kurdî evin" Mesnevî _ nûrye, mekitubat, kastamonû lahikası, lem'alar, îşaratü'l,I caz, sözlar, barla lahikası, içitmai derisler, Zülfikar Mecmuası Hwd"

¹²⁰. Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, b.n.b, r.154.

4.3. Sureyya Bedirxan: (1883-1938):

Sureyya Bedirxan sernivîser û xwedî îmtiyaza rojnama Kurdistan li qahîre (1917-1918), bi ser nivîsera sêyemîn rojnama "Kurdistan" dihête niyasîn, derbarê vê rojname yê di jimara pêşîn a rojnama Kurdistan (15 zuliqa'de 1335/12 eylon 1917) a Sureyya Bedirxan bi naz navê (Pseudonyme) azîz ehmed, li qahîre derxistibû de, agehyek heye di jimare pêşîn a rojnameya "Kurdistan"ê (15 zuliqa'de 1335/12 eylon 1917)ê de, dinvîserê bi navê "Ê Me Dixwînin" (En Ku Me Dixwînin) de hatiye nivîsîn)¹²¹ .

Sureyya Bedirxan ji bilî zimanê xwe zimanê 'erebî û farsî û tirkî dizanî her weha zimanê rojavayê ferinisî û îngilîzî jî zanî ye, xwedî kelturê kurdî ye bandora keltur û şaristanyeta ferensa yê bi awayekê aşkira bi ser nivîsîn û berhemên wê di diyarin.

Sureyya Bedirxan ji bilî navê xwe bi dû îmza û naznavê din di berhemên xwe de belav kirîne: "Azîz Ehmed" û "dr. Bileç şêrko", em dikarin bi bêjn ku Sureyya Bedirxan take ronakbîre ku digel bira ên xwe Bedirxanya ku ensîklopîdiyay îslam di her dû çapên îngilîzî û ferensîya xwe de bahis kirbît, û êk bû ji wan endamên ku rêxirawe "Xoybûn" li qahîre disala 1921ê de damezrand)¹²².

Sureyya Bedirxan bi dirêjahya salê, (1908-1938) hemû temenê gencatya xwe li der bi derî û mişexbûn û xerbiyê de derbaz kirye: Stenbol û Qahîre û Heleb û Dîmeşiq û Beyrut û 'Uman û Ferinsa û Emirîka û Îtalya û Biroksil û Birîtanya Qubiris û..... Geleg bajêrên din jiyaye.

Di her êk jivan şaran de jiyaye û her ya berdewam bû ji xebat û têkuşan û nasandina kêşa kurdan bi cîhanê bi taybetî bi welatên rojavayî ji ber vê behira pitir behem û pertûkên xwe bi zimanê îngilîzî û ferensî hatine nivîsîn.

Di dawya salên (5-6) jiyana xwe li bajarê parîs de terxan kir bû cihê jiyana xwe çunkî parîs 1930 wekî dilê ewropa bî û her ji parîs çû ber dilovanya xudê)¹²³, hinek ji pertûkên wê yê çapkirî berçav dikeyn:

1. Dr. Bilecih Cihirguh: La Question Kurde, Le caire:1930.
2. Mehmed 'Elî 'Ewnî ev pertûke zivrandî ye 'erebî binavê (Elqeziye Elkurdî ye) li qahîre disala 1930ê de çap û belav kirye, dîsa ji aliyê heme baqî jî ve wergêraye ser zimanê kurdî, çapê sêyem, 1992.
3. Le Pirine Sureyya Badir- Khin: La Literature Populair Et Classique: Kurde, Biruxelle, 1936.

¹²¹. Malmîsanij û M. Lewendî, *Li Kurdistana Bakur û Li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1992)*, r.43.

¹²². Ferhad Pîrbal, *Çend Basêk Lebarey Mêjûy Rojnamenusîy Kurdiyewe*, r.45 .

¹²³. Ji Bo Zanyarê Zêdetir Ku Bi Şêweyekê Ber Fireh Behsa Jiyana Sureyya Bedirxan Kirye, Ji Vê Çavkanyê Bnr.: Malmîsanje: Bedirxanî û Cizîre Botan, Terceme La 'Erebî Ye: Şkur Mistefa, *Metbe'e Wezareta El Seqafe*, Erbîl, 1998, r.82-100 .

4. (Adibiyata Millî û Klasîkî Kurdî) li pazdehemîn kongireya nîv dewletî derheqê entirolojiya, li biroksil hate xwandin.
5. La Femme Kurde et Son rola social Biruxelle, 1936.
6. (Afireta Kurd û Rolên Komelayetên wê) li pazdehemîn kongireya nîv dewletî derheqê entirolojiya, li biroksil hate xwandin.
7. Mam- û - Zin. Biruxelle, 1937 .
8. (Mem û Zîn têksit û mijar) di heman kongireyê de hatiye xwandin.
9. Cites et Cihampagne du. Kurdistan, Biruxelle, 1936.
10. (Deşt û Şaxên Kurdistanê) di heman kongireyê de hatiye xwandin.
11. The Case of Kurdistan Against turkey by qutoritiy of Hoy-boon.....1928.Her weha çendîn kitêb ên din û dest nivîs ku ta niha çap nekirîne)¹²⁴.

4.4. Xelîl Xeyalî:

Xelîl Xeyalî efendî kurê Yusuf Axay ye, ku ew ji 'eşîreta modanê ye navçeya mûtîki ya nav sînûrên bajarê bilîsê ye, derbarê sala dayk bûna wî de agehyek teqas tune, lê belê îhtîmalyeka mezin 1848an û jî disala 1950an hatiye dunya yê li gundê zendera navçeya mûtîki ji dayk buye, Xelîl Xeyalî xwendina xwe ya ewl li bilîs mehale mekîtebî xwendîye, dersên serf û nehu û bedî' û li medireseyan tehsîl kirye, paşî jî ber ku wî wextê stembol navenda zanîne bû ji bo zanîngehê bxuynî çûye stembolê, (di hin sazîyên dewleta osmanya wezîfe heldaye bûye karmendê muhasebe ya "halkal zira`at mekîteb" wezîf hijmareya rêya kirye)¹²⁵, di salên 1900an de Xelîl Xeyalî jî ciwanên wek Qedirî Cemîl Paşa, Ekirem Cemîl Paşa, Kamiran û Celadet Bedirxan re hembêza xwe vekirye û wî jî bo ew serkevin gelek zehmet kêşa ye.

Xelîl Xeyalî di aliyê welatparêziyê de mîna kesekê başe dema meşîrûtiyet hate î'lan kirin û hin tevgerên kurdan li stembolê dest pê kir, dinav wan tevgeran de wek pîrî rewşenbîrên kurd di wî demî Xelîl Xeyalî jî rolekî baş hebû, Komela Hevkarî û Pêşketina kurd piştî î'lan kirina meşîrûtiyetê, Di tarîxa 19-9-1908an de avarkirin Xelîl Xeyalî êk bû ji sazîryên here çalakê wê komelê)¹²⁶, nivîskar û civaknas û dîrokzan kurd Xelîl Xeyalî bû ye, wî kurdîzade Ehmed Ramiz û Cemîl Ehmed di dunyaya komelê de çapxaneyek û jî bo zarokên kurdan û dibistanek jî vekirye, ji bilî wan jî kovarek bi navê "Kurdistan" û rojnameyek bi navê "Hevkarî Pêşketina kurd" derxistine)¹²⁷, lê derbarê kovara bi navê "Kurdistan" ve derketiye de tu agehyê me tune ye.

¹²⁴. Ferhad Pîrbal, *Çend Basêk Lebarey Mêjûy Rojnamenûşîy Kurdiyewe*, r.46-47.

¹²⁵. Malmisanîj, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir'de Kürt Ulusçuluğu*, Weş Vateyî, Istanbul, 2010, r. 126.

¹²⁶. Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, b.n.b, r.146.

¹²⁷. Bozarselan, M., E., *Kovara Jîn, Tirkî- Kurdî, Turkiçe -Kurtiçe Dergî (1918-1919)*, Silt: 1,2,3,4,5, Weş Deng, Uppsala, Swden, 1985,r.20.

Nivîsînên Xelîl Xeyalî di "hetawî kurd"de di jimareyên 1.2.3 yanên rojnameya hetawî kurd de, bi navê M. X. nivîsni xwe nivîsye, di jimara (10)an de navê "Bavê Naco" danye dawya nivîsa xwe di jimarên dî de bi kîj navî çî nivîsye bi destê meneket .

Navê nivîsên wî yên di jimara (1)ê de ji mezinên kurdan raye û "şayrê baban û soran"e, di jimare (2)yan de bi navê "fete'bîr û wya ulîl elbab" gutarek wî heye û navê xwe jî li dawya wê "Bavê Naco" danye, di heman jimarê de nivîsa wîya "derdê kurda" heye û navê xwe weke "M. X." danye, di jimara (3)yan de navê nivîsa wî bi ser navê "Tahirê Mewlewî" nivîseke wî heye.

Di nivîsa xweya jimara (1)de piştî ku geleg gilî û gazinde ji şêx û axa û mealiyên kurdan dike, dora qisedanê tîne ser vê mijraê (sê sed sal berî niha şirefxanê bedlîsî tarîxek ji bo kurdan nivîsye ew tarîx tercume ê bi zimanê îngîlîz û elman û ferensî bûye, hêja bi zimanê kurdan tercume nebûye)¹²⁸, di pey vê gazinê de êca li ba xwe gilyê gel dike û dibêje "bi ziman xo naxun in pêş bi zimanê xo nakin zimanê me diçavê me bê fûde)¹²⁹.

Em van dibînin û îbiret nagirin, çima em wekî hemî neteweyên din naxunin û naxebitin bi hev nakin yek dil yek dest nabin? Herkî bixebite û mirov bi mirov bi guherîne ew serdest dibe, ne xudê teala gotiye: leyse lîl însanî ma se'a. (Ji mirovan re jxeynî xebata wan, tiştêkî dî tuneye)¹³⁰

Elîfbaya Xelîl Xeyalî:

Di dîroka zimanê kurdî de, kesê ku cara ewl î pîtên elfabeya erebî, ji bo kurdî elîfba amade kirye ewe ji xeynê zaravayê zazakî ji kurmançî yê kurdî, bi tirkî û farsî û 'erebî û firensî zanbûye, çawa ku wî elîfabeya herî ewela zimanê kurdî ku tê zanîn, elîfbaya kurmançî çê kirye, (tê zanîn ku wî nehwa kurdî û qamûsa wî jî amade kirye, tevî van ew nixên û yên kurdî ku Weş nasnav kurdî de derketine, di nav mînakên ewlên nivîsa pexşanîya zaravayê kurmançî de tîne hespandind. Ew yek ji wan kesên pêşî ye ku ji tirkî zivrandî ye kurd yê)¹³¹.

Li ser birga berhemê wî weha hatiye nivîsandin, elîfbayê kurmançî, muherîr Xelîl Xeyalî mûtkî, tab' Kurdîzade Ehmed Ramîz, sal 1909, di diwaya pertûka wî de weha hatiye nivîsandin, (rica, bihayê vê ji bo teb'kirina ku tu bê kurmançane, li pey vê qiraet û serf û nehwa zimanê kurmançî jî dê teb' bibe, feqet em muhtacî arîkirinê ne, bê arîkirin tiştêk nabe, hîvya me xeyret û ciwanimêriya kurmançane, meqседа me ji

¹²⁸. M. X. "Ji Mezinê Kurdan Ra Ye" *Hetawî Kurd* Stanbol, J 1, 1909, r. 20.

¹²⁹. M.X.b.n.b, r. 20

¹³¹. Mihemet Bayrak, *Açık-Gizli, Resmi-Gayriresmi, Kurdoloji Belgeleri*, Öz-Ge Yayınları, Ankara, 1994, r. 491.

zarokê kurmancan ra nîşandayna 'lim û hunerêye, ketebehu mûsa ezimî el kurdî, temmet, 1325)¹³².

Hin nivîsîn Xelîl Xeyalî di "Kurd Teawun we Tereqqî" gazetesi" de gava ku kurdên ronakbîrên serdema dawîya osmanî yan binavê kurd t'awn û tereqqî cem'yet komeleyekê ava dikin û bi vê navî kovarekê diweşînin, Xelîl Xeyalî jî dibe yekî ji wan kesan ku bi nivîsên xwe, reng û rûyekî xweş dde kovarê, di hejimara wêya(18)an de, behsa zimanê kurdî, whadike, (şerefa kurmancî muhefeze bikin)¹³³.

Rojî kurd û zimanparêziya mamosta Xelîl Xeyalî, demê ku rewşenbîrên aso firehên malmezînen welêt, bi navê "Cemyeta Hîvî" komelekê ava dikin Xelîl Xeyalî jî dibe yek jixebatkaran cem'yeta hîvî biryar di de ku binavê rojî kurd, ku kovarekê derdxe, Xelîl Xeyalî jî bi nivîsên xwe ên nû parêz û şewq û ronahya kovarê zêde dike, gelek balkêş ev kovar bi turkya osmanya û bi kurdî bi şewe zarê kurmancya xwarê der diket, Xelîl Xeyalî hemî nivîsên xwe bi kurmancî nivîsîne, li gor agehyên xelkî Xelîl Xeyalî kurdekî dimilyê herêma hewlêrye gelek zêde ciyê mereqêye ku wî qet bi kurdiya wan nenivîsye .

Em di kovara komeleya "Rojî Kurd" de rastî ya nivîsîna wî tèn ku wî bi xwe na vê xwe, modanî X. nivîsye, navê nivîsê "ziman û nezanya kurdan"e peyva ziman di nivîsînên wî de gelek balkêşe, em dibînîn ku Xelîl Xeyalî di destipêkê de jiber ku mealiyên mediresan de demê tiştêkî dinivîsn , wan behira pitir bi zimanê 'erebî û farsî û tirkî dinivîsn, wan rexne dike ev gelfî û gazindeyên wî li cor bi corên gel, helbet bi tena serîxwe bûyereke mezine û li gor şert û mercên wê hingê nekarekî biçûke ev xîret kêşa welatparêzî û neteweperweriya wî ye, di heman nivîsê de kula dilê xwe di der û yekser hîna wê hingê bala xwendevanan dikşîne ser "perwedehya bi zimanê maderî", çira ku îro di dunyayê çendîn millet hene ku em yekê baş û qenc nas nakin ku hed hesabê wî nîne bi zimanê xwe dixunin û dinivîsn û kitêban çê diken mediresên xwe de fêrî zarokê dikin)¹³⁴.

Xelîl Xeyalî divan nêrînande berê me di dete hedîseka şerîf ku tehsîla 'lim li ser hemî musulmanan û mêr û pîrek feriz kirye, (bi ser de jî nezanyê weke bealiyekê dîtiye û di nav 'alemê de, şertekî hebûna milletan bi wê yekê ve girê daye ku ji nezanîne bibin, divê hêlê de, ji ber ku berhemên xweyên li ser doza kurdan nivîsîne, pesinê Şêx 'Ubeydula Nehrî û Şêx Ehmedê Kakeyî û Şêx Firsafî Daye)¹³⁵, di heman jimara kovara de nivîsîneka mamoste Xelîl Xeyalî bi navê " ji rojnaweyê sebîlu reşad vekirî bû ye hedîsa şerîf heye ku helbesteke Mihemed Akîf Ersoy, ji zimanê tirkî zivrandî ye kurmancye ev nivîsîna wî gelek girînge, ji ber ku bi êk ji xebatên dîroka kurd ye.

¹³².Mihemet Bayrak, b.n.b, r.505.

¹³³. Ji Eşîra Mûtîkî Xelîl Xeyalî, "Kurdçe Lîsanimiz, Weten û Îttîfaqa Kurmanca" *Kurd Teawun We Tereqqî Xezetesî*, No. 8, 1 Muherrrem Stenbol, 1329 [1909], r. 69-71

¹³⁴. Modanî X, "Ziman û Nezaniya Kurdan" *Rojî Kurd*, Stenbol, 1913, J 2, Weş War, 2002, r. 67.

¹³⁵. Modanî X, b.n.b., r. 68.

Zêde barî van gilyu gazinan de, mamoste Xelîl Xeyalî ketiye coş û peroş û dest bi dawyê kirye, peyre van daxwazên dîrokî ku li gor sed sal berî niha, têra xwe moderinin diyar dike:

1. Ji bo xwendin nivîsandinê, hîref.
2. Ser terzeke nû elîfbayek.
3. Ji bo zanîna temamê zimanê kurdîyê qamûsek.
4. Îlmîhalek.
5. Tarîxê bav û kalê kurdan û "an" aneyê wan.
6. Welatê kurdan û adet û teb'ê wan û mîqdar û navê 'eşîran.
7. Kitêba hîsabê.
8. Ji bo zimanê kurdan serf û nehwek.
9. Tercumeya hala mezinê di kurdan.

Edebiyata kurdan û navê helbest vanên wan, ji bo çêkirina van tiştan çiqas pertûkên kurdî hene lazime wan bişînin ji dengibêjan lawjek û çîrok û qewlê kurdan pîris bikin û binivîsn û rê kin)¹³⁶.

Heke em aşkira bikin ku di dîroka edeba kurdî de kesê ku cara yekem behsa van karu barên mezinên li ser xebatên zansitî ziman û edebiyata kurdî dike, Xelîl Xeyalî ye, dibe ku munaqeşeke rast be, em dikarin bi dilekê rehet bi vê nivîsna mamostay ser bilind bîn ku bo cara yekemîn wî bi xwe di nivîsa xwe de behsa pêwîstiya xebatên bi vê rengî kirye, helbet di rojnameya "Kurdistan 22ê nîsan 1898" de behsa girîngiya foliklora kurdî hatiye kirin, ji nedîtî ve nayên.

Em ji van tesbîtên jor hîn dibin ku hîna wê hingê, hay û baya mamoste Xelîl Xeyalî, ji van şaxên zansitê hebûye:

1. Zanista ziman.
2. Zanista gel, anko foliklor.
3. Antolojî.

Îca gave em berê xwe di din nivîseke wî ya dî ku di heman hejimarê de hatiye em dibînin ku ji mem û zîna Ehmedê Xanî, beşek helbest girtiye û behsa Elî Herîrî û Mealiyê Cizîrî dike:

(ev mîsala aliyê herîrî ye neh sed û sî sal berî niha hatiye nivîsandin bi zimanê kurd beyt gotiye)¹³⁷.

Komela xwendekarên kurd hêvî dtarîxa 27/7/1912an de li stenbolê hatiye saz kirin, sazkiryê wê Cemîl Paşa "amed" û Umer Cemîl Paşa "Amed" û fwad Temo "wan" û Cerhizade Zekî "Amed" bûn, dr. Şukîrî Mihemed hevîriya wan kirye)¹³⁸, dema em wan sazkiryên vê komelê dinêhrîn em dibînin ev sazkiran hemû ji bin destê mamoste

¹³⁶. M. X, "Ziman" *Rojî Kurd*, Stenbol, 1913, J 2, Çapa Weş War, (2002), r. 88.

¹³⁷. M. X, b.n.b, r.94 .

¹³⁸. Bozarselan, M., *E., Kovara Jîn, Tirkî- Kurdî, Turkiçe -Kurtiçe Dergî (1918-1919), Silt: 1,2,3,4,5, r.21.*

Xelîl Xeyalî de derbas kirye bûyne. Ji ber ku dema mamostay li mekiteba halkalî ya zîreatê dixebitî, wî ciwan li dendorê kom dikirin û ew bi wan re derheqê welatparêziyê de di axfit û şîret di dan wana, dema ku em Rojî kurd ku organek Komela xwendekarên kurd hêvî ye, dinêhrin em di wir de gelek nivîsên Xelîl Xeyalî dibînin, ew nivîsên wî evin (pîrozname modanî, ziman û nezanya kurdan, modanî x, ji derdê me dubendî - x, ziman m-x, bext reşî û mehrumya kurdan m-x, ra -m.-x., gelî û gazan m.-x.)¹³⁹ .

Derbarê Xelîl Xeyalî de Qedirî Cemîl Paşa weha dibêje: *bi rastî ez divê berê mirovekî ku li stenbol ji xwendekarên kurd re mamostayetî kirye û bi xwe jî mirovekî xwedî hişmet û ferset û kurdek gelek mezin de di çend gotinan bêjim: ev mirov Xelîl Xeyalî motkî bege, welat parêz û rewşenbîrekî jêhatî bû, me ciwanan vî şexisî di sala 1909an de li stenbolê nas kir, ew jax temenê wî der dorê pêncî salî bû, rojên înyê li çapxana diyarbekir kirathinas ya divanyoluyê, me dicivan li ser dîroka Kurdistanê û li ser dost û dujîmnatya kurdan gelek tiştan ve digot, dawya suhbetên wî yên zewqek û kelecanyekê bê dawî guhdar dikir û me gelek tiştan jê hîn dibûn, ev şexisê hanê li stenbolî qasê 20 salan mamostayetî kirye, lê tu car jî nekarye, dema ku ez di sala 1928an de ji girtîgeha kastamo nûyê de derketim çend caran çûme dîtin ya wî, hema hema qasê dûsalan di nav ce dabû ye, wextê ku ez di sala 1929an de li stenbolê qetiyam ev mirovê mezin û qedir bilind zêdetir nexweş ketbû*¹⁴⁰ .

Bi rastî ji ber ku Kurdistan di kana xwe de rastê cewherekê ew ha hatiye, hîvî heye ku gelek cewherên wekî wî paşeroja me ronahî bikin, vê zatê di mijara hemiyetê de mînakekê layeqê şopê ye û ew bingehe zimanê meyê netewî û havêtiye, ez ji hîlê hemiyetê re şopandina rêya wî û li ser bingeha ku wî de derbarê ziman û de havêtiye tamam kirine, şîret dikim)¹⁴¹ .

Yek ji nivîskarên "Jîn"ê yên timî Xelîl Xeyalî bûye zana û nivîskarê mezin Xelîl Xeyalî nivîsarên xwe bi navê "kurdiya bedlîsî" nivîsîne di wan nivîsyên xwe gelek gele şolên dîrokî, mîtolojîk, civakî, zimanizanî û felsefî girtine dest xwe û bi awayekê zanyarî ew tehlîl kirine, nivîsnên Xelîl Xeyalî behira pitir bi zimanê tirkî ne)¹⁴² .

Derbarê berhemê mamoste Xelîl Xeyalî de di rojname û kovarên wî demî de gelek û nivîs û agehînin, lê belê ji xeyrî nivîsnên wî yên ku di rojname û kovaran de derketine de destê me de tinê berhema wî ya bi navê "elfibêya kurmancî" heye, di rûpelên dawîtirîna vê pertûkê de ewha hatiye nivîsîn " rica, bihayê vê ji bo teb' kirina pertûka kurmancane li dîf vê nehwe zimanê kurmancî jî dê teb' bi be feqet em

¹³⁹. Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, b.n.b, r.147.

¹⁴⁰. Nado Kenanê, *Di Mirovan De Mora Qederê Ziman E*, Ko Pêngavê, J 2, r.5 .

¹⁴¹. Nursî. B., S., *Îçtîma, Î Derisler, Zehra, Yayincilik*, Îstenbul, 2009.r.191.

¹⁴². Bozarselan, M., E., *Kovara Jîn, Tirkî- Kurdî, Turkiye -Kurtçe Dergî (1918-1919), Silt: 1,2,3,4,5, r.8.*

muhtacê arîkarînê ne, bê arîkirin tiştê nabe, hîvya me xîret û ciwanemêriya kurmancane, meqseda me ji zarokê kurmancan re nîşandana rêya 'lim û hunerî ye.

Di dawyê de em dê li ser tiştê ku mûsa 'enter derheqê Xelîl Xeyalî de nivîsîne bisekinin, Mûsa 'Enter di pertûka xwe de binavê "Hatralarîmde" weha dibêje: *dema ku min Xelîl Xeyalî dît, ji ser hesabîgiriya fakûlteya daristanê teqawîd bi bû, gelekî suret nûr bû, tu çî qas bêjî çandiyar û ew qas jî xwedî ferset bû Xelîl Xeyalî çavên wî ji 'eşqa welatî diçulûn digot dixwaza min ew ji xwedê di saxya min de ez bi bînim ku milletê kurd ji van milletên stemkar xelas bûya, bi kîça xwe ya Nazîmya re dijiya nêzî çûyna xwe ya edebiyatê xebatên xwe dane min, di nav wan de belgeyên pîr giring hebûn, wekî din xebatên ziya gokalpên li ser zimanê jî hebûn .*

4.5. 'Ebidulla Cewdet: (1869- 1932):

'Ebidulla Cewdet di nav tevegerên rojnamegerya kurdî de ku di serê sed sala 20an de pêk hatbû ce girtbû, 'Ebidulla Cewdet (9)ê eylûna 1869an li navçeya bi navê erebigêr ya meletyê hate dinê, siyasetmedar û rewşenbîrê osmanî bû, di tevegerên tirkên ciwan û di tarza fikirên di dema meşîrutiyeta dîyem de bandorekî wî giring hebû, ew mekîtebên "Azîz Askerî rûştîyesi- lû "Mamurt û "Kulelî Askerî Tabîbiye" temam kir, ew wekî mirovekî dîndar hate kuştin lê belê dema mekîtebê di xwend di bin bandora meteriyalîzîma bayolojîk de ma, di sala 1889an de komelek bi navê "Komela Yeketya Osmanî" damezrand, ev komele paşê navê "Komela Hevkarî û Pêşketinê" hilda.

Disala 1894an de "Tabîbiye"yê xilas kir, di nexweşxana heyderpaşyê dest bi kar kir, ji bo demê kêr çû diyarbekirê li wir şaxa "Komela Hevkarî û Pêşketinê" vekirû (Zîya Gökîlap) xist nav vê komelê, disala 1889an de mişextê "ê "Tirabilusgarab" bû û paşî li wê derê jî 1897ê de revya parîs, dema ku di nav tirkên ciwan de dabeşbûyn pêk hat 'Ebidulla Cewdet dinava koma ehmed reza de ceh girt, di sala 1897an de çû cinêfê û li wê derê kovara organa tirkên ciwan osmanî yê derxist, wî demî bi 'ebidulhemîdî re Peymanekê pêk hînbû, li gor wê Peymanê dê 'Ebidulla Cewdet êdî nenivîsya û sultan 'ebidulhemîd jî girtiyên ku li fîzan û "ê "Tirabilusgarabîbûn berbida û dîsa sultan 'ebidulhemîd dê pera bidaba 'Ebidulla Cewdet, pey vê yekê 'Ebidulla Cewdet li sefereta wyanayê dest pê karê dekitoryê kir, disala 1903an de li ji avusuriyayê hat derxistin, derbasî cinêfê bû û dîsa dest bi derxistina rojnama osmanî kir, li wê derê jî dest bi derxistina kovara "Îctîhad"ê jî kir û bi navê "Îctîhad"ê çapxanekê jî 4/8/1904ê de damezrand)¹⁴³, her dirêa vê çapxanê komeleka pertûka bi zimanê tirkî û 'erebî ferînisî derxistin, di 30/10/1904an de bi biryara hikûmeta osmanî yê ji swîsê hat derxistin, 'Ebidulla Cewdet naçar dibit li 2/11/1904ê de diçite ferensa, hemû samanê xwe di wê çapxanê karînbû, duy mawey 12pertûk çap kirbûn, ji ferensa disala 1905ê de çapxana "Îctîhad" hînyayê qahîre û li

¹⁴³. Ferhad Pîrbal, *Çend Basêk Lebarey Mêjûy Rojnamenûsîy Kurdiyewe*, r.9.

vê derê çalakyên xwe di domand, di sala 1910 zivîrî stenbolê û di 16/6/1911 careka din dest bi derxistina "Îçtîhad"ê kir)¹⁴⁴.

Komara tirkî pertûka wî ya binavê "Dîroka Îslam"ê hat qedexe kirin piştî wî demî pertûkên wî disojn û firê didine rûbarê stenbolê li havîna 1913ê de çapxana wê jî jê distînin diben)¹⁴⁵.

'Ebidulla Cewdet disala 1914ê de piştî birina çapxana wî navê kovara xwe dikete "Îçtîhad" piştî hingî dikete "alim" dîsa dikete "aşhad" li 13/11/1915ê de dawî hijmara "Îçtîhad", ku dibine (127) jimare)*.

Ev çapxana "Îçtîhad" rolekê here giring gêra di dîroka çapemenya kurdî de çendîn pertûk li barê edeb û kelturê kurdan bi zimanê tirkî osmanî bi çap gehandîne, her weha çendîn rojname û kovar kurdî û ên din çî b zimanî kurdî û tirkî divê çapxanê de derketine.

Em dikarin tevgerên kurdewarî ên 'Ebidulla Cewdet dî qonaxan de binirxînin, qonaxa yekemîn di pêşya herba cîhanê ya yekemîn de nivîs û xebatên wî yên ku di Komela xwendekarên kurd – hêvî û di nivîsên wî yên kovarên vê komelê de çap dibû, dikarin nîşandin. Qonaxa duyem jî pey herba cîhanê ya yekem ku ew çax jî dinav rêkxistinê kurdan ce girtiye.

Di qonaxa yekem de 'Ebidulla Cewdet li ser çêbûna îdolojîya kurdayete de gelek bandor bûye, bi taybetî nivîsên wî yê di "Rojî kurd" û "hetawî kurd" de derketine vê gotina me rast derdixê li ser vî yekê Celîlê Celîl weha dibêje: *'Ebidulla Cewdet di gotara "bîr hîtab"(xîtabek) de li ser wezîfa komelên kurdewarî û handana wan ji bo hînbûn û zansîte weha nivîsye: em di qonaxa avabûna netewî dijîn, li gora 'Ebidulla Cewdet jî: "netewek ku ne xwendin şexisyeta xwe be, derveyî bîrek heywanan be hişî nav nehwendî pê ve nabe tişteke" û bi vî awayî li ser disekine û dîde xuyakirin: netewa dîrokî meyandî (monoton) û sekinî nîne, ji nebateke di baxçên me de, çiyane de, darekî ku belgên xwe yên hêşin di aliyê hejîna bayê de xwar dike, ji derveyê vê tişteke nîne: bi vî awayî dozê ji gelê kurdî dike: sed sala em tê de dijîn ne hineke, sed sala 20an de, netewek ku xwediyê mêjû û rojên bîrî yên dîroka xwe nebe, xwediyê xwe nîne, netewe û kesên ne xwediyê xwe bi xwe bin dibin kole, dibin malên din 'Ebidulla Cewdet ev mesela nazk bi giring xistiye berçavên rewşenbîrên kurdan, eger me navê em diçarçova împiratoriyetê bimînin, bi çî awayî bi jî, ji bo bidanîna vê armancê çî hewceya "xwendewarî şaristanyet" di nav netewa di bête belav kirin)¹⁴⁶, 'Ebidulla Cewdet di kovara "Hetawî Kurd"ê de jî nivîseke balkêş nivîse, ev nivîs bi ser nivîsa "ji muharrîrên rojnameya hetawî kurdê re" ve derketiye, di wir de 'Ebidulla Cewdet*

144. Murat AKTAŞ-Mihemet YONAT, b.n.b, r.166.

145. Serdar Hemîd Mîran û Kerîm Şareza, *Dîwana Hacî Qadrê Koyî, Li Çapkiriyên E. G. R. L., Hewlêr, 1986, r.88-106.*

*. Ji Bo Zanyarê Zîdetir Bnr., *Ehmed 'Ebdulkerîm, Elsehafa Elîranî Ye*, Bexdad, 1972, r. 6-8.

146. Celîlê Celîl, *Jiyana Rewşenbîrî û Siyasiyan Kurdan (Di Dîwana Sedisala 19an û Destipêka Sedisala 20an De)*, r. 101 .

vê gotarê radîkal nivîsye û gotiye ku ji bo ciwanekî kurdan ji gundekî mamostatî divê ji qaymeqaymet ya an mudirtiya cihekê dinê bête tercîh kirin.

Qonaxa duyem li pey herba cîhanê ya yekem, ew çax 'Ebidulla Cewdet dinav tevgerên ekîba kovara "Jîn"ê de ce girtbû. Wek em dizanînin ev ekîb, ekîba Komela Pêşketina Kurdistanê bû, heta dema ku ekîba Komela Pêşketina Kurdistanê dibe du feliqe 'Ebidulla Cewdet dinavên ku ji bo Kurdistanê azadî dixwazin de ceh digirê, M. Emîn Borzelan ji bo vî yekî dibêje ku li ser wê qempanyayê Seîd 'Ebidulîqadir beyanek daye rojnameyan gotiye ku gelê kurd serixwebûnê naxwaze muxtaryê dixwaze, ev beyane bûye sedemê derketina dubendiyê dinava Pêşketina Kurdistanê de û di dawiyê wê dubendiyê de ev kesên han ji komelê veqetyane: 'Elî Bedirxan û Ferîd Beg û Şukirî Baban Sulêmanî û 'Ebidulla Cewdet û Kemal Fewzî Gelekê din bûn, ev kesê hanê ji vê komelê derketine, komeleka dê bi navê "Komela Vêkxistina Civakî" saz kirine, kovara "Jîn" jî geryaye rojname û bûye wê komela nû)¹⁴⁷.

Pişti wê komara tirkî hat damezrandin ev komel û rojname bi carekê hemî ji nav çûn, ev nivîser û rewşenbîre her êk jiwana beref welatekî revyan hin jiwana hatin kuştin hin jî bi naçarî li wê derê man .

¹⁴⁷. Bozarselan, M., E., *Kovara Jîn, Tirkî- Kurdî, Turkiçe -Kurtiçe Dergî (1918-1919)*, r.9-10.

BEŞA DUYEM

**ROLA ROJNAMA BİZAV DÎ PÊŞXÎSTÎNA HELBESTA KURDÎ LÎ
DEVERA BEHDÎNAN**

BEŞA DUYEM
ROLA ROJNAMA BİZAV DÎ PÊŞXÎSTÎNA HELBESTA KURDÎ LÎ
DEVERA BEHDÎNAN

1. ROJNAMA BİZAV:

Bizav û bizava peyva kurdî ya resen, bizav rojnameyeka (rojane ye _ siyasî ye _ giştî ye), dikarê rojnamegerya kurdî de diqonaxên çend salên pêşî, peyva kurdî bi awayekê giştî xo dipêrên rojname kovarên kurdî de li 'êraqê û weha xo dîtî ye ku bikarin gelek ji wan xem û kovanên di dilê xelkê kurd û hemî texa wesa dabirêjin û hêdî hêdî ew peyv ser lê bilind bin û heta salên heftê bi keşatiya bizava êketiya nivîserên kurd li tev deverên Kurdistanê 'êraqê rojname û kovarên kurdî pir xemil buye dema nivîsevan û hozanvanên pêşketî navê wane xo dipêrên xemlayî de xuya dibin.

Ji bo cara êkê hizra derketina vê rojnamê weku livîneka salane li devera behdînan bikart bigehte armencekê ku nivîserê behdînan bibne xwedî rojnameka kirmancî û berdewamyê bidete weşanê ji bo pênivîsên ji nû gehşitîn û digel yê berî wane, wezaretê rewşenbîrî û ragehandina 'êraqê bi razemendiya biryara serokatya 'êraqê ew kar hatbû kirin, dihimare êka rojnamê rupelê (8) hatiye (êvarya 21/5/1989 seydayê Letîf Nesîf Casm wezîrê rewşenbîrî û ragehandinê kumbînek ligel jimareka edîb û rewîşnebîr û rojnamenivîsê kurd kir) husa xuya dibît ku bi awayekê rismî her diwê rojê biryara derketina vê rojnamê hat derxistin, xuyaye hemî pare û mezaxtiyên vê rojnamê ji aliyê hikumetê ve dihatine dabîn kirin, bi vî awayî estêra rojnama bizavê desmanê rojnama gerya kurdî de geş bû.

Piştî bi dumahîk hatina karê resmî ji bo çapkirinê û derketina wê û danana navî û berî ev rojname rojê bibînît, li gorî axiftina Ehmed 'Ebdulla Zerûy (*piştî me çendîn kumbîn kirin li "Hutêla" bexda me kumeka nava înan, lê navê dûbare bun û mejî dixwast navekê kurdî û kirmancî bît, heta dumahî me navek pêşniyarê desteka hêjakir bi rastî fikra me bi dilekê xweş û geş ev nave vegrit û wergirt ku navê wê bibîte "bizav"* evca li navê jî 'erebî me pirsê Bedîrxan Sindî kir jimera gut bikene "El'ezîme")¹⁴⁸, ev navejî li ser rojnamê hatiye nivîsîn, yekem jimare bi xemleka rengîn da mîna bihara çiyayê Kurdistanê ruyê xwe yê geş û nazik li xelkê Kurdistanê xuyakir.*

Derket bizav

Bi kirmancî

Derket rojnama

Bêrinicî

Bizav belav bû

*Bizav Dizmanê 'Erebyê De Bi Ramana (Elhereke) Lê Ji Ber Ew Zulm û Zordarya Rijêmê Nedkarîn Vê Navî Bi Awayekê Raste Rast Lê Binên.

¹⁴⁸. Ehmed 'Ebidula Zerû, Ç.P, Pertûkxana Dihuk Li Şarê Dihukê, Demjimêr 3:30ê êvarî, Êk Sembî, 17/7/2016.

Dinav meda

Evînya xu

Li dilê meda

Bizav hat û

Cîhan runkir

Berperek

*Li dîrokê vekir*¹⁴⁹

Bizavê li 1/8/1989ê li roja sê şembiyê dest bi weşanê kir, bizav di Weş (dar Elcemahîr) li mistensirîye li paytexta 'êraqê (Bexda) dihate çapkirin, her ji dest pêkê heta dawiyê hemî jimarên vê rojnamê (8) rupel bûn nekêm nezêdetir, ruberê rupelê wê mezin bûn bi dirêjahya (48sm) û bi panya (34sm) bûn, rupelê êkê û heştê renga û reng (milewin) û yên din reş û sipî bûn.

Li ser rupelê êkê hemî jimareyên vê rojnamê ji aliyê serî navê rojnamê bi 'erebî (El'ezîme) û li bin de bi elfbêya 'erebî (bizav) bi meznî brengê sor nivêsaye bi latînî (Bizav), ji aliyê çepê xwedî îmtiyaz û sernivîser (Dr. Nafi' akreyî)* nivêsaye û li bin de weha hatiye nivêsandin (bizav, rojaneye _ siyasî ye _ giştî ye) li bin vê jî de (sala 1989 hayte danan) li bin vê jî de (niha heftî yê carekê derdikevît) û bi 'erebî (cerîde yewmîye siyasîye 'ame) hatiye nivîsîn, ji aliyê rastê li serî litensît navê wê (heşt pere) û li bin de bihayê wê li jimare (1 _36) (bi 100 filisaye) (37_ 56) (bi 150 filisaye) hatine nivêsandin, û li rexê rastê serî peyveka dîktatorê ji nav çuy bi vî away (em dil sojîn bo pêşxistina utunumî beref pêşve roj liduy rojê û heyv liduy heyv û sal liduy salê, daku milletê meyê kurd hêz û şiyana wî bidiristî serbest bît "serokê qomandar Sedam Hisên")ev peyve li jimare (êk) û li jimare (2-56) ev peyve (bê du dilî û bê tiris binivîsîn eger dewlet razî bît yan jî nerazî bît ji wî tiştê huyn dinivîsîn "serokê qomandar Sedam Hisên") li ser hemî jimare hatiye nivîsîn, her weha li jêr van nivîsînan jî jimara wê û roj û heyv û sal bi kurdî û 'erebî û bi sal jimêra mîladî û hicrî dihate nivîsîn mîna dijimare yekê de bi vê awayî (hijmara (1) •sê şembî 1/8/1990m • elsilasa 1/81/1989m • 29/ zulhece 1409 mişextî) hatiye nivîsîn.

Aliyekê din ku hewceya wê heye em bibêjn bikarhênana xalbandyê ye ku bi awayekê serdemyane û pêşkeftî dihemê jimareyan de xwendevan bi hisanî hest pêdiket, bizavê giringyeka baş bi hunerê derhênanê daye çî ji aliyê bi karînanan mewdaya cuda cuda tîpên çapê û çî ji aliyê dabeşkirina gutaran bê li ser rupelan û çî rêkxistina rupelan bê li ser binaxê çend stunek û dabîn kirina her stunekî bo babetekî, zêdebarî wê çendê ku ewê tayp û babetên rojnamê dabeş û dinivîsîn ('Ereb) bû .

Rupelê vê rojnamê bi awayekê gelek ciwan hatine dabeş kirin, rupelê êkê rupelê taybet bû bi karubarê siyasî wesfa karê serok komarî dikir li ser rupelê êkê di hemî jimare yên vê rojnamê wêneyê (Sedamê Diktatur) dihête dîtin, rupelê diwê taybet bû bi karubarê siyasî navxo di vî perî de ew babet dihatine belav kirin ku rojane li 'îraqê

¹⁴⁹. Fazl Remezan Qebalan, *Derket Bizav*, R.B, J2, Bexda, 8/8/1989, r.8.

*. Ji Bo Pitir Wergirtina Zanyaryan Li Ser Jiyan û Berhemên Nafi' Akreyî Li Rupelê () Vê Namê Bnêre .

bi taybetî li dihuk û dewruberê wê dihatine encam dan, rupelê (3)ê bi navê (Lêkolîn) bû divî perî de ew lîkolînên dihemî bwarê jiyane çî siyasî bin yan tendirustî yan aburî yan dîrokî gelek bwarên din, dihindek jimareyan de divî perey de behsa serkirdeyên kurdan jî dihêne kirin mîna dihimjara (2) behsa Qasimloy dihête kirin, her weha gelek caran babetên edebî jî çî lîkolîn yan helbest divî perey dihêne dîtin, rupelê (4-5)ê bi navê (Rewşenbîrî û Edeb) bû divan peran de hijmareka zora helbesta zêdetrî (200) helbestan dibin ewên dihemî jimaran de hatine belav kirin, dewlemendî û giringya vê rojnamê bo berhemê ('Elî Herîrî û Ehmedê Xanî û Mealiyê Cizîrî û Sadiq Behaedîn....) vedigere ji bilî wan hozanvanên ku li temenê lawetî dabûn mîna (Mehsin Qoçan û Sliman Kolî û Ehmed Şoşî û Sebirya Hekarî). Bi ruheka nîştimanperwerî û yaxî bûn helbestê xwe dinivîsîn, her weha jimareka zora kurte çîrok û serhatî û lêkolînê aynî û rexneyî çî dihelbestê yan di çîrok û roman û heyranokan hatine kirin, zêdebarî hijmareka zora helbestan ku ewê bi zimanê ('Erebî û Îngilîzî û Ferensî ..) Hatine wergêran ji bo ser zimanê kurdî, hemî ew helbestên hatine belav kirin tinê bi devoka kirmancîne û hindek helbest ji bo cara êkêne bihêne belav kirin, her weha li van dû rupelan de hijmareka zora jiyane û dîdar û helsengandin û berhem nivîser û hozanvanan dihêne dîtin, rupelê (6)ê bi navê (Hunerê Giştî) divî perey de hijmareka zora serhatî û stiranê mîllî û hunermendî fuliklor û bernyas kirina çendîn ekter û navdarên biyanî divî rupeley de belê dihindek jimareyan ev pere taybet fikir ji bo karubarê navxu li wîrda çendîn çalakî yê rijêma ji nav çûy dihatine behis kirin, rupelê (7)ê bi navê (Giştî) gelek karu çalakî yê heme cor têde dihatine kirin mîna vekirina xulên tepapêy û gêrana şehyana bi helkefta serkeftina 'êraqê bi ser îranê û dirust kirina guşeyên zîrekî her weha belav kirina çendîn reklaman û gelek caran ew babetên bermayî û helbestên fuliklorî têda dihatine belav kirin, rupelê (8) bi awayekê cuda ji rupelên din hatiye danan nivîsîna wê bi panayî danaye evejî mîna tiştêkê nû bikarînyaye divî perey jî de çendîn babetên li hev cuda dihêne belav kirin berhem û çalakyê çendîn ekterên biyanî dihêne dîtin û gelek caran helbestên kurdî û dihimjareka zora vê rojnamê de (Tevşok yan Ez Dibêjm) hatiye nivîsîn her weha navê desteya nivîseran jî têde hatiye nivîsîn mîna (Mihemed Selîm Siwarî, Muxtar Fayeç, Mihemed Cîhad Hesên, Ehmed 'Bidulla Zero, Xald Hisên, Hisên Mistefa 'Usman) bûn, nav lê nana rupelan netiştêkê cihgîr bû gelek cara dihatine guhrîn lê rupelê (4-5) nedihate guhrîn, dihimjara (52)ê de li serê rupelê (2-7) nivêsabû (Bizav û Karwanê Salekê).

Her ji destpêkê heta dawyê ev rojnameya bi awayekê rêk û pêk der di çû hemî sê şembiyan der diket û bêy ku çî caran bihête ragirtin, ev rojnameye hemî babetê wê tine bi devoka behdînî û bi elf û bêya 'erebî dihatine nivêsandin, xaleka dî here giring evê rojnamê ta radeyekê baş giringî bi babetê rojnamegerî dida di rupelê (8)ê de her carew behsa rojnameyekê yan kovarekê dihate kirin lê bi kurtî.

Li gurî axiftinê Ehmed Zerûy (*xelkî bi awayekê giştî zor bi gerim û gurî pêşwazya vê rojnamê fikir, dema digehiştê şarê dihukê eger herçend jimare heban ta êvarî*

nediman)¹⁵⁰, her weha eger em lêrîneka ser pêy bikeyn dibînîn dabeş kirin û helbijartina babetan û bi karînana zimanekê resenê kurdî dur ji peyvên biyanî û beşdarbûna hijmareka zora nivîser û hozanvanên navdarên milletê me, her weha di hijmare (52)ê de çendîn nameyên pîrozbayê bi bûna salvegera bizavê zêdebarî hijmareka zora helbestan ku bi bizavê hatine vehandin û belav kirin divê rojnamê de nîşana giringî pêdanê ye.

Piştî hikumeta faşista jinav çuy zanî milletê me rewşenbîrê me çî cara xwe nafiroşin li hemberî çend (dînarên) bi bejin û bala zalma nabêjin serê xwe jêra naçemînît û bê deng nabin li hemberî wê zulm û zordaryê her dê hewla bi ageh înan û çav kirineva wana bi dinyaya derve û handana wana ji bo xwandinê neçar bû bi hinceta nebûna parey ev estêre û ev şemalke di esmanê rojnameger ya kurdî de li 28/8/1990 temirand gut îdî dernayê .

2. ÇI DERBARÊ ROJNAMA BİZAV HATIYE NIVÎSÎN:

Rojnama bizav rojnameyeka rojane û siyasî û giştî bû li hemî heftiyan derdiket û li gelek şarên Kurdistanê dihate belav kirin, heta niha çî nameyên ekadîmî yan çî pertûk bi awayekê giştî behsa vê rojnamê nehatiye kirin, lê di hijmareka zora rojname û kovaran û pertûkan bi awayekê kurt behsa vê rojnamê kirye lê cihê daxê ye dibêşeka zora wan kurte basan ewên derbarê vê rojnamê nivîsîne gelek şaşî û hele têda dihêne dîtin mîna dipertûka (raberî rojnamegerî kurdî) weha hatiye (rojnama bizav (54) jimare li 14/8/1990 dawî jimara wê bû derket)¹⁵¹ me li jorde behis kir ku (56) jimare û li 28/8/1990 dawî jimara wê bû, ev nameye bo cara êkê ye bi awayekê ekadîmî û zansitî berifireh behsa vê rojnamê biket û hemî helbestên wê piraktîze û berçav biket.

3. KUM KIRIN SAXKIRINA BELAV KIRYÊN VÊ ROJNAMÊ:

Piştî têper bûna (26) salan bi ser derçûna vê rojnamê ber belavya jimareyan rewşenbîr û nivîserên kurd û çî layenan heta niha bîr ji kumkirina vê rojnamê nekiryê û ku bi awayekê serdemyane belav biken ji bo wê çendê ku hemî jimare bi ser êk li ber destê xwendevanan bin mifayê jê bibîn in, bi dest xistina hemî jimareyan ta niha karekê bi zehmete, lê cihê dest xoşyê ye ku (Dr. Newzet Zêbarî) (55) jimare li dû berga de ta niha li def xwe parastîne xelk bi awayekê giştî mifayê jê dibînît û li vê dawyê de kolîja perwerda akrê beşê zimanê kurdyê (55) jimare bi awayê (A3) jiber girtin xwendekar zanyarî jê werdigirin û basê derçûnên û raporên xwe li ser dinivîsin .

¹⁵⁰. Ehmed 'Ebidula Zerû, Ç.P, Pertûkxana Dihuk Li Şarê Dihukê, Demjimêr 4:00ê êvarî, Êk Şembî, 17/7/2016.

¹⁵¹. Îsma'îl Tenya, *Raberî Rojnamegerî Kurdî (Azarî 1975-1993)*, Ç(1), Weş Rewşenbîrî Hewlêr, 2013, r.226.

4. DR. NAFI' AKREYÎ JIYAN Û BERHEMÊN WÎ:

Navê wî Nafi' Eyub Feyzulaye li gereka (çuste)ya li bajêrê akrê ser bi parêzgeha dihukê ji sala (1944) daykbûye, dinav malbateka hejar û nedar mezin bûye, babê wî karê (sefarî dikir amanêt sîrî sipî dikirineve)¹⁵², her di zarukinya xwe de quran xwandiye û çûye mizgeftê, di dibistana "Eqere wla" niha dibêjinê "Akrê ya kevin" dest bi xwandina seretayî kirî ye, her wekî ew bi xo di romana buhojîn de didete xuya kirin ku li ser daxwazyaya wî (demê Şah"Feyselê diwê" dihêt akrê sala 1957 ta pirojekî veket ewî namek bi harîkaryaya hevaleyê babê xo nivêstî û daxwaza vekirina qutabxana navnicî kir)¹⁵³ xuya dibît ku ji bo cara êkê qutabxana navnicî li akrê li ser daxwazyaya wî hate vekirin, qonaxa navnicî jî li akrê temam kir ji ber nebûna qutabxana diwanawendî neçar dibît ji bo temam kirina xwendina xwe diçête şarê "Musil" li qutabxana "Ele'dadye Elşerqî ye" dixuyît bi pileka here baş xwendina xwe bi dawî dihînt, li sala 1962 li kolîja Nujdaryê dihête wegirtin, hevdem digel xwandina kulîja nujdarî û karkirinê jî ew qutabyê kulîja maf (Hiquq) bû, bi rêka naman (miraset) li zankuya dîmeşq li surya)¹⁵⁴, dîsan liser vê mijarê nivîskar (cemal baban) jî dibêjît: "li sala (1967) wî bawernama maf (Hiquq) li zankuya dîmeşqa surya wergirtye û sala (1968) kulîja nujdarî li zankuya musil tmamkirye)¹⁵⁵. Wî hijmareka berhemana yê heyn ew jî evên xwarêne:-

1. Romana (buhjîn) ku ji dû bergan pêkdihêt, bergê êkê li sala (1989) hatiye çapkirin, bergê duyê li sala (2000) hatiye çapkirin.
2. Hemî wêne ji tene, (dîwan) hozan, sala (1985).
3. Çend yadaştên pizîşkekî, kumele çîrok, sala (1980).
4. Ew şeva qed jibîrnakem, kumele çîrok, sala (1984).
5. Şanogerî 4+1.
6. Herkes û şîrî xoy, dû şanoname, sala (1991).
7. Şanugerî (şêxî sen'anî), sala (1980).
8. Çend şa'rek di herêma behdînan da, pertuk, sala (1978).
9. Ji turê bergîrî yê îranî, wergêrran ji farsî bo kurdî, sala (1982).
10. Bêdereke le huzanî nwêy 'erebî le 'îraqda, wergêrran ji 'erebî bo kurdî, sala (1989)¹⁵⁶.

Eve sereray belavkirina çendîn gutarên edebî û zansîti di rojnama bizav û kovarên wekî: tendirustî kumel, nuserî kurd, karwan, hawkarî, rengîn ku wî guşeka taybet divê kovarê da binavê (nojdarî) hebû, herwesa ewî dibwarî ragehandinê jîda bo demekê karkirye taybet li telefzîwna nafxuîyaya kerkukê, bernamek binavê (tendrost

¹⁵². Dîndar Mistefa Se'îd, *Havibûn Diberhemên (Nafi' Akreyî)Da*, Nama Masterê, Zanîngeha Dihuk, Kolîja Perwerde û Binyat, Dihuk, 2016, r .

¹⁵³. Nafi' Akreyî, *Romana (Buhjîn), Pişka Êkê*, Ç1, Ji Belav Kiryên Emîndarêti Giştî û Roşnîbîrî û Lawan, Hewlêr, 1989, r.26.

¹⁵⁴. Dîndar Mistefa Se'îd, b.n.b, r.

¹⁵⁵. Cemal Baban, *E'lam Kurd El'raq*, Metbe'e, Şifan, Arbîl, 2006, r.835.

¹⁵⁶. Dîndar Mistefa Se'îd, b.n.b, r.21.

û jîyan) li ser telefzîwna (kerkuk) pêşkeş dikir li salên heştêyan da, ew bû xelkekê zor bi bernamê wîve hat bû girêdan, hem jiber şewazê pêşkeşkirina wî, ku şewazekê kumêdî bû, hem jî weku giringya babetên bernamê wî, bernamê heftiyanebû, zêdetrî salekê wî ev bernamê pêşkeş dikir.

Ewî destekê zêrîn hebû dibwarê wergêranê da, çunkî herwekî me berî niha jî diyarkirî ku ewî jîbilî zimanê kurdî, zimanê ('Erebî, Îngilîzî, Farsî)jî baş dizanîn

Ewî di jiyekê kurt da, gelek pustên bilind wergirtîne, jîbilî wan pustên dibwarê nujdaryê da wergirtîn, ew di wergirtina wan hemî pûstan jîda yê serkeftî bû, jiberku yê destpak û xem xur û rastgubû, ji wan pûstan:-

1. Serokê êketya nivîserên kurdî bû li Kurdistanê.
2. Nunerê giştiyê heyva suran 'êraqî bû, bo her pênc parêzgehên bakurê 'êraqê (dihuk, hewlêr, kerkuk, silêmanî, mîsil).
3. Nunerê giştyê kîtab el'erb bû.
4. Nardyê 'êraqê bû, bo karubarên rojnamevanyê li derve.
5. Sernivîser û damezrênerê rojnama (bizav) bû.
6. Cêgirê sernivîserê kovara (tendirustî û kumel) bû.
7. Cêgirê sernivîserê govara (nuserî kurd) bû¹⁵⁷

Li roja 13/8/1992ê li zalgeha xazr bi destê îstîxbarata rijêma faşista gor bi gora 'êraqê dihête kuştin li goristana (Kanî Qirjalê) nîzik hewlêrê hatiye veşartin.

5. Rolê Rojnama Bizav Dipêşxistina Helbesta Kurdî Li Devera Behdînan:

Rojnamevanya kurdî rolekê giring dipIranya warên jiyana mirovê kurd de gêraye, nexasme diwarê bilind kirina astê hişyarî û rewşenbîryê de, ku bi dirustî buye, ew hunerê tumarkirina rûdanên rojane ên bi hurî û rêkxistî guncay digel buçun û giringîdana bi kumelên mirovan veguhastina dengubasên wan diyarkirina çalakî û rabwardina wana buye xodîka kumelê û dîtin û hizrên xelkî li ser reng vedet.

Rojnamanivîsa kurdî mîna jêdereka ji bin nehatya kurdî ye, ji ber wê çendê her li destipêka serheldana rojnamenivîsî yê ta niha dergehê xwe li hemberê edebê vekirye û behira pitir rûpelên xwe ji bo terxan kirîne, pişka hera zora van rojname û kovare kurdiyane her ji dest pêkê heta piştî raperîne core tevliheviyek pêve dibelav kirin wana de diyarbû, ev çende jî li waneye bo çend egeran bizivrit, yekem kêma ya derketina rojname û kovaran, duyem nebûna kesên pispor û xwedî selîqeke rojnamevanî, sêyem îmtiyaza behira zora rojname û kovarên pêşî edebî bû her jiber vê çendê jî xwedî îmtiyaz û serinivîserên rojname û kovarên pêşî û niha jî helbestvan û nivîserin, hebûna van diyardane di xizimeta edebê de bûne çunkî dibînîn ewên pisporiya wana di bwarên zansitî û zîra'et û derûnî, xizimeta edeba kurdî kirîne helbest û çîrok û mijar nivîsîne, rojnamenusyaya kurdî ev bi dehan sale xizimeta edeba kurdî diket bi hezaran helbest û pexşanên kurdî ji nav çûnê parastîne, muherir û serinivîserên behira pitir rojname û kovarên pêşî û niha jî helbestvan û nivîser û

¹⁵⁷. Dîndar Mistefa Se'îd, b.n.b, r.22.

layengirî edebê bûne, her ev çende jî bû sîmaya edebê mîna cewhereka geş bi rûyê babetên zansitî jî ve ya diyare, eger li dîroka rojnamegerya kurdî binêhrîn dibînîn ku di jimare her belav kiryekê de edeb bi taybet helbest mîna beşekê giring ji bo hişiyar kirinê û agehdarkirina komelgehî kar pê hatî ye kirin, ji bo xizimet kirina netewê xwe yê bikarînay.

Eger rojnama (bizav)ê serdemê wê û bi egerê temen kurtî û ew asteng û nebûna azadiya raderbirîn û ew zulm û zordarya li hember kurdan dihate kirin zêdebar van hemî arîşan bizavê karî bo mawê salekê berdewam bît û rolekê giring hebû dipêşxistina edeba kurdî bi taybetî li devera behdînan de hebît, ji aliyekî din pêgehandin û belav kirina berhemên zor gencên xûn gerim ku ew hez daxazên di dilê wan de bi rêya helbestan de der dibirin, bizavê her li destipêkê ta dawyê ji bo berceste kirina wan amanc û mebest û pîlan ji bo darşitî ta astekê berçav berhem bînt û mîna rojnameka meşhur li wî serdemî rupelên xwe dabeş kirbûn.

Bizav bi harîkarya komeka nivîser û şa'êr û ronakbîrên kurd karî heta radeyek livînekê bixene nav navenda edeb û rewşenbîrya wî serdemî bi taybetî li devera behdînan û bibine pêşengê edeba nûya kurdî di wê qonaxê de, serheldana bizutineva rewange ji aliyê çend şa'êr û nivîserên çalak gorankarên mezin bi ser edebê hîna û rojnama aso jî mîna deste xoşka bizavê rolekê giring hebû li beref pêş birina babetên edebê û naverok jî bê behira nebû li van gorankaryane.

Divê rojnamê de hemû babetên edebî berçav kirîne her êk li gor giringiya xove şon bo hatye vekirin, rojnama bizav rupelên xwe bi şeweyekî pêşkeftî dabeşkirîne ser çend goşeyên diyarî kirî de ku her êk ji wana taybet bûn bi babetên cuda cuda rupelê (4 û 5)ê taybet bû bi roşenbîr û edeb ku têde helbest û çîrok û babetên rexneyî û lêkolîneve.....û ji bilî van dû rûpelan di hinek jimarên rojnamê de rupelê (3 û 7 û 8)ê jî car car babetên edebî têda belav dikirin

Ji bo giringî û rol û taybetiya vê rojnamê em bi awayekê ekadîmî lêkolîneve bikîn hewceya wê heye hemû babetên edebî der bixeyn û her êk ji wane dibît bi cuda li gorî wî serdemî lêkolîneve bikîn lê ji ber dewlemendî û mewdaya vê rojnamê bi hemî babetên edebî me nikarî hemî babetan werbigirîn, Divê namê de me xwast tinê layenê helbestê werbigirîn çunkî helbest mîna lqekê here giring di dîroka edebiyata kurdî û hemî cîhanê de bandora wê zêdetir li ser komelgehî heye û dikarît hemî bîru boçonên siyasî û netewayetî û aynî û evînî..... Çi b awayekê raste rast yan jî neraste rast bi xwendevan ên xwe bigehînit.

6. ÇEWANYA HATINA 'ERÛZÊ DI HELBESTA KURDÎ DE:

kêşa resena kurdî li dor belgeyên dîrukî her kêşa birgeyî bûye piştî hatina ayînê pîrozê îslamê kêşa 'erûzê dest biser helbestên hozanvanên kurdî dagirî, diqunaxeka diyarkirî ku ji encamê barudoxekê taybet hatî ye dinav hozana kurdî de, behira pitir vekoler û rexnegrên edebî egerê sereke îslamyetiye û belav bûna ayînê îslamê di rojhelatê de, dadinên (piştî kurd têkhelî şaristanyeta 'erebiya îslam bûy û zansitên ayînî û zimanê 'erebî û giringî wergirtî, tiştên xumalî pişt guh havêfîne yan jî em

bêjîn bi haletekê fermî nedizanî ji ber hindê kêşên helbesta xumalî tinê dinav xelkê asayî de maye ji bo stiran û beytan bi kardhatin)¹⁵⁸, bandora rewşenbîrya 'ereba liser milletên ku îslam wergirtî mîna farsan baştirîn mînake ji bo vê yekê (bandora 'ereba ji wan bandora ne ku kar kirye ser farsî ji aliyê tak takî û zaravê ayînî û felsefî û kêş û qafya şî'rî de, ku eve jî ji aliyê wana ve gehşitî ye me)¹⁵⁹, xuya dibît hozanvanên kurd zansitê 'erûzê bi rêka ayînê îslamê wergirtî ye, anku (piştî îslam bûna netewê kurd û belavbûna rewşenbîrya îslamê li kurdistanê de, netewê kurd jî mîna netewê din gelek ji kelturê pêş îslam hêlaye kêşên neteweyî meydan ji bo kêşên 'erûzê hêlaye buyne kêşên foliklorî)¹⁶⁰, zansitê 'erûzê êkser ji 'ereban nehatine wergirtin belku (bi rêka edebê farsî û kêşên 'ş'ra 'erebî hatine bikarînan)¹⁶¹, ev çende jî ji bo wê çendê vedigere ku (zimanê kurdî û farsî, ji heman jêderin û hijmareka zora peyvên wek hev hene)¹⁶², ev nizîkiya zimanî dinavbera kurdî û farsî de bûye egerê hindê rewşenbîrê kurd pitir berev rewşenbîrya farsan biçin û pitir giringyê bi edeb û rewşenbîrya wana biden.

piştî belav bûna ayînê îslamê dinav neteweyên rojhelatî de, ziman û rewşenbîrya 'ereba jî dihate dinav ewan neteweyan de û zimanê 'erebî jî bûye zimanê rewşenbîrî bu neteweyên misilman û peyv û zaravên 'erebî bi rêka ziman û edebyata farsî hate dinav zimanê kurdî de, 'erûza (xelîl)î, balek biser halbêsta 'ereba û hemu ew navçeyên ku îslamî gehîştî, da kêşa û ev 'erûze jî birêka hozana farsî bişewê destkarî kirî, hate dinav hozana kurdî de çunkî hozanvanên fars 'erûza 'erebî wek xwe dinav hozanên xwe de bikar neînaye belku wana jî guhrîn têda kirî ye bi awayekê weha ku digel siruşt û zimanê wana biguncît, ev diyarde divan xalan diyar dibin:

1. Hinek kêş dinav helbestên 'ereban de bi awayekê ber belav hatine bikarînan mîna kêşên (Tewîl, Medîd, Wafir), lê dibînîn dinav helbestên kurdî û farsî de kêma hatine bikarînan, lê dibînîn hinek kêş dinav helbestên 'ereba kêma hatine bikarînan mîna kêşên (Hezec, Muctes, Muzarî') lê dinav kurd û farsan de bi awayekê berfierh hatine bikarînan ku digel taybetmendî û zimanê wana de hatine lihevkerin, hinek kêş jî dinav her sê zimana de hatine bikarînan.
2. Kêşên (Remil, Hezec, Muctes, Recez, Muzarî') dinav bazneyên (xelîl)î de bi şeweyê şeş tev'îla lê dinav kurd û farsan de heşt tev'îla.
3. Zêdekirina qalbên kêşan lîdor hozanvanên farsan, helbet bo zêdekirina qalbên kêşan jî zîhaf û 'îlle hatine zêdekirin, herçende di 'erebiyê de ('îlle) rolekê sereke digêrît ji bo pêkînana qalbên kêşên 'erûzî, (zîhaf) jî wekî ('îlle) pêkve dikarin

158. Ehmed Qerenî, *Kêşên Şî'ra Kurdî Dinavbera Behrên Ferahîdî û Hespên Ciger Xuynî Da, Kuvara Raman*, Ji (86-87), Weş Wezareta Perwede, Hewlêr, 2004.

159. Emîn Mutabiçî, *Şa'êranî Kurd û Edebyatî Fars, Guvarî Kolîja Edebiyat*, Ji 165, Zanistgay Bexda, Weş Me'arîf, Bexda, 1973, r.5.

160. 'Elî Fetah, *New Beharî Xanî û Ehmedî Şêx Marîfî Nudê, Lêkulînewe û Berawrdkirdinî*, Weş Rewşenbîrî û Lawan, Hewlêr, 1985, r.22.

161. Ehmed Qerenî, *Kêşên Şî'ra Kurdî Dinavbera Behrên Ferahîdî û Hespên Ceger Xuynî Da*, r.70.

162. Emîn Mutabiçî, *Şa'êranî Kurd û Edebiyatî Fars, Guvarî Kolîcî Edebiyat*, J165, r.6.

kêşên qalbên 'erûzî dirust biken, ev diyarde dihelbesta kurdî de gelek giringî pê nahête dan.¹⁶³

Xuyaye ku 'erûza 'erebî ji (16)e kêşan pêk dihêt lê şa'êrîn kurd hemî kêş bi karneînayne çunkî hindêk taybetin bi zimanê 'erebî û digel zimanê kurdî li hev nakin, lidîv wê amara kêşnasyê hatiye kirin ji aliyê (Mihemed bekir Mihemed)î ve, bo cara êkê di ebiyata kurdî de hatiye encam dan û bi awayê praktîzekirin li ser (22) dîwanê hozanvanên kilasîkî kirye, xuya dibît ku hozanvanên kurd tinê li ser (10) kêşan ji (16) kêşê 'erûzî 'erebî helbestên xwe vehandine, ji wana jî (Hezec, Remil, Muzarî', Recez, Xeffif, Muctes, Mutaqarîb, Besît, Serî', Munserî'), her weha lidîv wê amarê der dikevît zortirîn kêşên dinav vane jî hatine bi karînan (Hezec, Remil) bûn ku zêdetir digel zimanê kurdî li hev diken*, xelîlê ferahîdî (15) kêş danayne lê kêşêa (16)ê (Mîtdark) jî ji aliyê (Exfeş) hatiye zêde kirin.

7. HELBEST DI ROJNAMA BİZAV DE:

Dr.Nafi' akreyî xwedî îmtiyaz û serinivîserê rojnama bizav, di rûpelê(1 û 7) jimare êka rojnama bizav de disere gotarekê de derheqê derketina rojnamê de behis kirye, her divê gotarê de ewa zêde bala me kêşa serinivîserî gilî û gazine ji hevalên xwe yên soran kirine, dibêjî: (raste û direw nî ye ku nivîserêt kurd li herêma soran xwe zehmet ne dida û mijulêt vexwandina nivîsînê kurmanc nedikir... Ew dihewcey vexwandina vê şêwe zarî nebûn yan hewla nivîsînê biden bi şêwa behdînî...)¹⁶⁴, dîsa her di heman jimare de behsa hewl û mandîbûna derketina vê rojnamê diket û giyanê birayetî yê û dinavbera nivîserê soran û behdînan diket.

Rojnama bizav dimawê salek û mehekê de (56) jimare jê derxistine, her di vê rojnamê de zêde tirî dû sed helbestên kurdî cuda cuda belav kirîne ji bilî wan helbestên hatine wergêran bo ser zimanê kurdî, jimareka zora helbestên şa'êrên bi nav bangên kurdan mîna (Ehmedê Xanî û Meliyê Cizîrî û Feqê Teyran û 'Elî Herîrî û Şêx Memdoh Birîfkanî, Mela Enwerê Mayî.....) Ku hindêk jiwana cara êkê bû bihêne belav kirin .

Ew helbestên ku di rojnama bizav de di goşa rewşenbîr û edeb de yan jî li goşên din hatine belav kirin ji aliyê şêwe zarê zimanê kurdî ve bi devoka behdînî û kurmancî hatine nivîsandin, dîsa ji aliyê rêbazên edebî ve kilasîk û romantîk û ryalîzîmî, bi xove girtine.

Helbestên hatine belav kirin dinav rojnama bizav de ji aliyê naverok û mebestê ve, helbestên nîştîmanî û siyasî û evînî û ayînî û civakî û munasebat û wesf û şîwen tazî

163. Helîma Xurşîd 'Ebidula, *Berawirdiyeka Kêşnasî Dinavbera 'Erûza Kurdî û Farsî Dîwanên (MeAliyê Cizîrî û Hafîzê Şîrazî) Wek Nimûne*, Nama Masterê, Zanîngeha Dihokê, Kolîja Adabê, 2007, r.186-187.

*. Ji Bo Zanyarê Zêdetir Li Pertûka (Mihemed Bekir, Kêş û Rîtmî Şî'rî Foliklorî Kurdî, N.M, Zanîngeha Selahedîn, Kolîja Adabê,Hewlêr, 1990, r.171) Bnr.

¹⁶⁴ . Nafi' Akreyî, *Em û Bizav*, R.B, J 1, 1/8/1989, r. 1-7 .

û Bûn, rojnama bizav her digel yekem hijimara xwe de helbestên şa'êrên romantîk û kilasîk û zêde tir giringî bi helbestên romantîkî balkêş daye, diyare ku eve jî rêkeft nî ye belku ew hemî kawdanên siyasî û rewşenbîrî û civakî li 'êraqê dirust bûy ev keşe xulqandibî ta ku bandoreka mezin li ser derûn û agehdarkirina şa'êran û nivîseran hebît, her ev çende jî bûye hokar ta helbjardina babetên serekî bi awayekê nerastewxo (cevengî) jiyan û zulm zordarî û dagîrkerin û derbederbûn bûyne tewerê serekî nav nîşanê helbestê wana, ew şa'êrîn nuxaz mîna şa'êrên kilasîkî dixizimeta çînê derebeg û axa û desthelat yan jî giringî bi kêş û ciwanî û helbjardina peyvên baş ne di da tiştê ku herî giring dihelbestên wana de ji aliyê naverok mebestê em lê binêrîn layenê niştîmanperwerî û siyasî û aynî û civakî ne.

Jimareka here zore kovara û rojnamên kurdî bi bûne cih û warê helbestên kurdî, eger pêşî parçe helbestek keftbave destê xwendevanan li kor û diwexanan gengeşe li ser dihate kirin bi giring lê dinêrîn, li gorî rojname û kovaran helbestên kurdî hemû aliyekê ve girtî çavê hezaran xwendevanên navxo û derve geş kirî û roheka zîndî bi berhemê şa'êrên pêşî û nû ya day û bi neweyên nû nasandî, peywendî û şa'êrên kurd û rojnamenivîsî kurdî her ji kevin bigire niha jî şa'êrên kurd ru li karê rojnamenivîsî kirî ye, Divê meydanê buyne cewher û raberê rojnamenivîsî ya kurdî, ji wane (Pîremêrd, Salih Yusif, Goran, Hemzeyê Miksî.....).

Ji aliyekê din evê rojnamê hewilda helbesta nû ya kurdî li deverê beref ruxsarekê azad bi bet û her weha weçerxaneka mezin bêxte têda hewla paqijkirina zimanê kurdî ji peyvên biyanê û ş'ra serbest cihekê mezin diş'rên wan da girt û şa'rên diwîvda teknîkêka nûtir diş'ra xwe da peyrewkir mîna(Mehsin Quçan û Sebrî Botanî û Ehmed Şuşî), diş'rîn wana de dihatine dîtin.

Rojnama bizav ji aliyê zîndî kirineva helbestên kevin û beref pêşbirina helbestên nû rûpelê (4 û 5)ê terxan kirbûn ji bo babetên edebî û helbestên şa'êrîn nûxaz û çendîn helbestên pêşî jî belav dikirin û lê dikolîneve, dîsa çendîn helbestên biyanî jî berçav dikevin ku hatine zivrandin bo ser zimanî kurdî û jiyan û serguzešta jimareyeka şa'êrên kurd nivêsaye û bi xwendivanên kurd hatine nasandin.

Rojnama bizav rolê wê yê here diyar û giring di dîroka edebiyata kurd divî maweyê kê m de karî ye zêde tir dû sed helbestên helbjardî di baxçê helbestên kurdî tomarbiket û fikir û boçun û ramana zêdetir ji sed şa'êrên kevin û nûxaz belav biket, eger em ser jimêrekê bikîn dinavbera rojnama bizav rojname û kovarên din ewên helbestên kurmancî belav kirîn ji bo me diyar dibît ku cudahyeka zora hey dinavbera wana de em dikarîn bêjîn bi dirêjahya wî sedey hindî rojnama bizav helbestên behdînî nehatine belav kirin, her ev çende jî bûye gilî gazinidên jimareka zora şa'êr û nivîserên behdînî li birayên xwe ên kirmancîya xwarê li hemberî belav nekirina berhemê wana .

Rojnama bizav baxçeyekê ji bin nehatyê heme rengê helbestên şa'êrîn kurde bê cudahya nawçegerî û rêbaz û babetê şîrî, şa'êrîn bakurî mîna ('Elî Herîrî û Feqê Teyran û Xanî û Cizîrî û Pirtewî Hekarî.....) Ji bilî ewên ji latînî û sîlavî hatine wergêran bo ser elf û bê 'erebî û çend helbestên biyanî jî têda dibînîn mîna (Îlîd

Bînnik Mîsîng û Karlînî Çaçanî û gelekê din, û li hemî şar û şaruçkên devera behdîna bi bê cudahî li herdû regeza (Nêr û Mê) berhemê wana dihatine belav kirin.

Ew şa'êrên helbestên wan di rojnama bizav de hatine belav kirin ji aliyê temenî ve cuda cuda bûn em dikarin bêjin ku behira pitir genci bûn û bi hestekî niştîmanî û mîna şoreşekê bejdarî têda dikir û xem û jan û kovanên xwe bi rêya vê rojnamê digehande xelkê xwe û cîhanê, hinek ji wan ta niha jî mîna stêreka geş di edebiyata kurdî de cihên wana yê diyare ew jî (Mehisin Qoçan û Kemal Remezan û Şemal Îsma'îl û Hîvî Berwarî û Ehmed Şoşî û Semîr Zaxolî û 'Ebidurehman Hacî û Îbrahîm Surçî û Mistefa Selîm û.....), hindêkê din jî wana nemane çûyne berdilovaniya xudê mezin .

Xaleka din me dixwast amaje pê bikîn ew jî komeka şa'êrên (Afîret) mîna (Bêrîvan Kuvlî, helbesta şekiraxa, di jimare (5) û Rundik Mizîrî, nîkevînê, jimare (8) û hîvî berwarî, mezin tirim, tu nujdarî, mila bidebe, jimare (2, 5, 9) û Çira Mizîrî, kewê min, jimare (10) û Dayka Mêrxasî, bişkujê dadê, jimare (24) û Çira Mizîrî, tevnê min, jimare (22) û Deyka Fenerê, cejn, jimare (24) û Dayka Rîvîngî, kîme ez, jimare (39) û) Helbestên xwe divê rojnamê de belav kirîne û rolekê baş dipêşxistina helbesta kurdî bi bînit, jialiyekê din dirust bûna doxekê lebar ji bo afiretan ta bikarin mil bi milê hev regezê xwe rolê xwe dibwarê siyasî û civakî û aburî bi bînit. Ew helbestên dirojnama bizav dihatine belav kirin barudoxê jiyana wî sedemî nîşa me di den.

Ji bo baştir şehrezayê helbestên hozanvanên rojnama bizav bîn hewceya wê heye ruxsar û naverokê helbestên rojnama bizav piraktîze bikîn û şirove bikîn:

7.1. RUXSARÊN HELBESTÊN ROJNAMA BIZAV:

Ruxsar û naverok dû binyatên giringên deqê edebîne, pêkive digirêdayne, neruxsar bê naverok dibît û ne naverok jî bê ruxsar dibît çunkî ew babetê û ruxsarê bixove digrît naverok jî pişt rast ya digelda û beruvajî, anku ruxsar û naverok dû pêkhatên giringên tikistê edebê ne.

Helbest jî êke ji hunerên edebê ye, ku xwedî taybet mendiyeke serbixoye, wekî hatî ye zanîn helbest û musîqe peywendiya wana bi hevdu re heye û ji êk cuda nabin, ew jî dû rûyê wê hene (Naverok û Ruxsar), ku ji çend regeza pêkhatine êk ji wana musîqaye ev musîqaya derve kêş serwayê bixove digrît, ya xuyaye çemkê helbestê ji aliyê "Eflatunî" lasayî kirineva siruştî ye, lê direxna 'erebîde demê dihête pênasekirin kêş û serwa bi mercekê sereke dihêne danan, anku helbest (gotineka kêşdar û serwadir û ramanê didet)¹⁶⁵, ev sê regeze bineretê helbestê bûn, ruxsar rulekê mezin di berçavkirina şeweyê helbestê û kartêkirina wê li guhdarê digêrît dihemî pêkhatên xwe de.

¹⁶⁵ . Nûrî Fars Heme Xan, *'Erûzê Kurdî*, Çapê Êkê, Dezgehê Belav Kiryên Aras, Hewlêr, 2004, r.73.

7.1.1. Kêş:

Ev pêkhate wek pîverek dihêt niyasîn, ku (helbest pê dihête pîvan lipey hijmara birgên sitirês û nestirêsdar û wan lidîv yeka pîvanê, ku tefîleye dihelbesta ji malkên ş'ri pêkhatî)¹⁶⁶ û malka ş'ri, yeka rîtmî ya têkista ş'ra kevine, ku bi vê çendê kêş (birîtî ye li sercemê van pê yan malkeka helbestê dirust diken)¹⁶⁷.

Kêş regezêkê serekî helbestê ye, gelek caran kêş dibîte regezê cudakerên helbest li janerên dinê edebê, (kêş awazê serekî dervey helbestê ye û digel awazê hindur de pêkdînî)¹⁶⁸, ku li deng û peyv û peywendî regezan ve dirust dibin, awaza giştî ya helbestê tamam diket, kêş di hemî zimanan de heye her lidîv taybetiya xwe her ji kevin ve hozanvanan bi vê çendê mamela digel helbestan kirî ye. Derbarê nasandina kêşî çend pênasayan berçav dikeyn:

Bi bo çûna Mihemed Bekir (kêş di hemî helbestê kêşdarê cîhanê de, birîtî ye li haw jimareyî birgan diher dû nîve dêrên helbestan de)¹⁶⁹, aşkeraye ku her dêre helbestêk li dû niv dêran pêk dihêt, dibît dihelbestên kêşdar da hijmar birgeyan wek hevbin yeksan bin.

Bûçoneka din (kêş layenekê babetî ye û qalbekê amadeye li ber destê hozanvanî ji bo wê çendê hest soz û derûn û bîr û wêne û endêşe xwe têda dibînît)¹⁷⁰, çî helbest bi bê hest û soz nabît.

Azad 'Ebdulwahîd derbarê kêşa helbesta nû dibêjît: xwe rizgar kirina hozanvanan li kêşên kevin û vedigere ji bo hewceya derûnê hozanvanan ku li vê derdê dixwazt xem û janê derûnê derbarê jiyanê dabirêjn, her weha dixwast ku rêbazeka nû dabhên ku kêş û serwa gelek dewrê xwe têda nebînît)¹⁷¹.

Her weha Şêx Nurî kêş qafye kirîne binaxe cudakirinê helbestê li pexşanê ji ber nêzîkya kêşê digel muzîkê her ev çendeye jî helbest û pexşanê jêk cuda diket.

Bi bo çûna 'Ezîz Gerdî (kêş regezêkê bincî ye ku herdem dihelbestê de dihête dîtî helbest bê kêş û rîtim nabî çunkî her çî nebît helbest ji dengê dirust dibît û deng jî awaz û rîtme)¹⁷² ev bûçone ta radeyekî ji bûçonên din cudaye.

Ji bilî wan kêşên resen ku kêşî birgey penceye, hozanvanên kurd core kêşekê din bikarîname, ewjî kêşa 'erûzî ye (piştî belav bûna ayînê îslamê li welatên Rojhelata naverast de hatiye dinav helbestên musilmanan jî bilî 'ereban yekê jiwana gelê kurd

¹⁶⁶. Çinar Sedîq Xazî, *Arastên Teknîkî Diş'ra Nuy Ya Kurdî Da Devera Behdînan _ Bedirxan Sindî Weku Nmûune*, Nama Master, Zanîngeha Dihuk, Kolîja Adabê, Dihuk, 2007, r.121

¹⁶⁷. 'Ebdurezaq Bîmar, *Kêş û Musîqay Helbestî Kurdî*, Weş Dar Elhirye, Bexda, 1992, r.10

¹⁶⁸. 'Ebdulselam Îslam Teha, *Rengdanewey Edeb Li Kovara Hawarda 1932-1943*, Weş Wezaretê Perwerdê Hewlêr, 2002, r.53

¹⁶⁹. Mihemed Bekir, *Kêş û Rîtmî Şî'rî Foliklorî Kurdî*, Weş Werzaretê Perwerde, Dezgehê Çap û Belav Kiryên Aras, Hewlêr, 2004, r.169 .

¹⁷⁰. 'Ezîz Gerdî, *Kêşî Şî'rî Kilasîkî Kurdî û Berawrid Kirdnî Legel 'Erûzî 'Erebî û Kêşî Şî'rî Farsî Da*, Weş Wezaretê Rewşenbîrî, Hewlêr, 1999, r.67

¹⁷¹. Azad 'Ebdulwahd, *Nuykirdnewe Leşî'rî Kurdî Da*, r.99.

¹⁷². 'Ezîz Gerdî, *Kêşî Kilasîkî Kurdî û Berawrid Kirdnî Legel 'Erûzî 'Erebî û Kêşî Şî'rî Farsî Da*, r.71.

bûn)¹⁷³, lê kurdan 'erûza 'erebî dirêya farsan wergirtî ye, lidîv guncadin û sexletên xwe destkarî têda kirye digel helbestên xwe guncadî ye, helbestên rojnama bizav li ser herdû kêşan hatine nivîsîn kêşên 'erûzî û kêşên birgeyî:

7.1.1.1. Kêşa 'Erûzî:

Dîruka kêşa 'erûzê geleka kevine û ji aliyê zanayê zimanzanê 'ereb (Xelîl Kurê Ehmed Ferahîdî)ve hatine danan, ku xelkê besraye şarezayeka baş dibwarê dengsazyê û musîqê de hebû, xudanê ferhenga 'eyne.

Peyva 'erûzê dizimanê 'erebyê de bi gelek ramanên cuda cuda dihêt, ji wana (rêyeka nexoş, şarê mekke, darê navenda reşmalê)¹⁷⁴, her wekî divan ramanan xuya dibêt ku peywendiya wana raste rast bi 'erûzê ve heye çunkî mîna zansit corekê giranyê pêve diyare, her weha ji aliyê zaravê jî 'erûz ew pêwane hunerye ku malkên helbestê pê dihêne pîvan ji bo wê bizanibin ku ev kêşe ya diruste.

Her weha li gorî boçûna 'Ezîz Gerdî ('erûz zansitê wan desturaye ku kêşên dirust ji kêşên nedirust ji êk cuda diket û digel rûnkirineva ew zîhaf 'îllye ên tuş dibin)¹⁷⁵, anku 'erûz zanistekê dirust û nedirust ya kêşan xuya diket .

Kêşên 'erûzê (8) hengawê (Tefîle) wê hene, ku bi hevra beşdarî d(16) behiran diken û her hengawek jî lidîv kurt û dirêjî bi vê awayî dabeş dibin (fe'ûlun, mefa'îylun, fa'îlun, fa'îlatun, mustef'îlun, mef'ûlatin, mefa'eletun, mutefa'îlun)¹⁷⁶, ev (8) tefîle li dîv dúbare bûn û êk li dîv êk hatina wana cure kêşê 'erûzê dest nîşan diket .

Divê mijarê de tinê em kêşên wan helbestan piraktîze dikeyn ku di rojnama bizav de hatine belav kirin:

A. Kêşa Hezec:

Di ferhengê de bi ramana (gurma 'ewra, dengê 'ewra, axiftineka diyar, sivkatî dirêve çûnê)¹⁷⁷, her weha bi ramana (sirud û awaz û musîqî û stiran û jî û dihêt)¹⁷⁸, her wekî me li jorde me diyar kir ku ev kêşe ji aliyê 'ereban zor nehatî ye bikar înan, lê dinav kurdan de ev kêşe her ji babetahîr bigre ta niha jî ew hozanvanên zêde tir bi awayê 'erûzî dinivêsn kê m yan zor vê kêşê bi kardihînin, kêşa hezec ji van tefîlan (mifa'îlin mifa'îlin mifa'îlin x2) pêk dihêt, vê kêşê cihekê diyar dinav rojnama bizav de ji xwe re girtî ye û bi çend qalbên cuda cuda hatî ye, mîna:

1. Herzeca (4) tefî'la salim (mifa'îlin mifa'îlin) x2:

'Elî Herîrî ev helbeste li ser vê kêşê vehandî ye:

¹⁷³. 'Ezîz Gerdî, b.n.b., r.94-95.

¹⁷⁴. 'Umer Elesed, *M'alm El'rûz We Elqafye, Elteb'e ula*, 'Uman, 1984, r.7

¹⁷⁵. 'Ezîz Gerdî, *Kêşî Şî'rî Kilasîkî Kurdî û Berawrid Kirdnî Legel 'Erûzî 'Erebî û Kêşî Şî'rî Farsî Da*, r.105.

¹⁷⁶. Peyman Mihemed 'Umer, *Ezmûnî Şêx Memdûhî Brîfkanî*, N.M, Zanîngeha Dihukê, Kolîja Adabê, Dihuk, 2008, r.88.

¹⁷⁷. 'Ebdulxenî Qeym, *Ferheng Me'asr 'Erebî_ Qarsî*, Ç4, Çap Ferheng Me'asr, Tehran, 1384, r.1168.

¹⁷⁸. Helîma Xursîd 'Ebdulla, *Berawirdyeka Kêşnasî Dnavbera 'Erûza Kurdî û Farsî Dîwanên (MeAliyê Cizîrî û Hafzê Şîrazî) Wek Nmûne*, Weş Xanî, Dihuk, 2011, r.11.

*Ji dengê bazin û zenda
Nema 'eqlê 'eqilmenda
Hindî min gut sî û çenda
Tu çêtir buy ji hevala¹⁷⁹*

b _ _ _ b _ _ _

2. Hezeca (6) tefî'la mehzuf (mifa'îlin mifa'îlin fi'ulin)x 2:
Pirtewî Hekarî ev helbeste li ser vê kêşê vehandî ye:

*Me dil ateş û nîrane dîsa
Ceger jî taze min bîryane dîsa
Neşêm êdî ewan derdêt bê hed
Bikêşim lew bi dirb jane dîsa¹⁸⁰.*

b _ _ _ b _ _ _ b _ _

3. Hezeca (6) tefî'la exereba meqbuza mehzuf (mif'ul mifa'lin fi'ulin) x 2:
Emîn 'Elî Bedirxan ev helbeste li ser vê kêşê vehandî ye:

*Hewqas tu mebêje ev çi hale
Bê sebir mebe welê me nale
Ewin û kerema xwedê havale
Binve kezebamin, binve lo! Lo¹⁸¹!*

_ _ b b _ b _ b _ _

4. Hezeca (8) tefî'la salim (mifa'îlin mifa'îlin mifa'îlin mifa'îlin)x2:
Hozanvanî ev helbeste li ser vê kêşê vehandî ye:

*Ketim benda evînê no mezu pişt û kemer besta
Meserda ber derê barê vewestam dest li ser desta¹⁸²*

b _ _ _ b _ _ _ b _ _ _ b _ _ _

B. Kêşa Remel :

Remel difêhengê de bi ramana (bilez rêve çûn hatî ye)¹⁸³, her weha bi ramana (vehîna hesîlkî jî dihêt, ku bi huyrî û zaravî dihête vehandin wesa ku livenên hesîlkê dinav davên werîsî dane û pêkive hatine lêkdan)¹⁸⁴ û d'erûzê de, ev kêşe jî dinav helbestên kilasîkya kurdî jî de zor hatiye bikarînan, kêşa remel ji van tefîleyan (fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun x2) pêk dihêt, ev kêşe jî car car dinav helbestên rojnama bizav de ber çav dikevît, mîna :

1. Remela (8) tefî'la mehzuf (fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlin) x 2:
Şêx Memdûhê Birîfkanî di helbesta xwe de ev core kêşe bikar înye:
Dilberê dîsa jînu derd û birînêt min kewand

¹⁷⁹. 'Elî Herîrî, *R.B*, J5, 1989, r.8

¹⁸⁰. Pirtewî Hekarî, *Medil*, *R.B*, J4, 1989, r.8.

¹⁸¹. Emîn 'Elî Bedirxan, *Helbest Ji Zarokan Delalya Zaro Wan*, Hsin Kuxî/ Ji tîpêt Latînî Veguhastye, *R.B*, J29, 13/2/1990, r.7

¹⁸². Tehsîn Îbrahîm Duskî, *Ketim Benda Evînê*, *R.B*, J25, 16/1/1990, r.4.

¹⁸³. 'Ebdulxenî Qeym, *Ferheng Me'asr 'Erebî _ Qarsî*, r.537.

¹⁸⁴. ¹⁸⁴. 'Ebdulxenî Qeym, *b.n.b*, r.537.

*Biserê zolfa siyahe wê xem û te'Elîl me cemand*¹⁸⁵

_ b _ _ _ b _ _ _ b _ _ _ b _

2. Remela (8) tefîla mehzuf (fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun) x 2:

Şêx Memdûhê Birîfkanî divê helbestê de ev kêşe bikar îname:

Şax û daxên welatê me pir ji şengebî ya

Çîçek û alan û beybun qul bi qul getine çiya

Nêrgizên ser digiran şermendeê xemla te

Li çîmenêt nazk û ter sinbil diden avrui ya

Surgulên sîmaî rengîn terezana girtî xunav

*Daxedarim bo binevşîn xurmeyî li ber gevî ya*¹⁸⁶

3. Remela (4) tefîla salim (fa'îlatun fa'îlatun) x2:

Mealiyê Cizîrî di helbesta xwe de ev core kêşe bikar îname:

Sorgulê ter jixunavê

Lêv kulîka bîn gulavê

Ruy çu heyva pur sîtavê

*Kuştim te bi daxa evîne*¹⁸⁷

_ b _ _ _ b _ _

Her weha Feqyê Teyran jî li ser heman qalb û kêş helbesta xwe vehandî ye:

Dil jimin naket xeyalan

Bu me perwana şemalan

Bîrî ya husn cemalan

*Ay dilê min ay dilo*¹⁸⁸

_ b _ _ _ b _ _

4. Remela (4) tefîla mehzuf (fa'îlatun fa'îlun) x2:

Ev kêşe dihelbestê Şêx Nuredîn Birîfkanî de dihête dîtin:

Menvera şahî Emîne

Dirbê gehandî pencere

Heq dizanît qîmetê

*Tarî diket liroyetê*¹⁸⁹

_ b _ _ _ b _

C. Kêşa Recez:

Ev kêşe diferhenga zimanî de gelek ramanan bi xove digrît, ji wana (ler zîna çukê hêştirê di demê birêve çûnê de)¹⁹⁰, her weha bi ramana (perîşanî û bilez bûn)¹⁹¹, jî dihêt, li gorî van ramanan ji bo me der dikevît kupitirya helbestên 'ereban dinav şeran

¹⁸⁵. 'Ebdulsalam Şîx Memdûh, *Hozanvanê Resen û Pêvehatî*, R.B, J39, 24/4/1990, r.4.

¹⁸⁶. Şêx Memdûhê Birîfkanî, *Şax û Dax*, R.B, J16, 14/11/1989, r.8.

¹⁸⁷. MeAliyê Cizîrî, *Sor Gul*, R.B, J29, 13/2/1990, r.8.

¹⁸⁸. Feqê Teyran, *Dil*, R.B, J8, 1989, r.8 .

¹⁸⁹. Şêx Nuraldîn Brîfkanî, *Dil*, R.B, J11, 10/10/1989, r.8.

¹⁹⁰. Luys Me'zuf, *Ferheng Mbîn ('Erebî _ Farsî)*, Tercme Qasm Bustanî, Ç1, Entîşarat Feqhî Ye, Tehran, 1373, r.849.

¹⁹¹. Helîma Xurşîd 'Ebidula, *Berawirdyeka Kêşnasî Dnavbera 'Erûza Kurdî û Farsî*, r.109.

de hatine vehandin û bi babetê mêrxasî û pesina mêraniya netewa 'ereb û stayşa kesên navdar hatine gutin, eger em li helbestên kilasîkya kurdî binêrîn dibîn (ev kêşe êke ji wan kêşên ku hatiye bi karînan lê jimara wan neya zore)¹⁹², kêşa recez ji van tefîleyan (mistifi'lin mistifi'lin mistifi'lin mistifi'lin mistifi'lin x2) pêk dihêt, ev kêşe hijmareka kêr dinav helbestên rojnama bizav de dihêne dîtin, mîna :

1. Receza (4) tefîla salim (mistifi'lin mistifi'lin) x2:

D. Mes'ud Kitanî dihelbesta xwe binavê "şuy nekey" ev qalb û kêşe bi kar înyaye:

Bêjne delalê şuy nekey

Daxêt dilê min nû nekey

Me jimêje dil yê xesteye

Hêj te divêt derman nekey??¹⁹³

__ b __ b __

Her weha dihelbesteka din de Sadiq Behaedîn li ser heman qalb û kêş nivêsaye:

Ji zehmetê ku raşeqîn

Têda besed rahet biçîn

Muštaqî hisana tenîn

Yareb tu durkey mihnetê¹⁹⁴

__ b __ b __

7.1.1.2. Kêşa Xomalî:

Ev kêşe bi kêşeka resena kurdî dihête hijmartin, berî kêşa 'erûzî dinav edebiyatên foliklorî da hebûye, her ji kevin de hozanvanan ev kêşe dihelbestê xwe bi karînyaye, hebûna gelek zaravan dizimanê kurdyê de û çend zarav ji bo vê kîşê peyda kirîne, behira pitir ji rexnegirên kurdî (kêşa pence) yan (kêşa birge) di mijarên xwe de hînyaye, 'Ela Edîn Secadî çend zarav bi karînyane jiwana (hîca, hînce, birge, pence)¹⁹⁵, ji bo êkgirtina zarevekê êkgirtî ta niha gelek hewl ji aliyê nivîser û rexnegirê kurdî hatine dan mîna Mihemed Bekir (çendîn zaravan direxneya kurdî bi kardînî û piraktîze diket digehîte wî encamî ku zaravê kêşa xomalî zêdetir cihê xwe digrît)¹⁹⁶, her weha Ehmedî derbarê vê kêşê dibêjî (dikêşên penceyî de hewceya wê heye jimareyên birgeyan wek hev bin)¹⁹⁷, ev kêşe li ser binaxê birgên cuda cuda dihêne danan û digel helbesta foliklorya kurdî li hev diken.

Ji aliyekê din hijmareka zora hozanvan li wî serdemî helbestên xwe li ser kêşên xomalî dinivîsîn, em dikarîn giringtirîn wan helbestan ewên ku li ser binaxê hijmara birgeyan di rojnama bizav de hatine vehandin çend mînakan piraktîze bikeyn, berî

¹⁹². 'Ezîz Gerdî, *Kêşî Şî'rî Kilasîkî Kurdî*, r.154.

¹⁹³. Mess'ud Mistefa Elkitanî, *Şuy Nekey*, R.B, J31, 27/2/1990, r.4.

¹⁹⁴. Sadiq Beha Edîn Amêdî, *Hozanvanên Kurd*, R.B, J2, 8/8/1989, r.5.

¹⁹⁵. Deqekanî Edebî Kurdî, *Weş Korî Zanyarî Kurd*, 1978, r.35.

¹⁹⁶. Mihemed Bekir, *b.n.b*, r.46.

¹⁹⁷. Ehmed Herdî, *Kêş Le Şî'rî Kurdî Da, K(Birayetî)*, J10, 1971, r.10.

em mînanan bidin hewceye em bêjîn bi rengêkê giştî kêşên helbesta kurdî ewên li ser binaxa hijmarkirina birgeyan hatine vehandin û navê kêşa xomalî li ser dibine dû cor:

7.1.1.2.1. Kêşên Sade:

Ev core kêşe bi sadeyî dihêne dîtin û bi tinê yekeyeka rîtmî binyatê wana pêk dihînin, divê kêşê de tinê sê yeke hatine bikar înan, pişt bi yekyên (3) birgeyî û (4) birgeyî û (5) birgeyî bestîne, ev kêşe dinav rojnama bizav zor kêr hatiye bikar înan: **Kêşa (4) birgeyî:** ev kêşe ji wan kêşîn ku giringyeka zor hey dinav helbesta kurdî, ev yeke dinav helbesta nuya kurdî bi awayekê berfireh hatiye bikar înan, her weha dinav rojnama bizav jî dihête dîtin:

Newzet Baletyî dihelbesta xwe de bi navê (zerya min) li ser vê kêşê vehandî ye:

Zerya minê

Ez çi bêjm

Ciwanya te

*Ez şêrîm*¹⁹⁸

Zer	ya	mi	nê
Ez	çi	bê	jim
Ci	wan	ya	te
Ez	şêrî	ki	rim
1	2	3	4

Dîsa Xazî Akreyî dihelbesta xwe li ser heman kêş vehandî ye:

Bo te welat

Bibim xelat

Ez lawê te

*Dîndarê te*¹⁹⁹

Bo	te	we	lat
Bi	bim	xe	lat
Ez	la	wê	te
Dîn	da	rê	te
1	2	3	4

Her weha 'Ebdurehman Teyb Bamernî dihelbesta xwe bi navê "Şîretvanukanê şîret" ev kêşe bi karînaye:

Rexêrî avê

Bo dihone

Digiwe şorin

Mejî hişkin

¹⁹⁸. Newezet Baletîy, *Zerya Min*, R.B, J40, r.4.

¹⁹⁹. Xazî Akreyî, *Viyana Welat*, R.B, J41, r.4.

Guh nadene
*Şîretvana*²⁰⁰

Re	xêt	a	vê
Bo	di	ho	ne
Di	guh	şo	rin
Me	jî	hiş	kin
Guh	na	de	ne
Şî	ret	va	na
1	2	3	4

7.1.1.2.2. Kêşên Lêkdayî:

Ev core kêşe her ji navê wê xuya dibît ji lêkdana dû kêşên sade yan zêdetir ev kêşe jê dirust dibît, her wekê Mihemed Bekir jî dibêjt: (ji lêkdana dû yekên rîtmî yan zêdetir dêk helbest pêk dihên)²⁰¹, û pişt bi yekeyên (3) birgeyî û (4) birgeyî û (5) birgeyî bestîne, bi evî rengê li xwarê:

A. Kêşa (6) birgeyî: ev kêşe dinav helbestên rojnama bizav de taradeyekî kêr hatiye bikarînan, bi rîtma (3+3) dirust dibît, mîna:

Helbesta Sebiryâ Hekarî bi navê "Ey welat" her dêr ji (6) birgehane pêk dihêt, bi rîtma (3+3) :

Ey welat serbazîn

Bi gazî daxazîn

Allate rengîne

*Bilindbû pêşve hat*²⁰²

Ey	we	lat		ser	ba	zîn
Bi	ga	zî		da	xa	zîn
Al	la	te		ren	gî	ne
Bi	lind	bû		pêş	ve	hat
1	2	3		1	2	3

(3) + (3)

Xald Sindurî di helbesta xwe de bi navê "Nêrgiz" ev kêşe bikarînaye, bi rîtma (3+3):

Nêrgiza latanî

Nêrgizî nêrgizî

Tu dilbera canî

*Mamzî mamzî*²⁰³

²⁰⁰. 'Ebdurehman Teyb Bamernî, *Şîretvanukanê Şîret*, R.B, J53, r.5.

²⁰¹. Mihemed Bekir, *b.n.b*, r.33.

²⁰². Sebiryâ Hekarî, *Ey Welat*, R.B, J42, 15/5/1990, r.7 .

Nêr	gi	za		la	ta	nî
Nêr	gi	zî		nêr	gi	zî
Tu	dil	be		ra	ca	nî
Ma	mi	zî		ma	mi	zî
1	2	3		1	2	3

(3) + (3)

B. Kêşa (7) birgeyî: ev kêşe êke ji wan kêşîn here giring ku dinav rojnama bizav de ku hijmare zora helbestan li ser vê kêşê hatine nivêsandin, ev cure bi du renga ji yekeya (3) û (4) birgeyî pêk dihêt, ew jî bi rîتما (4+3) yan (3+4) wekî van mînakên em berçav dikeyn :

Ev helbesta 'Ebdurehman Hacî de her nîv dêr ji (7) birgehane pêk dihêt, bi rîتما (4+3) :

Besse tu ne bişkure

*Dil her dê te hewînî*²⁰⁴

Bes	se	tu	ne		biş	ku	re
Dil	her	dê	te		he	wî	nî
1	2	3	4		1	2	3

(4) + (3)

Dîsa ev helbesta Xidir Îbrahîm Xidir li ser heman kêş hatiye vehandin, bi rîتما (3+4):

Çi caran paş nakevim

*Qet û qet ez narevim*²⁰⁵

Çi	ca	ran		paş	na	ke	vim
Qe	tû	qet		ez	na	re	vim
1	2	3		1	2	3	4

(3) + (4)

Dîsa Dayka Rîvîngî jî helbesta xwe bi navê "kême ez" li ser heman kêş û birge nivêsandîye, bi rîتما (4+3) :

Zêrim kiça kurdame

*Jimêj kanya derdame*²⁰⁶

Zê	rim	ki	ça		kur	da	me
----	-----	----	----	--	-----	----	----

²⁰³. Xald Sindurî, *Nêrgiz*, R.B, J42, 1990, r.5.

²⁰⁴. 'Ebdurehman Hacî, *Min Tu Vîyay Vîyay*, R.B, J12, 7/10/1989, r.5.

²⁰⁵. Xidir Abrahîm Xidir, *Hîvî*, R.B, J35, 27/3/1990, r.4 .

²⁰⁶. Dayka Rîvîngî, *Kîme ez*, R.B, J39, 24/4/1990, r.5.

Ji	mêj	kan	ya		der	da	me
1	2	3	4		1	2	3

(4) + (3)

C. Kêşa (8) birgeyî: ev kêşe bi rengê berfireh dinav helbestên rojname bizav de dihêne dîtin, binyatê vê kêşê ji dúbarebûna van yekên birgeyî (5+3) û (3+5) û (4+4) pêk dihêt:

Ev helbesta Tehsîn Îbrahîm Ehmed de her dêr ji (8) birgehane pêk dihêt, bi rîtm (4+4):

Jêra tu xu amadeke

*Hizira lêve bunê neke*²⁰⁷

Jê	ra	tu	xu		a	ma	de	ke
Hiz	ra	lê	ve		bu	nê	ne	ke
1	2	3	4		1	2	3	4

(4) + (4)

Dîsa Xeyrî Elyas 'Elî di helbesta xwe bi navê "Can û hozan" de her dêr ji (8) birgehane pêk dihêt, bi rîtm (3+5):

Min nevêt ava hêwanê

*Dê vexom rondikêt canê*²⁰⁸

Min	ne	vêt		a	va	hê	wa	nê
Dê	ve	xom		ron	di	kêt	ca	nê
1	2	3		1	2	3	4	5

(3) + (5)

Dîsa ev helbesta 'Ebdurehman Hacî de her dêr ji (8) birgehane pêk dihêt, bi rîtm (4+4):

Ger bizanî cana dilî

Ew çavên kesk pir ji kilî

Ez bê hizru bîr kirîme

*Da dest danye liser milî*²⁰⁹

Ger	bi	za	nî		ca	na	di	lî
Ew	ça	vên	kesk		pir	ji	k	lî

²⁰⁷. Tehsîn Îbrahîm Ahmed, *Ji Bizavê ra*, R.B, J24, 9/1/1990, r.5.

²⁰⁸. Xeyrî Elyas 'Elî/ Şêxan, *Can û Hozan*, R.B, J39, 24/4/1990, r.4 .

²⁰⁹. Bedil Mihemed Duskî Dihuk, *Ger Bizanî*, R.B, J21, 19/12/1989, r.5.

Ez	bê	hiz	ru		bîr	ki	rî	me
Da	dest	dan	ye		li	Ser	mi	lî
1	2	3	4		1	2	3	4

(4) + (4)

Dîsa Dr. Nafi' Akreyî dihelbesta "Dê mirim" de li ser heman kêş û birge vehadî ye, bi rîtma (4+4) :

Dê mirim ez, ez dê mrim
Kes nî ye bo min bigirî²¹⁰

Dê	mi	rim	ez		ez	dê	mi	rim
Kes	Nî	ye	bo		min	bi	gi	rît
1	2	3	4		1	2	3	4

(4) + (4)

D. Kêşa (9) birgeyî: ev core kêşe ji yeka (4+5) yan (5+4) pêk dihêt, ku dinav rojnama bizav hijmareka hozanvanan li ser vê kêşê helbestê xwe belav kirine:

Dr. Nafi' Akreyî helbesta xo bi navê "Bîka çar bira" li ser vê kêşê ve handî ye, bi rîtma (4+5):

Sînahî yek ji çavêt xira
Dê belav bît li hemî dir²¹¹

Sî	na	hî	yek	jî		ça	vêt	xi	ra
Dê	be	lav	bît	lî		he	mî	dî	ra
1	2	3	4	5		1	2	3	4

(4) + (4)

Her weha Niştîman Berwarî jî dihelbesta xwe bi navê "Nextên giran" de ev kêşe bi kar îname, bi rîtma (5+4):

Pare çavêt wan tarî diken
Qesru qusîra ava diken
Van evîndara jêkive diken
Rêka jîne lê berze diken²¹²

Pa	re	ça	vêt	wan		ta	rî	di	Ken
Qes	ru	qu	sî	ra		a	va	di	Ken
Van	e	vîn	da	ra		jêk	ve	di	Ken

²¹⁰. Nafi' Akreyî, *Dê Mirim*, R.B, J18, 28/11/1989, r.6.

²¹¹. Nafi' Akreyî, *Bîka Çar Bra*, R.B, J18, 28/11/1989, r.6.

²¹². Niştîman Berwarî, *Nextên Giran*, R.B, J45, 1990, r.4.

Rê	ka	jî	nê	lê		ber	ze	dî	ken
1	2	3	4	5		1	2	3	4

(5) + (4)

Salim Berojkî jî helbesta xwe binavê "Heyranuk" li ser heman kêş nivêsaye, bi rîtmê (4+5):

Eyda hecya li vê paîzê
*Ez xemilîm ji 'eşqa qîzê*²¹³

'Ey	da	hec	ya		li	vê	pa	Î	zê
Ez	xe	mi	lîm		'eş	qa	qî	zê	ez
1	2	3	4		1	2	3	4	5

(4) + (5)

E. Kêşa (10) birgeyî: êke ji kêşên fuliklorî yên kevin, bi awayekê ber fireh dinav helbestên fuliklorî da hatîne bikarînan, bi rêka dûbare bûna yeka (5+5) dirust dibît, ev kêşe jî dinav helbestên rojnama bizav de kêm hatî ye bikarînan:

Bêrîvan Kuvlî ev helbesta fuliklorî bi navê "Beyta şexraxa" ji zardevê dapîraxo wergirtî ye li ser vê hatî ye vehandin, bi rîtm (5+5) :

Kinarê şaxî fêrî gênkaxê
*Kiçkêt kiravya werne temaşê*²¹⁴

Ki	na	rê	şa	xê		fê	rî	gên	ka	şe
Kiç	kêt	ki	rav	ya		wer	ne	te	ma	şe
1	2	3	4	5		1	2	3	4	5

(5) + (5)

Her weha Deyk Î Babê Mêrxas, helbesta xwe bi navê "Bo bizavê" li ser heman kêş vehandî ye, bi rîtm (5+5):

Deyka mêrxasî mizgînî û silav
*Hate govendê rojnama bizav*²¹⁵

Dey	ka	mêr	xa	sî		miz	gî	nî û	si	lav
Ha	te	go	ven	dê		roj	na	ma	bi	zav
1	2	3	4	5		1	2	3	4	5

(5) + (5)

Karlînî Çaçanî, helbesta xwe bi navê " Kurekî qure" 'îdu babeşêx ji rênivîsa silavî veguhastî ye, li ser vê kêşê vehandî ye, bi rîtm (5+5):

²¹³. Salim Berojkî, *Heyranuk*, R.B, J45, 1990, r.4.

²¹⁴. Bêrîvan Kuvlî, *Beyta Şexraxa*, R.B, J 5, 5/9/1989, r.5.

²¹⁵. Dayk û Babê Mêrxas, *Bo Bizavê*, R.B, J34, 20/3/1990, r.4 .

Wekî dinêda tu rind hîn dibî
Çima dersada tu baş dimînî²¹⁶

We	kî	di	nê	da		tu	rind	hîn	di	bî
Çi	ma	der	sa	da		tu	baş	di	mî	nî
1	2	3	4	5		1	2	3	4	5

(5) + (5)

F. Kêşîn (11) birgeyî: wekî ya diyare vê kêşê du rewestan têda hene, ev kêşe ji dûbarekirina du yekên (4) birgeyî digel yekeyeka (3) birgeyî pêk dihêt.

S'îd 'Mir Çemankî helbesta xwe bi navê "Bizav" li ser vê kêşê vehandî ye, bi rîtm (4+4+3):

Çi bihare şîn kir şitla bizavê

Lime reşandî bêna vê gulavê²¹⁷

Çi	Bi	ha	re		şîn	kir	Şit	la		bi	za	vê
Li	me	re	şan		dî	bê	Na	vê		gu	la	vê
1	2	3	4		1	2	3	4		1	2	3

(4) + (4) + (3)

Dîsa mehmud mistefa yusif jî helbesta xwe li ser heman nivêsay, bi rîtm (4+4+3) :

Bizava ser bilind bote silava

Dirêkim her ji nêv cerg û hinava²¹⁸

Bi	Za	va	ser		bi	lind	Bo	te		si	la	va
Di	Rê	kim	her		ji	nêv	cer	gû		hi	na	va
1	2	3	4		1	2	3	4		1	2	3

(4) + (4) + (3)

G. Kêşa (12) birgeyî: her niv dêrek ji sê yeka pêk dihêt, ev kêşe ji dûbarekirina sê yeka (4) birgeyî pêk dihêt, ev core kêşe zorkêm dinav helbestên rojnama bizav hatî ye bikarînan:

'Edinan Mizurî helbesta xwe bi navê "Çavên wê" li ser vê kêşê vehandî ye, bi rîtm (4+4+4):

Peyvên wê jibîra min diben gazinda

Dibînim û dibînmeve gavên hinda²¹⁹

²¹⁶. Hozanêd Karlînî Çaçanî, 'Îdu Babeşêx Ji Rênvîsa Silavî Veguhastî, *Kurekî Qure*, J19, 7/12/1989, r.5.

²¹⁷. Se'îd 'Umer Çemankî, *Bizav*, R.B, J24, 9/1/1990, r.4 .

²¹⁸. Mehmud Mistefa Yusif, R.B, J43, 1990, r.5.

²¹⁹. 'Edinan Mizurî, *Çavên Wê*, R.B, J28, 6/2/1990, r.4.

Pey	vên	wê	ji		bî	ra	min	di		ben	ga	zin	da
Di	bî	ni	mû	+	di	bîn	me	ve	+	ga	vên	hin	da
1	2	3	4		1	2	3	4		1	2	3	4

(4) + (4) + (4)

H. Kêşa (14) birgeyî: ev kêşe ji çar yeka (4+3+4+3) pêk dihêt çar rewestanêwê hene, yan jî (rewestan li navenda wê daye 7+7)²²⁰, ev kêşe bi rengêkê zor kêmbin dinav helbestên rojname bizav de dihête dîtin.

Pîrê Bizavê, helbesta xwe bi nave "Newroz dîsan bi xêrhat" li ser vê kêşê vehandî ye, bi rîtm (7+7):

Bihare ba bi xêrbê li serçavê me newroz

*Ba kurd ji hev re bêjn bira cejna te pîroz*²²¹

Bi	ha	re	ba	bi	xêr	bê		li	ser	ça	vê	me	new	roz
Ba	kurd	ji	hev	re	bê	jîn		bi	ra	cej	na	te	pî	roz
1	2	3	4	5	6	7		1	2	3	4	5	6	7

(7) + (7)

I. Kêşa (15) birgeyî: ev kêşe di helbestên rojname de behira pitir li ser du binaytên rîtmî(4) û (3) hatine vehandin, ku di rojname bizav de li ser van birgeyan (5+5+5) yan (4+4+4+3) hatine belav kirin:

Firman Hemîd Silêvaney helbesta xwe bi navê "Awerêt yarê" li ser vê kêşê vehandî ye, bi rîtm (4+4+4+3) :

Min nehêlan gundu bajar limin helya guştê leş

*Ez digeryam şev û rojan, li dîv bejna tey keleş*²²²

Mîn	ne	hê	lan		gun	du	ba	jar		li	min	hel	ya		guş	tê	leş
Ez	di	ger	yam		şe	vû	ro	jan		li	dîv	bej	na		tey	ke	leş
1	2	3	4		1	2	3	4		1	2	3	4		1	2	3

(4) + (4) + (4) + (3)

J. Kêşa (16) birgeyî: ev kêşe di helbestên rojname de behira pitir li ser du binyata yekeya(4) û (8) hatine vehandin, ku di rojname bizav de li ser van birgeyan (8+8) yan (4+4+4+4) hatine belav kirin:

Mihemed 'Elî Kîsteyî helbesta xwe bi navê "Yara şîrîn" li ser vê kêşê belav kirye, bi rîtm (4+4+4+4):

Erê şîrîn 'eşq û evîn kîve revîn dil ma xemgîn

*Bax û bîstan ev gulistan bo kê hêlan ey nazenîn*²²³

²²⁰. Me'ruf Xeznedar, *Kêş Qafye Li Şî'rî Kurdî Da*, Weş (Elwefa), Bexda, 1962, r.45 .

²²¹. Pîrê Bizavê, *Newroz Dîsan bi Xêrhat, Rojname Bizav*, J34, 20/3/1990, r.8 .

²²². Ferman Hemîd Silêvaney, *Awerêt Yarê, Rojname Bizav*, J40, 1/5/1990, r.4.

E	Rê	şî	rîn		'eş	qû	e	vîn		kî	ve	re	vîn		dil	ma	xem	gîn
Ba	xû	bî	stan		ev	gu	lis	tan		bo	kê	hê	lan		ey	na	ze	nên
1	2	3	4		1	2	3	4		1	2	3	4		1	2	3	4

(4) + (4) + (4) + (4)

Her weha Hacî Mistefa Se'îd Kitanî "Penda qencînyê" li ser heman kêş vehandiye, bi rîtm (8+8):

Qed nebêje şertê mirinê pîrîyew 'emirê dirêj

Ger wesaba ne di mirdin can û cehêl û şîr pemêj²²⁴

Qed	ne	bê	je	şer	tê	mir	nê		pî	rî	yew	'e	mi	rê	di	rêj
Ger	we	sa	ba	ne	di	mir	din		ca	nû	ce	hê	lû	şîr	pe	mêj
1	2	3	4	5	6	7	8		1	2	3	4	5	6	7	8

(8) + (8)

7.1.1.2.3. Kêşa Azad:

Ev kêşe li dîv têgeha rojaveyan (fîreh verse) hatî ye danan, merem ji vê kêşê ew helbeste ewa pêgiryê bi kêş û ser wayê neket, anku serbestî yeka reha heye û di hindek rêzkan da dihête nivîsîn ku di bît dirêj bin yan kurt bin lidîv (zêtina rîtm serborî)²²⁵.

Di rojnama bizav de hijmareka zora helbestên azad hatine belav kirin, li vir de çend mînakên helbestên azad berçav dikeyn:

Kemal Remezan helbesta xwe bi navê "Hizar silav" bi awayekê azad nivîsaye:

Bila bixemlin peyv gelo

Bila bêjn û bêjn

Roj sal û heyv

Gulistanek tijî xewin

Baranek jî u mêdê kevin

Bizava me

Bîka peyv û hozana me

Serheland²²⁶

Her weha Ehisan Ne'man Mihemed jî helbesta xwe li ser heman kêş belav kirye:

Heru her digel tebam

Li mirinê

Gorê minjî

Dinav singê teba

²²³. Mihemed 'Elî Kîsteyî, *Yara Şîrîn*, R.B, J 17, 21/11/1989, r.4.

²²⁴. Hacî Mistefa Se'îd Kitanî, *Penda Qencînyê*, R.B, J 52, 1990, r.4.

²²⁵. Yasr Hesên Mihemed Tahir, *Binyatê Rîtmî Diş'ra Nûya Kurdî Da (Devera Behdînan 1970_1991)*, N.M, Zanîngeha Dihukê, Kolîja Adabê, Dihuk, 2006, r.43.

²²⁶. Kemal Remezan, *Hizar Silav*, R.B, J12, 7/10/1989, r.5.

Belkî

Li duniya dî

Beheştê min

*Dozexa min herto bay*²²⁷

Dîsan Qesî Hesên jî helbesta xo bi navê "Daweta xunavê" bi awayekê azad belav kirye:

Ey xunav!!...

Bêje min..

Kengî dewata teye!!...

Min zanî nukeye..

Kenkena...kolîlka

Jîna bihara teye

Lezgîni...aşqî

*Jimêjeye*²²⁸

7.1.2. Helbesta Nû:

Digel serheldana helbesta nû gelek guhrîn bi ser helbesta kilasîkî ya kurdî hatin û helbesta nû cihê xwe di cihê serwaya hemereg û stûnî de girt, her weha êketya babetî dihelbestê de peydabû.

Demê em bas li helbestên nû yên rojnama bizav dikeyn ku pitir digel taybetmendiyên zimanê kurdî ve girê dayne, ku kêşên xumalî pitir digel siruştê zimanê kurdî li hev diken .

Helbesta nû ya kurdî ji encamê kumeka hokara peyda buye wekî pêdivya gihurînin serdemê yên civakî û ramiyarî û rewşenbîrî, her weha (li encamê bilindibûna hestê niştimanî û netewayetî peydabûye)²²⁹, ev hokare bûne faktor ku hozanvanê kurd aşinayê digel edebê cihanî biket û pê karîgerbît, bi vê awayî helbesta nû ya kurdî jî pêngavên xwe yên destipêkê berev nûkirinê dibwarê helbestê de havêtin .

Ji aliyê ruxsarê jî ve helbesta nû bi wêrane hozanvanên vê sedê bîstê karî xu ji wan qalb û kêşên helbestên kevin rizgarbiken û qalbekê nû berhem bihînin, ew nivîserê bas li helbesta nû ya li ser tefîlê kirî ye û cuda kirî ye ji helbesta rêkxistî ya 'erûzî û diyar kirî ye ku helbesta serbesta tefîleyî, musîqa yan rîtmê helbestê diparêzît, ji aliyekê din nûkirina bineretî ye bo form û naveruka ş'rê û ya giring lidef me regezên ruxsarîne ku ji nûkirina ziman û wêne û kêş û serwayê di pêkhatîne, zêdebarî bikar înanaxalbandyê bi renekê ciwan û berçav, ku ciwanyeka dî ya taze daye ruxsarê helbesta nû ya kurdî cuda ji kilasîkî wekî divan xalên jêrda cudahî û guhrîna wana diyar dibît:

²²⁷. Ehsan Ne'man Mihemed, *Dîmahîk û Berahîk Hertoy*, R.B, J35 , 27/3/1990, r.4.

²²⁸. Qesîm Hesên, *Dewata Xunavê*, R.B, J33, 13/3/1990, r.4.

²²⁹. Kamîran Mihemed Nebî, *Cêgey Ehmed Nalbend Leşî'rî Nwê Î Kurdî Da*, N.M, Zanbingeha Selahedîn, Kolîja Adabê, Hewlêr, 1999, r.23 .

- A. Ziman:** dihelbesta kilasîkî de zimanekê giran bi xove digrît, lê ya nû (zimanekê resen û xomalî bikar îname, nizîk ji zimanê rojane yê axiftinê ku hemî xelk bi hisanî bikarin têbgehî û meremê xwe bigehînte kumelgehê)²³⁰
- B. Wêne:** helbesta nû ji qalbê rewanbêjî derçûye berev wêneyên hizirî cevengî yên aluz hatine berceste kirin.
- C. Kêş:** guhrînên mezin keftine dikêşa ş'ra nû da, hozanvanên kurd taqîkirinên nû bi ser kêşên helbestan dahênan)²³¹, anku kêşê cuda û kêşê azad bi karhatin .
- D. Serwa:** guhrînên berçav ketine nav serwayê çendîn curên nû jê peydabûne mîna serwaya hemereng û helbestên bê serwa bi taybetî dihelbestên serbest de.
- E. Xalbendî:** karînana xalbendiyê bi rengê ciwan û berçav, sîmayekê tazeye di ruxsarê helbesta nû de ku pê dihête cudakirin li helbesta kilasîkî.

Helbesta nû ya kurdî bi peyrewkirina van xalan nûkirinê sîmayê xwe yê taybet wergirtî ye çunkî milletî kurd herdem hej ji gorankaryan diken diher biyavekî dabît, dirojnama bizav de gelek helbestên nû berçav dikevin, mîna:

Dr.Nafi' divê helbestê de bi navê "peyv" dibêjî:

Lidîf peyvekî min kire xar
Wekî rojê dibirqî
Hindek cara jî gemirî
Ruymetê wê yê ciwan...aşkirabû
Hîvya min girtinawê bû
Da li ristika huzana minda cêgîr bibît
Ez nêzîk bûm
Ez rakêşam
Dinav tilêt minda teqî
Lê pa ez avakirmeve
Ew peyv... Welat bû
*Ew peyv ... Niştiman bû*²³²

Dîsan 'Ebidurehman Hacî dihelbesta xwe de bi navê "Min tu viyay û viyay" de dahênan kirî ye û bêjî:

Besse tu ne bişkure
Dil her dê te hewînît
Kenîya te agre
Cerg û dila sujînît
Min to viyay viyay
Kar mambiza nav çiyay
Yar to ew renga çiray
*Kes neşêt bivemrînît*²³³

²³⁰. Kamîran Mihemed Nebî, *Cêgey Ehmed Nalbend Leşî'rî Nwê Î Kurdî Da*, r.21_22.

²³¹. Perêz Sabîr, *Rexney Edebî Kurdî û Meselekanî Nwêkirnewey Şî'r*, Weş Wezaretê Perwerde, Hewlêr, 2006, 369.

²³². Nafi' Akreyî, *Peyv, R.B*, J18, 28/11/1989, r.3.

7.1.3. Helbesta Nûxaz:

Helbesta nûxaz bo cara êkê li ewupa derket, nûxazî bizavek bu li hemberî wan şêwazê kevin û kelturên kevin ev çende êk ji binemayên helbestên nûxaz ku (hozanvan neşêt çemkekê nuyê helbestê ava diket heta çemkên kevin dinavxuda têk neşkênît)²³⁴, nûxazî bi retkirina ruxsar û naveroka kevin mîna babetekê nû hate nav meydana edebî kud bît xu ji yasayên kevin biparêzît, ev çende li dev "budilêr"î bi başî derdikevît demê derbarê nûxazyê dibêjît (nûxazî ew tişte ku zu jinav biçît û derbaz bibît)²³⁵, anku nebîte yasa di peyrewkirina helbestê de, her weha dibît huzanvanên nûxaz giringyê bi demekê diyar kirî biden û berdewam nebît.

Helbesta nûxaz hemî tiştê ret dikir ku bibine egerê lasayî kirinê û bêne bi karînan wekî yasa, nûxazî taybetmendiyeke di dete efsanê ku mîna sembulê bihête karînan ku zemenê niha û burî û ayinde piraktîze biket ku ev çende dijî rêbaza kilasîkî ye.

Huzanvanê nûxaz baweryeka temam bi xudiyet û take kesyê heye lidîv hizru bîrê xwe helbestan dinivêsn (bi çi şeweyan dinivêsnê xwe de naçîne jêrbar û binyatekê civakê giştî helbestê wana tinê morkê kesayetî heldegirê)²³⁶, bi vê çendê ciwanî dikevin de ya sinur darkirî bû, ta ji wî qalbî derkevin her nivîserek lidîv hizru bîrê xwe bi azadane binivêstî dişê derbirînê ji her tiştê biket.

Ji aliyê ruxsarê ve jî merema huzanvanî di ruxsarê dernakevît, çunkî dibît xwendevan biçîte nav cergê helbestê peyvan şirove biket û zimanê van helbestan wî demî dest pê diket demê ferheng bi dumahîyî dihê lewra gelek caran dibînîn huzanvan bi çendîn peyvên di ruxsarê de gelek jêk diwrîn wênêkî dirust diket û dinêrîna êkê û serpe de dijayetî yeka zor dinavbera wan peyvan de diyar dibît lê demê ew peyv lidîv delaletên wana dihêne şirovekirin, diyar dibît ku lêkçûn dinavbera wan da heye û wêne jî wêneyekê bê hêze, lê pêtivî bi şarezayî û şîyanên şirovekirinê ye da ku meremên hozanvanî derkevin, her çende ev kare dibîte egerê dirustbuna temu mijyê dinav helbestê de lidef xwendevanê xudan şarezayeka kêma û aluzî û bêzaryê ji bo dirust diket û bu xwendevanê şareza xoşyê dirust diket û tamê jê werdigrît, dirojnama bizav de gelek helbestên nûxaz berçav dikevin, mîna:

Mehsin Quçan helbesta xwe de bi navê "Bun" dibêjî:

Dîwarêd me ravêd lêy dihên

Yêd buyne tik û keliştuk

Hêstir bi barve têra dihên

Heku sîvank ser sîvanda

Xu dihelavên

²³³. 'Ebdurehman Hacî, *Min Tu Viyay Viyay*, R.B, J12, 7/10/1989, r.5.

²³⁴. 'Îmad Weyî Xald, *Ceveng Dihuzana Riyalîstîka Kurdî Da (Devera Behdînan 1970_ 1991)*, Weş Wezaretê Perwerde, Hewlêr, 2004, r.117.

²³⁵. 'Ebdurehman Mihemed El 'Qud, *El Ebham Fî Ş'ri El Hedase*, El 'Ewamil Wel Mizhar Wel Alyat Eltawîl, 'Alem Elm'rfe, Kuyt, 2002, r.81.

²³⁶. Bextyar Secadî, *Rexney Edebî Hawçerx*, Ko (Raman), J54, Dezgehê Gulan, Hewlêr, 2000, r.30.

*Yan dihejiyên*²³⁷

Her weha Selman Kuvlî dihelbesta xwe de bi navê "Têkivedan" nûxazî bikarînaye:

Careka dî mame bitinê

Linav çar dîwarêd zîndanê

Karê min bu têkivedana

Xurt û mirtêd paxla canê

Min nezanî evru ew roje yad tirsiyam

Dehbe ji dîwarî derkevin

Bêne min

*Erê têkivedan kanê..?*²³⁸

7.1.4. Serwa:

Serwa êke ji regezê here giringê helbestê ye rolekê giring dipêkhînana mozîka derekî ya helbestê û kêşê de heye, hebûna serwayê dihelbestên kilasîkî de mercekê serekî ye, merem ji peyva serwa ji aliyê ramana wê diferhengê de li du birgan pêk dihêt (ser)bi ramana (reis) digel (wa)çi ramana nadet, dizimanê 'erbî de peyva (Elqafye) bi ramana (weqîf _ rewistan)²³⁹, hatine bi karînan.

Serwa bi tinê li dawaya malkê de dernakevît belku gelek caran dengê serwayê dikevîte navenda dêre helbestê, ku (birîtî ye ji wî dengî yan komeka dengaye, ku hinek car bi birge û car bi tîp amaje bo hatiye kirin, li dawyê peyvên serwadar dúbare debîn ev çende bi taybetî li dumahîka malkê de hinek caran jî li navendê de dihêt)²⁴⁰, her weha derbarê pînaseyên serwayê gelek bîru boçûnê cuda cuda hene, (Xelîl) bi boçûna wî hevdje digel 'Ezîz Gerdî û dibêjî (serwa ji tîpa dawya malkê de diyar û dirust dibît)²⁴¹, lê bi boçûna Exfeş (serwa peyva dawya malka helbestê ye belge jî bo vê çendê demê em li helbestekê dinêrîn peyva dawyê diher dêrekê de dikevîte berdest ji bilî vê çendê navên din nî ne)²⁴².

Bi awayekê giştî gelek pênaseyên cuda cuda ji bo serwayê hatine kirin û her êk lidîv boçûna xwe pênase kirî ye, hindekan serwa mîna êk tîp hijmartî ye, û hindekên din dibêjin: (serwa komeka tîpane li dawya her dîrekê û ya pêkhatî ye ji rawestanekî li dawyê û rawestana berî dawyê, her weha ew tîpên dikevîne dinavbera dêran û tîpa livuk ewa dikevîte berî rawesîtana dawyê)²⁴³, li dawyê de em dikarîn bêjîn serwa birîtî ye li havber kirina dû beytê ş'ri, yan zêdetir ji dû pîtan de, yan jî dikarîn bêjîn dû nêv dêr yan zêdetir dawî bi tîpek û dû tîpê wek hev dêt, lê di helbesta nû de sîstemê serwaya kevin ladaye core serbestyek ji bo hozanvanî berhem înaye.

²³⁷. Mehsin Quçan, *Bun, R.B*, J25, 16/1/1990, r.4 .

²³⁸. Silman Kuvlî, *Têkvedan, R.B*, J 11, 10/10/1989, r.4.

²³⁹. 'Ebdulla Dartaş, *Qafye Nêwan Serwa û Serwest Da*, Ko (Beyan), Dezgehê Rewşenbîrî û Belav Kiryên Kurdî, J 116, 1986, r.23_24.

²⁴⁰. 'Ezedîn Mistefa Resul, *Edebyatî Nuy Kurdî, Weş Fêrkirdinî Bala*, Hewlêr, 1989, r.177.

²⁴¹. Yusif Mihemed, *Fî El' eruz Wel Qafye*, El_teb'e El_sanî, Dar El_mnahil Lîltîba'e Wel Neşr Wel Tewzî', Beyrut, 1990, r.29.

²⁴². Sefa Xelusî, *Fen Elteqtî' Elşe'ri Wel Qafye*, r.213.

²⁴³. Yusif Bikar, *Fî El' eruz Wel Qafye*, Teb'e 3, Elnaşr Dar Elminahil, Beyrut, 2006, r.26.

Giringya serwayê di hemî ziman wek hev nî ye hindek zimana serwa tu ne ye mîna girîka, lê di hindek zimanê din de mîna zimanê 'ereba hewceyeka zor pê hebû, belê dizimanê kurdî de her ji kevin ve serwa dihelbestên xwe yên fuliklorî û millî û dastana de li ş'rên hozanvanên navdar hatine bikarînan lê dihelbestê niha jî de kêmta zor dihêne dîtin bi taybetî dihelbestên rojnama bizav de.

Serwa dihelbestên vê rojnamê de dabeş dibine ser çendîn corên cuda cuda çunkî muzîka helbestê lidîv babetên hemecor dihête guhrîn, serwa çarçuvên heme cor werdigirin, bi rengê giştî serwa dibine dû cor:

7.1.4.1. Serwayên Êkgirtî:

Merem ji vê coreyê ewe hemî helbest li ser êk serwa dihête nivêsin, her weha (ew parçe xezel û qesîde digrîteve ku hemî malkên helbestê li ser êk serwa bin)²⁴⁴, anku hozanvan her ji destipîka helbestê heta dawiyê pêgiryê bi êk serwayê diket.

Ev serwa êkgirtî ya ber niyase li dawaya hemî dêran de yek core serwa dúbare dibîteve bêy ku çi gorankarî têde rûbiden ta sîstemê serwayê wek hev bît nehête gohrîn, ev core serwaye (şewê wê li 'ereban hatiye wergirtin)²⁴⁵, hozanvanên kilasîkyê kurd jî helbestên xwe li ser vî core serwayê vehandine.

Serwaya êkgirtî dinav helbestên kilasîkî de mîna desturek hatbû danan, dibû hemî hozanvanên kilasîkî vê serwayê dihelbestên wana de bihête peyrewkirin û bice înan, ev core serwaye dihelbestên rojnama de bi awayekê ber fireh hatiye bi karînan, mîna : Hisin 'Elî Erdenî helbesta xwe bi navê "Dihoka min" li ser vî corê serwayê nivêsaye, her ji destipêkî heta dawiyê bi vê rengî ye serwayê wê (în)e :

Dihokamin şarê rengîn

*Tuîy şana pir hingvîn*²⁴⁶

Tehsîn Îbrahîm Duskî helbesta xwe binavê "Ketim benda evînê" li ser vî corê serwayê nivêsaye, û dibêjî:

Ketim benda evînê no mezu pişt û kemer besta

*Meserda ber derê barê vewestam dest li ser desta*²⁴⁷

Her weha 'Ebudlislam Şîx Memduh helbesta xwe li ser vê serwayê nivêsaye, destipêka wê dibêjî:

Esmerî ser dara cana xal û xet miskê teter

*Ziyareta her du reqîban her wekî eswed hecer*²⁴⁸

Di evî corê serwayê de hozanvan diher nîv dêreka helbestê de corekê serwayê bikar dihînin.

²⁴⁴. 'Ezîz Gerdî, Serwa, *Lêkolîneweyekî Şîkarî Berawirde Le Şî'rî Kurdî Da*, Ç1, Dezgehê Aras Bo Bilav Kiryên, Weş Wezareta Rewşenbîrî, Hewlêr, 1999, r.105.

²⁴⁵. Me'ruf Xeznedar, *Kêş Qafye Li Şî'rî Kurdî Da*, r.58.

²⁴⁶. Hesên 'Lî Erdenî, *Dihuka Min, Rojnama Bizav*, J18, 28 /11/1989, r.5

²⁴⁷. Tehsîn Îbrahîm Duskî, *Ketim Benda Evînê, Rojnama Bizav*, J25, 16 /1/1990, r.4.

²⁴⁸. 'Ebdulselam Şêx Meduh, *Hozanvanê Resen û Pêvehatî, Rojnama Bizav*, J39, , 24/4/1990, r.4.

7.1.4.2.Serwaya hemereng:

di helbestên hozanvanên qonaxa kilasîzmî nû jî de peyrew kirine, merem ji vê serwayê (ew serwaye ku diher helbestekê dihête guhrîn, anku hemî serwayê wana wek hev nabin çend serwa dinav dane)²⁴⁹, ev core serwaye ji encamê karvedanek bû li hemberê sîstemê kevin yan bêjîn bêzarbûn ji dûbare bûna êk core serwa hate ser heldan.

Divê core serwayî pitir hozanvan karîn derbirîne ji hest û sozê xwe biken çunkî eve dibîte eger ku hozanvan bikarin dahênanê biken û hewla tabiloyekê tijî hest berçav biken, evê serwayê gelek corê wê hene emê hindekan ewên ku dirojnama bizav hatine bi karînan ber çav bikeyn:

A. Cût serwa (mesnewî): ev zarave ji bo wan helbestan dihête karînan ku herdû niv dêr heman serwa bin, serwaya wana ji malkekê bo yeka din bihête guhrîn (mesnewî regezêkê diyare dihelbesta farsî de hozanvanên fars hewla ji rêka vê serwayê xwe li serwaya êkgirtî rizgar biken, ev core bi rêjeyeka zor dinav rojnama bizav hatine belav kirin, mîna:

Tehsîn Îbrahîm Ehmed helbesta xwe bi navê "Ji bizavê ra" li ser vê serwayê nivêsaye :

Nê bizava min û teye.....A

Tev berê bizava meye.....A

Bexçeke gul têde zorin.....B

Zer û mor û kesk û sorinB²⁵⁰

Her weha Sebiryâ Hekarî jî helbesta xwe bi navê "Spêdeya hemî roja" bi heman serwa belav kirye:

Dilê we naêşînim.....A

Gutina we dê bicih înim.....A

Xudê hewe bihêlît.....B

Jîna hewe neşêlîtB²⁵¹

B. Sêyne: ev core jî ji sê niv dêre helbesta pêk dihên ku her sê yan êk serwa hebît yan cuda bin,'Ezîz Gerdî derbarê vê serwayê dibêjî: (sêyne ji sê parçeyên biçûk pêk dihêt, ji sê niv dêran pêkdihêt ku serwaya wana cuda cudaye, dibît jî bi tinê bî û ramana xwe bidet her weha dibt jî helbest parçe parçe bît ew parçe jî yeksan bin yan ne)²⁵², her çende behsa sêyne kê di mijarên edeba kurdî hatiye kirin zêdebarî vê çendê jî car car dihelbestê mîllî û fuliklorî dirojnama bizav de dihête dîtîn:

Bêrvan Kuvlî divê helbesta fuliklorî de bi navê "Beyta Şekraxay" bi awayî sêyne ji zardevê dapîra xwe wergirtê ye û belav kirye:

Kinarê şaxî fêrî gênkaşe.....A

Kiçkêt kiravya werne temaşeA

²⁴⁹. Me'ruf Xeznedar, *Kêş Qafye Li Şî'rî Kurdî Da*, r.62.

²⁵⁰. Tehsîn Îbrahîm Ehmed, *Ji Bizavê ra, Rojnama Bizav*, J24, 9/1/1990, r.5.

²⁵¹. Sebiryâ Hekarî, *Sipêdeya Hemî Rojê, R.B*, J12, 17/10/1989, r.7.

²⁵². 'Ezîz Gerdî, *Serwa*, r.198.

Şerê şexraxay ligel mîru paşaB²⁵³

Her weha Se'îd 'Umer Çemankî helbesta xwe bi navê "Bizav" bi vî awayê belav kirî ye :

Bizav parçe 'ewrê befîru baranê.....A

Li hindavê warê min kete geryanê.....A

Li gel çiya kete denge û reng vedanêA²⁵⁴

C. Çarîne: hunerê helbestê ye, 'Ezîz Gerdî dibêjî (çar nîv dêrin û kêş û serwa taybet bi xove hene, her parçek meremeka taybet heye, gelek caran parçeyek bi ser hemî helbestê de dizivrît)²⁵⁵, gelek ji jêderan ev corey vedigêrin ji bo edeba farsan ku bîst çar liq kêş li bexra hezec înayne der.

Çarîn dedeba kurdî de vedigere ji bo serdemê babetahîrî hemedanî hatine bi karînan û bi çendîn cor û qalban hatine nivêsandin, çarîn dirojnama bizav bi rêjeyeka zor hatine û bi qalbên cuda cuda, mîna:

Xald Hirurî dihelbesta xwe bi navê "Bizav" bi awayê çarîn nivêsandî ye, çar nîv dêrn her çara êk serwa heye:

Bizav babê hemî mila.....A

Bizav baxê hemî gula.....A

Bizav bêje hemî dila.....A

Bizav bêje hemî dilaA²⁵⁶

Her weha Bedel Mihemed Duskî helbesta xwe bi navê "Ger Bizanî" bi vî awayî belav kirî ye:

Ger bizanî dil birînimA

Bicanyate haru dînim.....A

Desta bilindikey û bêjîB

Ejî digel te bevînimA²⁵⁷

Her weha Cemîl Mihemed Şîlazî helbesta Feqê Teyran belav kirî ye:

Xudawend guneh karim.A

Bi heqqê zatê ekber key.....B

Pelêti mucbê nairim.....A

Bi wê rewza munewerkeyB²⁵⁸

Her weha Dayka Rîvîngî helbesta xwe bi navê "Kîme Ez" bi vî awayî belav kirî ye:

Zîna memê alame.....A

Rewşa hemî malame.....A

Buyka serê salame.....A

Nevya ceger xwînim ezB²⁵⁹

²⁵³. Bêrîvan Kuvlî, *Şekiraxa*, R.B. J 5, 5/9/1989, r.5.

²⁵⁴. Se'îd 'Umer Çemankî, *Bizav*, R.B. J 49, 9/1/1990, r.4.

²⁵⁵. 'Ezîz Gerdî, *b.n.b.*, r.204

²⁵⁶. Xald Hirurî, *Bizav*, R.B. J12, 17/10/1989, r.5.

²⁵⁷. Bedil Mihemed Duskî Dihuk, *Ger Bizanî*, R.B. J21, 19/12/1989, r.5.

²⁵⁸. Cemîl Mihemed Şîlazî, *Helbesta Feqê Teyran*, R.B. J 41, 8/5/1990, r.5.

²⁵⁹. Dayka Rîvîngî, *Kîme Ez*, R.B. J 39, 24/4/1990, r.5 .

Her weha Sadiq Behaedîn Amêdî helbesta xwe bi vî awayî nivêsandî ye:

Dema ewel bezehmet buA
Cemala têna xwînê.....B
Bete'buren cu azarî.....C
Cek û derdu dê razî buA²⁶⁰

D. Pêncîne: ev core parçeyeka kurte li pênc niv dêran pêkdihêt, bi dabeşbûneka cuda serwa û kêşî serwa dihêne nivêsandin, Marf Xeznedar dibêjî (ev core di edeba kilasîkiya jimareka zora netewên bisilman de heye)²⁶¹, her weha 'Ezîz Gerdî jî behsa vê corey kirî ye di edebên netewên din de û bêjî (parça pêncîne gelek qalbên cuda cuda hene)²⁶², parça pêncîne dinav rojnama bizav jî bi çendîn qalbên cuda cuda hatine belav kirin, emê çend mînanan bidîn:

Misawat Hesen dihelbesta xwe de ev core peyrew kirî ye:

Nê em evîn darîn gelek.....A
Bu çavêt reş û belekA
Me ji we divêtin diltek.....A
Bes rojekê yan şevê.....A
Li me biburt felek..!A²⁶³

Tehsîn Îbrahîm Duskî helbesta xwe bi navê "Ketim Benda Evînê" bi qalbekê din belav kirî ye:

Li yarî şahî û cejne demê yar lê bi dêm geş tê.....A
Çiye êş û çine kuyan newî nasî ne lê meş tê.....A
Nehuîy lew birîndaru li te êxbal qewî reş tê.....A
Çima ey yusivî êdî nema xandin li te xwe ştê.....A
Şev û roja diçî wî li va rubar û va bestaB²⁶⁴

E. Şeşîne: ev corê helbestê şeş niv dêrê wê hene serwayêt wana bi awayê cuda cuda dabeş dibin, (şeşîne dedebê Rojhelat û rojava de bi kar hatî ye)²⁶⁵, di rojnama bizav de çend helbest bi vî awayî berçav dikevin, mîna:

Mihemed Emîn helbesta xwe bi navê "Selaya Şevê" bi vî awayî vehandî ye:

Gelo rabin zeman tenge.....A
Xewa cehilê weha renga.....A
Mehu û kirina wê bê denge.....A
Temaşe halê kewê şenge.....A
Xwedaya dijminan cengeA
Jixew em têr nebûn yarebB²⁶⁶

²⁶⁰. Sadiq Behaedîn Amêdî, *Hozanvanên Kurd*, R.B, J2, 1989, r.5.

²⁶¹. Marf Xeznedar, *Li Babetê Mêjûy Edebî Kurdîyewe*, r.184 .

²⁶². 'Ezîz Gerdî, *b.nb*, r.219.

²⁶³. Msawat Hsin, *Evîn Darm Wek Memê*, R.B, J28, 6/2/1990, r.4.

²⁶⁴. Tihsîn Abdirahîm Duskî, *Ketim Benda Evînê*, R.B, J 25, 16/1/1990, r.4.

²⁶⁵. 'Ezîz Gerdî, *b.n.b*, r.235.

²⁶⁶. Mehmed Emîn, *Selaya Şevê*, Şewket Tahir Sindî, Ji Latîni Veguhastî Ye, R.B, J 40, 1/5/1990, r.

F. Heştîne: ev core jî ji heşt nîv dêran pêk dihêt bi çend qalb û kêşeyan dinav rojnama bizav hatî ye belav kirin, serwaya vî corey jî bi awayê cuda cuda dabeş dibin, mîna:

Emîn Buz Arselan divê helbestê de bêjî:

Neku bilbil diket efxan.....A
Nexêr! New nareya walan.....A
Suran cumile serhespan.....A
Ji bo rimbazî û meydan.....A
Cirîde bikin wekî şêran.....A
Ku roja şadiya kurdan.....A
Bizanın sahbêt îz'an.....A
Ne'îde, belkî sersaleB²⁶⁷

Dîsa Hemdî 'Bdulmecîd dihelbesta "Kul û Dêrdê" de dibêjî:

Kul û derdê evî çaxî hemû pêkive kirin tutak.....A
Birin paşve hezar sala gelo ma kanî ew runak.....A
Serê rêka li me girtin nehiştin em bikin çalak.....A
Çima em man weha bê hiş jibîra xwe me birêw makA
Ezê çi bikim jivan mêra ku çawa xu kirin qirîk.....A
Dinav îla dinav qewma diyarbu wa çi kir. Firdik.....A
Hema pare hebin ew kes nenasin wan divê herzik.....A
Tijîke wî zikî axê heta dimrê dixwê hindikA²⁶⁸

7.1.5. Zimanê Helbestê:

Ziman helbestê dihere qonaxekê de sîmayê taybetê xwe heye, ziman weka keresteyekî serekî ye, em dikarîn bibêjîn ziman (Riha) helbestê ye, çunkî hozanvan bi rêka ewî zimanî peyam û babetên xwe bi awayekê balkêş ji bo xwendevan berhev diket.

Ziman mîna her tiştêkê dinê jiyanê lipey guhrînên serdemê xwe sexletên nû bi xove digrît, ziman hozanvanekî digel yekê din cudaye her hozanvanek li gorî têgehiştina xwe bo civakî helbest nivêsaye, ji destpêka peydabûna zimanê helbestê diyardeka nû bûye, hozanvanên kilasîk herdem hewl diden berhemê xwe ji bo mirovayetyê binivîsîn, herçende li wî demî hijmareka zora xelkî li wî astî da nebûn ku ji zimanê hozanvanên bilind bigehin ku zimanekê rojaneyê xelkî nebû²⁶⁹.

Zimanê helbestan ji aliyê hozanvanên kilasîkî zimanekê taybetî ye anku em bêjîn zimanekê cudaye ji zimanê axiftinê, her weha rexnegirên edebî jî her êk bi êk çav nanêrin zimanê helbestê belku her êk bi dîtin û şirovekirina nû û cuda dihelsengîn.

²⁶⁷. Şewket Tahir Sindî, *Sersal, Rojnama Bizav*, J 34, r. 7, 20/3/1990, Ev Hozane Li Guvara Jîn Hatye Wergirtin J14, Emîn Buz Arselan, 9adar 1919newroz.

²⁶⁸. Hemdî 'Bdulmecîd, *Kul û Dêrdê, R.B*, J25, 16/1/1990, r.5.

²⁶⁹. Kamîran Mihemed Nebî, *Cêgey Ehmed Nalbend Leşî'rî Nwê Î Kurdî Da*, r.170.

Helbesta kurdî bi dirêjahya dîroka xwe ya ş'îrî (çend rêbazên nwêxazî û dahênanên nû bi xove dîtine, zêdebarî wê çendê ku bandorya edeba cîhanê bi ser edebê ve hebû bi taybetî edeba 'erebî û farsî û tirkî)²⁷⁰, ev bandorya edeba cîhanê jî bo demekê gelek dirêj vekêşa û cudahya wana bi hisanî nahêt kirin, eger neteweyek bi dirêjahya van hemî salan ji bin destê vane dabû bît guman têda nî ne ku bikarît xwe jî cuda biket.

Edeb bi giştî û helbest bi taybetî bi dirêjahya dîrokê qunaxên cuda cuda derbazkirî ye diher qonaxekê sîmayên taybet bi xove hebî ye, lê diher hemyan de ziman mîna regezê sereke dahênana edebê bûye, digel tazebûneva helbesta kurdî zimanê helbestê kefte goranê (zimanekê nû hate nav ew ziman bi temamî li jêr bandora romantîkiya da bû, ku li pal peyva kurdî da pîrbûn ji peyvên turkî)²⁷¹.

Hozanvanan ji bilî ruxsar û naverok girîngyeka zor bi zimanî daye, ev nû kirineve mîna (ruxsar û naverok girtineve diheman dem jî de zimanê helbestê guhurî)²⁷², di wan salên rojname bizav têde dihate belav kirin zêdetir zimanê helbestê beref kurdiyeka resen diçû, hijmareka zora helbestan divê rojnamê hatine belav kirin dabeşê ser dû coran dibin:

A. Helbestên hozanvanên kilasîkî mîna (Xanî û Cizîrî û Feqê Teyran û 'Elê Herîrî) Digel wan hozanvanên li ser heman rêbaz dinivîsî.

B. Helbesên hozanvanên hevçerix rojname bizavê ku bi bîru boçunî nû û ziman û teknîkeka nû dinivîsî, ev jî du cor bûn, êk heman ziman bi kardîna ku dihelbesta kilasîkya kurdî bigiştî hatbû karînan, du ev core cihê girîngî pêdanê ye çunkî helbestên wî demî xodîkên kawdanên wî demê Kurdistanê bûn, ew dem kîmya baran û derbeder û enfal kirin rojane bi ser gelê me dihate encam dan, hozanvanan li hemberî van derdu nehametyane bi helbestên xwe bi bûne hêma sembol ji bo hişyar kirina milletê xwe bi vî hunerê sade vekirî gazî dikir têbkuşn û bxunin destê hev bigirin.

Ji bo hênanedî van armancan hozanvanên helbest mîna çekekî girtbû dest û bi zimanekê resenê kurdî xelkê xwe pê agehdar dikirin, ev diyarên hanê bi awayekê berçav dihelbestên rojname bizav dihêne dîtin, mîna:

Ehmed Şuşî dihelbesta "Çend Wêne Ji Rugeha Vê Jînê" dibêjî:

Haj haja ava sîpela awazekê pîr naz dilêda

Qebe qeba kewê rubad liser çela nav rikêd

*Hey heya sofînîyn zînê peya pey keftine cezbêda*²⁷³

Divê helbestê derîrînên wê gelek sadene û peyvên kurdî resenne hatine bikarînan û peyvên biyanî nehatine bikarînan.

Herweha Necîb Balayî dihelbesta "Serhatya Çiyayekê bilind" dibêjî:

Şewew

Mala me ji gundî ya pîre

²⁷⁰. Azad 'Ebdulwahd, *Nuykirdnewe Leşî'rî Kurdî Da*, r.74.

²⁷¹. 'Ezedîn Mistefa Resul, *Reoşenbîrî Nwê*, J 105, r.199.

²⁷². Xurşîd Reşîd Ehmed, *Rêbazî Romantîkî Li edebî Kurdî Da*, Weş Dar Elcahiz, Bexda, 1989, r.129.

²⁷³. Ehmed Şuşî, *Çend Wêne Ji Rugeha Vê Jînê*, R.B, J37, 10/4/1990, r.5 .

Şevew
Bê zêmarê diketin
Divê rundikin bayew hore
Şevew
Lawk bêju
Lawkekê tuy çiyayê bilind bêje
Hêdî hêdî
Xemêt temburê zêdeke
Serê bizavê velurîne
Bistire
*Unevebre*²⁷⁴

Peyvêt hemî kurdî resenin, dicihê xwe de hatine bikarînan, riste û amirazên kurt û sivk bi karînayne.

Dîsa tehsîn Îbrahîm Ehmed dihelbesta "Ji Bizavê Ra" mînakeka kurdiya rehwan resene, dibêjî:

Kirmancu dê rabe rabe
Tu bi bizava xwe şabe
Nê bizava min û teye
*Tev berê bizava meye*²⁷⁵

Xuya dibît ku hozanvanên vê rojnamê tinê helbestê xwe bi êk diyalêkt ne nivêsandine wana xo bi xudanê hemî şêwe zarên kurdî zanî ye, bi vê awayî bizavê rolekê giring gêraye dipêşxistina helbesta nûxaz şîra kurdî, hozanvanên wî serdemî bi teknîk û zimanekê paqij û resenê kurdî hatbûne meydanê helbesta kurdî bi giştî û devera behdînan bi taybetî ta astekê herebaş berev pêş birî ye .

7.2. NAVEROKÊN HELBESTÊN ROJNAMA BIZAV:

Dîwana bizavê ji berhemên wan şa'êrên mezinên kurd ku helbest bi zimanê kurdî û kirmanciya jûrî nivêsandine mîna: (Feqê Teyran û Ehmedê Xanî û Cizîrî û Pirtewê Hekarî û Şêx Nuredîn Birîfkanî û Mela Enwerê Mayî û Sadiq Beha dîn û.....) Gelekê din ku ser bi rêbaza kilasîkya kurdî ne, gelek şa'êrên dinê wî serdemî helbestên xwe li ser rûpelên rojnama bizav belav dikirin mîna: (Sebrî Botanî û Mehîsin Qoçan û Dr. Mes'ud Ktanî û Dr. Nafi' Akreyî û Kemal Remezhan û 'Ebidurehman û Hacî û Dildar Mihemed Akreyî û Ehmed Şoşî û Semîr Zaholî û Necîb Salih Baleyî û Zêdan Xelef Mîrza û Selman Gulî û Îbrahîm Surçî), li gorî van helbestên şa'êrên hevçerxê rojnama bizav gelek babet û meremên cuda cuda bûyne hevêna helbestê şa'êran, mîna babetê niştîman û siyasî û civakî û dildarî û munasebat û wesf û) Li jêr de bi mînakên wana berçav dikeyn .

7.2.1. Helbestên Niştîmanî û Siyasî:

²⁷⁴. Necîb Balayî, *Serhatya Çiyayekê Bilind*, R.B, J41, 8/5/1990, r.5 .

²⁷⁵. Tehsîn Îbrahîm Ehmed, *Ji Bizavê Ra*, R.B, J24, 9/1/1990, r.5.

Helbestên nîştimanî* û siyasî* bi hevra behis dikîn çunkî beş bi halê kurdan hemû babet û mijar û basek dihate kirin li wî serdemî girêday bû bi kawdanê siyasî û nîştimanî netewê kurd heqîqet û barê nîştimanî nîşan diden, wekî me li jor de behsa derketina rojnama bizav kir ku li (1)ê aba 1989ê de ta (28)ê aba 1990ê) domiye, hijimareka zora xelkê Kurdistanê digel xebata nîştimanî û siyasî bûn, hewla sebexoya kurdistanê û bedest hêna mafên rewayên xwe kirye ne zêde tir.

Bizav bi bizava rizgarî xwaza kurdistan dihête niyasîn, eger em lê nêrînekê bi helbestên rojnama bizav bikîn dibînîn ku jimareka geleka zora ji wan helbestan girêdayne bi qezya netewa kurd û kawdanên siyasî û belav kirina rewşenbîrî û babetên fuliklorî û çîrokên balkêş û serhatyê bab û bapîrên me, rojnama bizav bizavek bû ji bo bejdarbûna jimareka zor ji genc lawên kurd ji her dû regeza bi taybetî (kiç) ku rolekî her diyar divê rojnamê hebûye ji bo pêşxistin û bi agah hînana afireta kurd ku wê jî mîna hev regezê xwe bejdar bît li hişyarkirin û çespondina hestê nîştimanî û birayetî û ji aliyekê din derbirîna ew xem û kovanên rojane bi ser milletê kurd dihêt bi helbestên pir sozên nîştimanî gazî dikir û dengê xwe gehandibî hemû alî û cîhanê .

Rojnama bizav mîna jimareka zora kovar û rojnameên edebê li gorî baru doxê welat û rê nedana jimareka zora rojname û kovarên kurdî, erkê siyasî jî li milê xwe girtbî²⁷⁶, ji vî alî kemtir xemî nekirye.

Ew dagîrkirin û derbeder kirin û enfal û kîmya baran kirina helebiçe û zulm zordarya rojane ya rijêma jinav çûya 'êraqê bi awayekê raste rast bandora wê li ser şa'êrên wî serdemî hebû wan jî li hember vê zulm zordarya bi helbest guzarşit li azar û xem û kovanê milletê xwe dikir, helbest mîna çekekê li hemberî baru doxî di dît û bi kardihîna, ji aliyekê din ev rojnameye li paytexta 'êraqê der diket û sansora rijemê zêdetir li ser bû ta radekê zor ew azadî lê standibî hemî aliyekî jê girtbûn.

Rojnama bizav mîna penagehek û cihê jiyana berhemên gelek şa'êr û rewşenbîrên kurd li hemî şarên Kurdistanê bi bê cudahî bilind dihatine nirxand û bi ruheka nîştimanî berhemên wana dihatine belav kirin, ev corê helbestê zêdetirî hemî corên helbestan denav vê rojnamê de berçav dikevin tinê peyva "Welat" zêdetirî (65) caran

*.Ev helbeste pitir soze, beref romanisyê ve diçît, viyana mirovî li hember welatî diyar diket, li ser siruşt û ciwanî û dîmen û hertiştê di welatî da dihête nivîsîn, bas li dîrok sinur û gund û bajêr û erdingarî û giringya axê diket, ev soza welatparêzyê ye digehîte pila qurbanî û xo gorî kirinê.

*. Hozana siyasî ji 'eqî derdikevît, zêdetir aliyê aydelojyê vedgirît, dîtî raw boçuneka cudaye digel dujmin û dagîrkera yan jî li hemberê rijêma fermanrewa, diyarkirina helwîsta wana ku peywendyeka zor bi siyasî ve heye her ji aydelojyên hevcuda ta digehîte dewletê û şêwezarên fermanrewa û nexşe kêşana siyasî, her weha derbirîna ji ramana siyasî diket. (ji bo zanyarê zêdetir bîne li : Kamîran Mihemed Nebî, Qonaxên Werara Hizra Netewayetî Dihozana Kurdî Da Ji Dest Pêkê Heta Dumahya Sedê Bîstê, Nama Diktorayê, Zanîngeha Selahedîn, Kolîja Ziman, Hewlêr, 2005, r.8.

²⁷⁶. Mihemedî Mela Kerîm, *Emro û Diwênê Î Rojnamenusî Kurdî, Ko(Nûserî Kurd)*, J12, Aba 1983, r.227 .

ya hatî, ji bo em zêdetir li vê mebestê bigehîn li çend helbestên di vê rojnamê de hatine belav kirin binêrîn :

Xanî nemir bin destî û tepeserî û zirbarî û pirt pirtiya milletê xwe dîtî ye lew ma bi ser kêş û bilîmetê hozana nîştimanî û kilasîkî li kurdistanê dihête naskirin, vêca hozanvanê mezin bi wan kawdanên tehil û nexweş û stemkarî û zurdarya çaxê lê dijiya bê dax barîy jiber hindê helbest nivîsîn, hindek dibêjin nivîsîna (Mem û Zîna) cevenge nivîsî bu bin destiya milletê xwe, li dest pêka pertûka (Mem û Zîna) dibêjt ev:

Rom û 'ecem biwan hisiran

Kirmanc hemî li çar kinaran

Her du terefan qebîlî kirmanc

Bu tîrî qeza kirîne amanc

Ev qulzimî rum û behrî tacîk

Hindî ku dikin xiruc û tehrîk

Kirmanc dibin bixun. muletex

Wan jêkive dikin misalî berzex²⁷⁷

Sebirî Botanî di helbesta "Ho Dayê" de bala me dikşîn te ser xoş viyana welatî ku bi şeweyê cevangî peyva dayê li hemberî "Kurdistan"ê vehandî ye, her weha divê helbestê xuya dibît ku mirov herçend li welatê biyaniyan bit çî car nikarî bi bêjt welatê mine û bêhina welatê wî ji ç welatê din nayê:

Herê dayê herê dayê

Çend bigerînim li dunyayê

Neşêm bêjim kesî dayê

Bêhina dayê ji kes nayê

Li dwayê de hozanvan xuya dike ku hindî ji bo welatê xwe bixebitî û hindî rêya rizkar kirin û pêşketina wê bigirît çî car nikarî wî mafî ji ser xwe raket:

Hindî bikem û nakem

Ez cîhanê bote rakem

Mafê te serxo ranakem

Biha giranî ho dayê²⁷⁸

Ehmed Şuşî dibêjtî (mebesta min di vê helbestê de "Çiya" yan em bêjîn "Kumtê Tezî" doza milletê kurde li wî demî li çerxê bîstê diqunaxeka sext û dijiwar derbaz dibû min bi awayekê cevangî nav lê dana "Kumtê Tezî", dîsa ez gelê kurd han di dem ku bê hîvî û umêd nebin careka dî dest helînin û rabine serxwe bi şoreşeka nû çunkî dewruberên çiyay hemî gund û huzên kurdane şev roj dixebitin ji bo gohrîna jiyana bin dest kurdistanê rizgar biken û ji destê rijêma be'sa vaşsit ya gor bi gor²⁷⁹, ji bo me xuya dibît ku hozanvanî mifa li siruştê ciwanê kurdistanê wergirtî ye û merema xwe dinav ciwanî û çiya û gul û feraşînên kurdistanê de di dete di yarkirin û bêjtî :

²⁷⁷. Tehsîn Xeyrla Navşîkî, *Helbesta Xanî, R.B, J 35, 27/3/1990, r.4.*

²⁷⁸. Sebiryay Hekarî, *Ho Dayê, R.B, J 455/6/1990, r.8.*

²⁷⁹. Ehmed Şuşî, Ç.P, Akrê Li Mala Wî Beramberî Peymangeha Mamostayan Ya Kevin, Demjimêr 5:20ê Êvarî, Pênc Şembî 14/7/2016.

*Erê ho çiyayê befîrîn
Heta kengî dê maçîket
Befîra spî
Bilind kupkîn eniyate?
Keske giyaw
Bişkuj û sulîn
Dibine gulzar, xo dalînin
Wek kemerê
Linav tengate
Liberpêt te
Feraşîn û
Havîngehêt belavene
Kevinewarêt te bapîranew
Qehremanêt vînatene*

Li dawyê de hozanvan weha didete aşkira kirin ku heta kengî welatê me dê herê bin dest bît kengî em jî dê bînîn ku qehremanek yan dergehêk jî me ra vebit ev zulm zurdarî ya liser milletê me rabiket û roja azadiyê û aramî li me helbêt û jîneka *rohin û hejî bjîn*:

*Erê ho çiyayê befîrîn
Te pîr kirîn û pîr nabî
Bahozek me tafrînît
Yan berebame bihelgirîn
Bilind..... Bilind
Me bavête ser serê te û
Desta dirêjkeyne tavê
Jê bikêşîn davîn zêrîn
Bihojînîn befîra tezi
Lser leşê tew
Nû keyneve buharate
Bo jîneka rohin hej²⁸⁰î*

Îbrahîm Surçî di helbesta bo te xatîn banu de pêde helgotina evînî diyare şa'êr xwe dibêjî (merema min ne evîn ya regezê beramber lê min dixwast li pişt van peyvan viyana xwe ji bo welatê xwe diyar bikem wesf û pesina warê xwe bikem)²⁸¹, ya xuya ye hozanvan mîna her hozanvanekî wî serdemî li çendîn ciha ceveng bikar îname:

*Bo nav baxên mereqên te... Canê hatim
Bo bihara xuşyên te... Ez xelatim
Ez hatim û min jixemila hewesta dil qefta gulên dilovanî..
Ji gerdena hestên tera,*

²⁸⁰. Ehmed Şuşî, *Kumtê Tezk, R.B, J7, 5/9/1989, r.5.*

²⁸¹. Îbrahîm Surçî, Ç.P, Li Mala Wî Meydan Tenşit Mizgefta Zevyê, Akrê, Demjimêr 4:00ê Êvarî, Pênc Şembî 14/7/2016.

*Ji bihara nu hatîra ... Min pêş kêşkir*²⁸²

Divê helbesta "Erê Heyran" de Ehmed 'Ebidula Zerû dibêjî: (ev helbeste min sala 1988ê li demê kîmya barana helebiçê de ya vehandî, diyare li wî demî dilê daykan bi bû dû ker çunkî her malekê çend şehîd hebûn agirî dilê min girbû, wan gurg dirindeyan cejn cejna wana bû li rexekê din ev xelke bi jin û zaro û pîru kalan ve jiber wê helmê mîna belgên daran li werzê payzê de li 'erdê ketbûn)²⁸³, helbestvanî ji ber ew zulm zordarya rijêma wî demî bi awayekê bal kêş merema xwe bo me derxistî ye :

Bute bêjim

Dilê daykê duker buye

Kerek male

Yadî ji tera heyrane

Ho heyrano

Ji dilî têtû kirên û nalle

Gurêt havî

Dur pejana

Dîlan girtin

Çi dîlane?

Ji rep - repê

Ji ber hilma kepê – lêva

*Gul weryane*²⁸⁴

Divê helbestê de Necîb Salih Baleyî Kurdîstana xwe bi kiç di dete niyasîn û nîşan di det ku ev kiçe xwedî biraye mebest lê parçên dinê kurdistanê ne, di vê parçê de dipirse çima bazarê dabeş kirin û xirap kirin û wêran kirin dinavbera dewletan herdem mîna bazarekê gerime û dibêjî :

Ev kiça he

Xudan biraye

Xudan uçaxe

Belê boçî , u çira...?

Çunkî likuça bira

Bazarê fihêt kirina wê

Gelek gelek

Gelekê gerime

Çituv karekê bê şerme

Çituv xuykeka girane

*Keftî ye serme*²⁸⁵

²⁸². Îbrahîm Surçî, *Bote Xaytin Bote Banu*, R.B, J 17, 21/11/1989 , r.8

²⁸³. Ehmed 'Ebidula Zerû, Ç.P, Pertûkxana Dihok Li Şarê Dihokê, Demjimêr 3:30ê Êvarî, Êk Şembî, 17/7/2016.

²⁸⁴. Ehmed 'Ebidula Zerû, *Erê Heyran*, R.B, J5, 1989, r5,

²⁸⁵. Necîb Salih Baleyî, *Havîbûn*, R.B, J5, 29/8/1989, r.4.

Divê helbestê de Mihemed Saleyî viyane xwe li hember welatî de di dete diyarkirin ku li hemî tiştê vê dinê mezintir û bilindtîre ku nikarî çî cara bihête ji bîrkirin dibêjî :

Viyanate

Kotîrek niye ez bişînim helfîrînim

Viyanate gulek niye ez bişînim bi qetînim

Tu wêneyekî ji elbomê

Ez te derbînim

Li dawyê de hozanvan ji bo kurdîstana xwe dibêjî tu mîna çiyayekê herdem bilindî tu kes nikarî te ji mezîniya te kêmbiket û em rêka azad kirina te bernadîn jîbilî te em çî bihayê ji bo kesî nadanîn û kesî ji pêşya xwe re nabînin xebate me her di dome û her dê te bînin azad :

Tu çiyayekê ser bilindî

Dê her rêka te şeqînim

Tu berçavkê çav rohînerî

Ez ji bilî te kes nabînim

Mala min bê te wêrane

Lewma divêt her te bibînim²⁸⁶

Divê helbestê de Sebirî Botanî şîretê ji milletê kurd dîke û gazîna jê diket ku heta kengî dî dinav sengerê dujminî de dê çîne şerê birayê xwe li cihê bihên welatê xwe rizgar biken û zana û zîrek û evîndar ewn yê xwe diken gorî welatê xwe :

Bese îdî

Heta kengî!!?

Berevajî biçî ravê!!

Ne zîrek û

Ne zanabî

Tu ketî butka bişavê

Şêrê minu

Evîndarê

Zîna çiyayê bizavê

Dil birînim

Çavê minu

Xwe bike gorî ax û avê²⁸⁷

Li dawyê de hozanvan di dete diyar kirin dinav rêzên supayên dujminî de eger bi xencerên qehremanên kurd nemirî jî dê hête mirin bi lêdana postalên wan direndeyan:

Eger nemirî

Bi xencerî

Du dê bimirî bi pêlavê

²⁸⁶ .Mihemed Saleyî, *Viyanate Bê Beş û Dîdewanî*, R.B, J8, 19/9/1989, r.5.

²⁸⁷ .Sebrî Botanî, *Şîre Tamin*, R.B, J 43, 22/5/1990, r.4.

Şîret bes

Me dirêj kir

Ji min bir te vê slavê

Ji bilûra çiya²⁸⁸

Divê helbestê de bi navê peristvanek Mîkaîl Îbrahîm ji ber wan nehametî û lêdan û bîrsî û wan salên bindestiyê û bendayetî û peristina bejin û pule û diravan û ew dîroka xwe ya nebaş hat careka din ji wê xewê rabû dest havête çek şerefê şerem ji xwe kir kirinuş ji bo azadiya welatê xwe bir :

Ji jehir û jan

Ji jêr qemçiyar

Ji têhin û birçan

Ji hizaran salên bin destî yê

Ji bendêy û

Peristina bejin û balan

Ji dîroka xwe yê pilçqayî

Hat û carek dî

Dest nivêja xwe girt û helda

Lê şerim xwekir

Dest nivêja xwe girt helda²⁸⁹

Her weha divê helbestê de 'Elî Mistefa Uremarî zulm û zor darya wî serdemî bi awayekê weha nîşan me di det ku her kesê eger dû peyvê rast li hember wê rewşê ra gutban yan di dilê xwe gutban îdî bersiv dana wî nebû li jêr zebir û îşkencê de dihate ber mirinê ta hemî laşî wî dixwîna wî de sor dibû:

Ger carekê...

Du peyvê rast

Min gutban

Yanjî li sinurê dilê min

Mişext biban

Ezu îşkenc

Dibuyne hev dost

Xul min dida.. Ez digevzandim

Digugirandim... Maçî dikirim

Heta leşê min dibu bizot²⁹⁰

Li dawyê de hozanvan wesfa ew azayetya milletê xwe diket û bêjî herdemê ew azar û îşkence nedima dîsa me dest di da berxo û rê ya berxudan û rizgar kirinê me digirteve:

Lê her demê...

Ev îşkenc diçu

Careka dî û seru şinî

²⁸⁸. Sebrî Botanî, *Şîre Tamin*, R.B, J 43, 22/5/1990, r.4.

²⁸⁹. Mîkaîlê Îbrahîm, *Peristvanek*, R.B, J 40, 1/5/1990, r.4.

²⁹⁰. 'Elî Mistefa Uremarî, *Îşkenc*, R.B, J40, 1/5/1990, r.4.

Da destêt xo...

Deme berxu...

Uda bidîwara ra hestim

Wênê yara xu...

Uda tevnê wê

Rêsmeye

*Da rêsmeye*²⁹¹

7.2.2. Helbestên Evînî û Viyan:

Helbestên evînî di rojnama bizav ewn ku (derbirînî ji wan hest û soza diken ku mêrî bi afiretê ve girê didet, wêna evîniya mêrî li hember ciwanya afiretê û rewşt û evînî dinavbera wan de rû di det)²⁹², helbestên evînî jî mîna her babetekê dî dinav rojnama bizav de cihekê ber fireh ji xwe re girtî ye.

Eger li naveroka helbestên rojnama bizav ewên derbarê evîniyê binêrîn dibîn ku her jiwana helbestan rengdaneve û nîşandana kawdanên civakê wî serdemî nîşa me di den ku gelek hozanvanan ev çende bi viyana welatî girêdaye, evînî û viyan her ji despêka hebûna mirovî wekî tiştê zikmakî digel her zîndewerekî djît û li gorî qonaxên mezin bûna mirovî bi awayekê siruştî gohrîn têda peyda dibin, merema me ji evîna deyk û baba heta derbazî evîna welat û kiç û ayîn û hertiştêkî din bûye, anku bi siruştî xwe ev hesta li def mirovî mezin dibît, li gorî serdem û civak û rêz seru berên her milletekê têda jiyayî²⁹³, evînî bi awakê bûye dinav her neteweyekî sîma û taybetmendiyên xwe hene, li virda (dîkarîn bi bêjîn dîwana her şa'êrekî bê behis kirina evîniyê nî ye û nabe)²⁹⁴, çunkî viyan tiştêkê berdewame di jiyane de narawestît, bi hest û sozên mirovî ve yê girêdaye anku tiştêkî heta hataye bi demekê diyarkirî negirê daye.

Li gorî ev helbestên hatine belav kirin û bîru boçonên rexne giran û vekoleran (sê) corê evînî hatine diyar kirin, ew jî:

1. Evînî ji bo çav lê kirinevê, şa'êr ji bo wê çendê ta dîwana hozênên wî li merema helbestên evînî bê behir nebit, helbestên evînî nivêsandîne.
2. Helbestên evîniya heqîqî, ku ev helbeste ji aliyê şa'êrên sofî û bi 'eşqa mecazî dihête dan, ev core zêdetir evîniya diruste, eger ji aliyê ruxsarê jî ve peyvên newaqî hatbine karînan, ya xu yaye evînî di vî beşey de zêdetir bi bejin û bala kiçê heldaye.

²⁹¹. 'Elî Mistefa Uremarî, b.n.b, r.4.

²⁹². Şukirye Resul, *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb*, Weş Xwendna Bilind, Hewlêr, 1989, r.40

²⁹³. Gehîn Nezar Îbrahîm, *Mes'ud Kitanî û Naveroka Hozanên Wî*, Nama Master, Zanîngeha Dihokê, Fakoltî Ya Zansitên Mirovayetî _ Sikola Adabê, Dihok, 2013, r.142.

²⁹⁴. 'Îzedîn Mistefa Resul, *Edebyatî Nwêy Kurdî*, Weş Xwendna Bilind, Hewlêr, 1990, r.62.

3. Ewa softî bi 'eşqa heqîqî dihête danan, eger şa'êr li 'eşqa ser 'erdî serinekeftin naçar dibin berf 'eşqa asimanî biçin)²⁹⁵, li vir de ji bo me çend cor evînî aşkîra dibin.

Heke Cizîrî ser kêş û ser hostayê kêş û serwaya helbesta kurdî ya kilasîkî bi evînê dax bar nebiba ye çêdibît navê wî tumarêt pêdarda ne dihate nivîsîn, demê dilbera wî jê duyê dikevît û jê cuda dibît li vêrê dilbera wî kar di dilê wî kir û bêjî:

*Ji her bê dax û bê derdî mepirîsn mîhneta 'îşqê
Çi zanin bê xeber jana dilê dax û keser tê da
Kesê mîhnet dî û fîrqet vexwarî cer'eya hîcrê
Girî wan tê bi halê min divê hîcran û zecrê da
Bi dama muhbetê bendim xendinga fîrqetê dilê nuhet
Bi şubihê murxî nîm besmel diheq wertêm dxunê da²⁹⁶*

Îbrahîm Surçî di helbesta bede û kubar de dilbera xwe bi ciwantirîn zerî di dete niyasîn û dibêjî mîna tîruşka spêdeyê ye dema der dikevît li hemî ciha runahî der dikevît û ew kul xem û janê di dilan de bi carekê tîmar diket:

*Şoxa xir zeryanî tu
Tîrojka spêdanî tu
Yara dilê minî tu
Nuj û tîmara minî*

Di parçeka din de hozanvan li hemberî wê evînê de weha xuya dibît ku zêdebarî jîn û sebîr û hedar ji bo nehêlabû li dawyê de bi bedew kubara dilê xwe di dete niyasîn :

*Çi evîne te vehand
Dilê min jî bo xo stand
Min jîna xo ji te ra şand
Bede û kubara minî²⁹⁷*

Divê helbestê de Azad 'Ebidurehman li hemberî ciwanya dilbera xwe her carew bi gul û awaz û tabîlu di dete hevberkirin û divê parçê jî de hozanvan weha derxistye ku heyvê ciwanê ji yara wî wergirtî ye :

*Tu xatîna hemî perya
Serê bilind bo heyva can
Neçemandî
Ciwaniyê ciwanya xu
Şte kêşaye
Kirêtyê çavê xuyê
Şte neqandî²⁹⁸*

²⁹⁵. Îzedîn Mistefa Resul, *Şêx Reza Talebanî*, C2, Dezgay Çap û Belawkirdnewey, Aras, Hewlêr, 2010, r.50.

²⁹⁶. Tehsîn Xeyrla Navşikî, *Helbesta Cizîrî*, R.B, J35, 27/3/1990, r.4.

²⁹⁷. Îbrahîm Surçî, *Bede û Kubar*, R.B, J 55, 21/8/1990, r.4 .

²⁹⁸. Azad 'Bdalirhmin, *Solîn*, R.B, J 1, 1/8/1989, r.4

Dîsa divê helbestê de "Rundik Mizîrî" hewl daye rêkekê bi bînt ku evîna xwe digel dildarê xwe nû biketeve ewan kul û xem û agirê wê evîne jinav biben û ser ji nû dest pê biket :

Ez nizanîm biçirêk

Evro

Ez bihêm te

Vê viyanê

Nîkem li gel te

Dilê teyê tijî kovan

Evroke ez bemb revînîm

Ez nizanîm biçirêk

Evro ez bihêm te

*Agirî dilî vemirînîm*²⁹⁹

Dîsan xuya dibît ku hozanvan navê yara xwe jî dihînt û jêra dibêjî:

Bizanî ezim dilbirîn

Evîndarê teme kajîn

Îroke da bersdivê dey

*Ez bu teme bese girîn*³⁰⁰

Her weha Mihemed 'Elî Kîsteyî di helbesta xwe de bi navê "Yara Şîrîn" ji yara xwe dipirse û dibêjî:

Erê şîrîn 'eşq û evîn kîve revîn dil ma xemgîn

Bax û bîstan ev gulistan bo kê hêlan ey nazenîn

Gul xunav ketî dava ji dû çava dibart xuyî

*Kul û derda li dila hewda hemî tevda bume girîn*³⁰¹

Her weha 'Elî Bendî di helbesta "Kengî Sirîn" gilî gazine ji evîndar xwe diket ku dinav taryatya jiyanê hêlaye û çima rizgar nakî, dibêjî:

Heta kengî

Dê min hêlî li tarîstana

Perda xema naqetînî

Tena nakî...evî dilî

*Ji kuvana ...*³⁰²

Her weha Misawat Hisên di helbesta evîn darm wek memê li hemberî çavêt reş û belek evîne jê dixwazî eger ji bo rojekê yan şevê jî bît bila wî demî felek xatirê ji me bixwazî dibêjî :

Nê em evîn darîn gelek..

Bu çavêt reş û belek..

Me ji we divêtin dilek..

Bes rojekê yan şevê..

²⁹⁹. Rundik Mzîrî, *Nikevîne*, R.B, J 8, 19/9/1989, r.5.

³⁰⁰. Bedil Mihemed Duskî Dihuk, *Ger Bizanî*, R.B, J21, 19/12/1989, r.5.

³⁰¹. Mihemed 'Elî Kîsteyî, *Yara Şîrîn*, R.B, J 17, 21/11/1989, r.4.

³⁰². 'Lî Bendî, *Kengî Şîrîn*, R.B, J27, 30/1/1990, r.4.

*Li me biburt felek ..!*³⁰³

Dîsa Se'dula Peroş di helbesta hozan de wêneyên wan evîndara dikêşt ewên ji bo cara êkê evîndar dibin weha dibêjî:

Eger wedît..

Siruşt betenahî nivistî ye

Çîçk hatîne sertayêt dara bu dîlanê

Eger wedît..

Evîr ji esmana revî û..

Şalîl hatin bu şîlanê

Hun bizanin

Ku huzanek bu cara êkê dê ji dayk bît

*Yan dilê huzanvanekî bi agirê evînê dê sujît*³⁰⁴

Newzet Cemîl Balte di helbesta te ez hêlam de xuya dibît evîn û ciwanya wê zeryê renekê dinê daye jîyanê herdem mîna buhar xuya dibît û dibêjî :

Ji canyate tew vê zuzanê

Min kir evîna te canê

Tu bitinê ketye dilê min

*Tegeş kir bihara jîyanê*³⁰⁵

Hozanvan Ziyad Neqîb Berwarî di helbesta bo xoşevî ya min de li hemberî wê evînê de dibêjî eger her tiştek bi bîte rêgir li hemberî wê evînê de min tu her xoş divêy û ew evîna ewa dikuratya sîngê wî de wêneya wê meşkê ku herdem çî rawestan nî ye û dibêjî:

Heta roja ji aliyê roj avayê

Dihelîtin

"mesîh" careka dî

Berev jurda dihêtin

Dê herbêm..

Min tu Divê î..

Min tu Divê î..

Nê dilê min dikuratî ya sîngê mi da

Mîna papurekê

Bayê girê vîna telêda

Nula meşka bêrîvanekê

Hera dikê î..

*Hera dikê î ..*³⁰⁶

Dîsa helbestivan Ferman Hemîd Silêvaney di helbesta "Awerêt Yare" de li hemberî wan awriya sebiru aramî ji bo nehêlaye û diyare wê evînê hemî tiştên dinê li ber çavê xistine û dilê wî ji bo kes naçit her wekî dibêjî:

³⁰³. Misawat Hisên, *Eivîn Darm Wek Memê*, R.B, J 28, 6/2/1990, r.4.

³⁰⁴. Se'dula Peroş, *Hozan*, R.B, J 32, 6/3/1990, r.4.

³⁰⁵. Newzet Cemîl Balte, *Te Ez Hêlam*, R.B, J 32, 6/3/1990, r.5.

³⁰⁶. Ziyad Neqîb Berwarî, *Bo Xoşevî Ya Min*, R.B, J 35, 27/3/1990, r.5.

*Tîra awrêt çavêt te evru êxsitîme ez
Pêta evîna te yarê sutin li min cerg û bez
Piştî çavêt tey reş belek qed min nevêt çu kes
Çend bihêzim navê şîrîn, tême tibilêt xwe bigez³⁰⁷*

Xuya dibît li dawyê de şa'êr bi evîna xwe şad dibît supas darya xweday diket û dibêjî:

*Xuda gelek min minete te ez gehandim yara can
Gut butene bisk û kezî 'aşqa dil pir viyan
Daye dest min destî nazk gut narînim tu ferman
Nahêlim bejin û bala te li min bikin axir zeman³⁰⁸*

Her weha Newzet Baleteyî di helbesta "Zerya Min" de ji dilbera xwe re dibêjî:

*Zerya minê
Ez çî bêjim
Ciwanya te
Ez şêt kirim
Digel xu birim
Lpişt cîhana
Vî dur hêlê neyê hejî
Asê kirim
Derya evînê da ez
Niqu kirim³⁰⁹*

Hozanvan 'Ebidul'ezîz Siwarî di helbesta xoştivî ya min de dilbera xwe bi siruşt ciwanya kurdistan didete niyasîn hîvî ya dixwazt rojek bihêt bi hev bigen :

*Xoştivî ya min
(kajîna) dilê
Ava kanî ya
Kula zevî ya
Xela tibila
Ka roja bêt
Bi gehîne êk
Lime xoş bin tev dirav rêk ?³¹⁰*

7.2.3. Pesin (Medih):

Di rojnama bizav de ew helbestên diçine nav çarçovê vê meremê bi giştî çend core helbestin ji wan jî ewên pesina pêxemberê me û mîr û padşa û siruşt û ciwan ya kurdistanê û afîret û rojnama bizav, li sercemê wan hemî helbestan de pesinên hatine

³⁰⁷. Ferman Hemîd Silêvaney, *Awerêt Yarê*, R.B, J 40, 1/5/1990, r.4.

³⁰⁸. Ferman Hemîd Silêvaney, b.n.b, r.4.

³⁰⁹. Newzet Baleteyî, *Zerya Min*, R.B, J41, 8/5/1990, r.4.

³¹⁰. 'Ebdul'ezîz Siwarî Zanku Wa Mîsl, *Xoştivî Ya Min*, R.B, J37, 10/4/1990, r.4.

kirin û beramber û bê beramber dihêne vexwandin û ji dil û derunekê pak û siruştên cuda cuda ser heldaye.

Pesin jî êk ji babetên giringên huzanê ye, bikarhînana pesinê dinav turêd dîroka kevin heye, dîroka edebiyata gelan bigişti û netewekanî rojhelat bitaybetî xuya diken ku babetê stayş û pêdahel gotin êk buwe ji wan babetên kevin û sereke helbestên kilasîkî û her digel bîruboçunî mirov û cudakerên helsengandina diyardên dewruber piştî bi pêwanê xêr û şer rengvedane helwîstên ji aliyê helbestê ve, ev babete jî beref pêş hatî³¹¹, her weha (li edeba nû jî ev layene dikarî bi vekirî dinav hemî têksitê ciwanên dî tir çî helbest bê yan roman, vebînt)³¹², anku pesin dinav tureyê kevin û nû de bi rengê diyar bi kar hatine.

Pesin êk ji wan babetên giringe di helbestan de çunkî pesin medih herdûk li babetê pêşî helbestê kilasîkî rojhelat û helbestê kurdî jî de bi dû basên cuda dihêne zanîn li basên helbestê, yan jî ji wan basên ku şa'êr tiştêk têda nebêjt bi şa'êr nahête hijmartin)³¹³, turê kurdî jî ji evê babetî yê bê behir nebî ye.

Aşkeraye helbestvan bi vehandinê dîtina xwe bo jiyanê û her meseleka hebî di êxne berçav lewra nasîna kesînya wî ji tiştê asaye li ser xwandeveyê dest hewl û şareza, helbest çunkî ya girîdaye bi buyer û serhatiyêt ji îne nikarya hozanvanî ve, dîtî û bîhistî û zanyarêt wî ve wekî jiyanê bixoyê ya hemî renga û xudan babetê kelêr û jêk cudaye, her bi vê çendê jî tuxmên helebestê diyar bûn.

Eger hat û hozanvanî peyrewî ya ulekî kir helbesta uldarî dê li cem wî hildet, her weha hozanvanê welat perwer dê helbesta welatînyê xu li ser ezimanî helavêt....., vêca medih êke ji wan babetên hozanvanî dest didetê û car car xu li qada wê dihelavêt da li dîv wî dengê li hindurê wî deng di det biçît û evîneka taybet pê hawîş biket.

Dê bîni şa'îrê mediheker bi hemî hîza xu têda wî kesê medihêt wî diket bi rênmunî û pak û ciwanî bi nexşet û bidante berçav, eger mîru xwendikar bit dê bi merdînî û zîrekî û dadgeryê dete niyasîn, eger ser kêşekê leşkerî bit bi dil qahîmî û çelengî û qehremaniyê dest nîşan ket, dê bîjî nîgarkêşekî dest hele yê kevalekê dinixşînî yan hunermendekê zîreke yê peykerekê ciwan dirust diket, bi vê şewey her saluxeteka ciwan bi bîni yan jî bîhîsî dê dikarê xo de bikardînî .

Herçende li hindek dem û ciha medih bibu rêya pare wergirtin û xu xudankirinê li cem tuxemekê huzanivana lê wenebit çî aliyêt baş û îcabî divê îne vê huzanê da nîne, nexêr ji aliyekê dî gazyeka neruy bi ruy ye, bo wî yê medihêt wê tene kirin da sexletêt navbirî li cem xwe peyda biket, her weha ji bo xwendevana jî.

Babetê medihêt mîr û xwendikara ji wan babetaye yê kêm dinav babetê hozana kirmancî de berçav dikevin, renga xwe mezinikirina li cem me kurda hey dikevin de kar dihozinivanêt me jî kirbî le û xuşkandinê gedayî ya li ber dergehê mîr yêd dayne baş (hindî ji şeca'etê xeyrun ew çend ji minetê nifurin).

³¹¹. Dilşad 'Elî, *Stayş û Piyaheldan Leşî'rî Kilasîkî Kurdî Da, Ko(Beyan)*, J 76, 1982, r.43.

³¹². Muhsîn Ehmed 'Umer, *Ferhengî Edebî*, r.157.

³¹³. 'Îzedîn Mistefa Resûl, *Şêx Rezay Talebanî, C2, Dezgehê Çap û Belav Kiryên Aras, Hewlêr, 2010, r.72.*

Manê me dît çewa Feqyê Teyran rebenê dila li demê gerim gerimya mîr û bega
keterkê û bi hemî dengê xwe got:

Ez naçim dîwanê mîra

Nabim şaru rê kuçk û sera

Naçim dîwanê mîr û hakma

Feqyê teyran rebenê dila

Her weha Cizîr yê Mela dû helbest bi mîrî helgotîne ji 45 malka hatine vehandin, her
ji serî heta dawyê medihekar û sena xwanê mîrî ye û hîviya ji xudê mezin diket ku
textê sultentya wî biparêzît û ber fireh biket da nebtinê di eqlîmê jarê de hukimdar bit
belkî da padşahê her eqlîma selam karê wî bin:

Çîmena sultaniyê yek laleyek baxê tebt

Gulşena xaqaniyê xarek ji gulzarê tebî

Umêda Cizîrî jî her ew bû rojek bê çîmena sultaniyê ya berfireh bîne laleyek - gulek
– bitinê dinav baxê mîr Şerefxanê kurd da, û gulşena xaqaniya rumê bibte stiryeka
kêm bê biha dinav gulzarê mîrê wî da...belê!? Cizîrî di her dû helbestê xuda
hijmareka bestin û saluxa bo mîrî diyar diket, dihête ser behsa çelengî û zîrekiya
lêhatiya mîrî û dibêjî:

Şahbaz re çendî berwazê bi bala bê û ret

Dê dinêv tura tebî û seydi şunqarê tebî

Her weha di malkeka din de medihê merdînî û dinya dîtya mîrî diket û dibêjî:

Her kesê qestek di dil dê qestê dergahê teket

Ê dixatir ercukit dê her rica karê tebî

Dadî û dest berdaya mîrî dinav helbestê Cizîrî de beawayekê rûn û aşkira xuya
dibt mîna divê malkê dibêjî:

Başî nu şêrwan dibînim dê hakmê 'adil tuîy

Mislê hatem dê bidanê der cihan meşhur bî³¹⁴

Ehmedê Xanî jî zêdebarî wan nehametî jêk vebûn duyr ketina wan ji hev gelek gilî
gazina ji mîrî kirine lê medihê mîrê serdemî xwe jî diket û dibêjî:

Qelbê di zexel dikt bilurî

Polê di dexel diket filurî

Sed pare hebin filusê ehmer

Derhalê dikt biyek nezer zer

E'aliyê dikt dikt bi qehrê edina

Edinayê dikt bi lutfê e'la

Ji saluxetê vî mîrî yê zîreke dicengî da, êxsîr digirt paşî bi dil firehî aza diket û destê
wî çî cara yê girtî nîne li ber bê newa û geda:

Paşan digirt wekî esîran

Aza diketin wekî feqîran

Her rojê hezar bê newayan

Her lehze bi lutfê sed gedayan

³¹⁴. Tihsîn Îbrahîm Doskî, *Helbestên MeAliyê Cizîrî*, R.B, J51, 24/7/ 1990, r.5

Zengîn diketin bi destê hîmet

Hîkimet ewe naketin çu minnet

Şa'êr Derdî jî dihête ser medihê û pesina 'Adil Paşayê Kurê Îsma'îl Mîrê Amêdiyê diket behsa saluxetên mîrî diket bi mirovekê baş û nerim niyan û berehim nav dibet her ji ber vê çendê jî xelkî piştgîrya wî kirye, şa'êr Derdî pesina wî bi azayetî û mêrxasî di wan şeran de pîşan daye:

Walî yê mulkê Suleymanî te ke sultanî qedîr

Wekî Xanî ji mîrzay ra gutî derdî ji 'adil ragut

Ma xudê zêde bikt mertebenî rujê veruz

Ku bi lutîfa we xenî bune mesakîn û feqîr

Derdî mêrînî û merdatî û rewşit berziya mîrî bi çavêt xwe dîtî ye lew re li dawyê de dibêjî:

Wekî meşhurî divî 'esirî bi exlaqê cemîl

Kemtirîn madihê xud (Derdî)yê şeyda tu bi gêr

Di gelek helbestên kurdî de dibînîn hozanvan pesina jêhatî û nav û dengiya xwe û helbestên xwe diket, divê helbestê de eyaz mirovekê zana û hiş û bîr bu bedî' û zeman xwe digel (Eyaz)î hevber diket û bêjî dema tiştêkê balkêş ciwan derdikevt hemî kes 'aşq dibît cihê ez lê bim mîna wî tiştî hemî xelk jê kom dibin wekî eyazî ye sultan mehmud ji bo wî pir hene:

Gerhebt husna hebîban herkesek lê 'aşqe

Batinê husna ez lê bit dê bine sultanê ma

Ger eyaz mewcud hebin mehmud ji bo wî pir hene

Şem'e ya ruhnî bidet zlumet dçê bê kêf ji ma³¹⁵

Her weha divê helbestê de Cizîrî pesina helbestên xwe diket, dibêjî herkesî zimanê kurdî zanî ba û yê helbesta kurdî agehdarba da mejî mil bi mil dete digel furs û urdiya çunkî zimanê me jî dewlemende bi peyvêt nazk û sirîn u wargehê me bandora wî kêmtir nî ye ji welat û helbestên biyaniyan, her wek Cizîrî dibêjî:

Ger lu liwê meşurî ji nezimê tu dixwazî

Were ş'ra melê ma te bi şîraz çi hacet³¹⁶

Siruştê kurdistanê têkhel bi giyanê mirovê kurd bûye, şa'êr ku perweda siruştê rengînê kurdistanê, şanazî bi şaru şaruçkên kurdistanê û ciwanya wê kirî ye mîna beheştê ser dinê navê wê birye, îstatîkay siruşt ji aliyê hinek şa'êran bûye xemeka mezin û peywendî bi hemî hestê neteweyî ve kirye.

Hewar Babekir di helbesta gerdena welatî her mirarî ye de pesina welatê diket weha nîşan di det ku li hemberî siruştê ciwan û bihên xoşî û aramî û dil rifêna wî bilbil hemî mendehoş û evîndar kirine weha dibêjî :

Dardê te xunav û gulistane

Ji bêhnay kehni û ruybarêt te

Baw baran kevîyên te

³¹⁵. Hemdî 'Ebdulmecîd, *Mela Se'îdê Meşhur*, R.B, J 41, 8/5/1990, r.4.

³¹⁶. Tehsîn İbrahîm Doskî, *Helbesta Cizîrî*, R.B, J37, 10/4/1990, r.5.

*Daru bar çemêt te
Bilbil hemî mendehoşn
Evîndar nazk evîn û serxoşn
Cubarên jînê, xoşyê bo tev
Hêlîna avkukîn diboşin hosa welato tu
Beheştê welatanî tu welatê welatanî³¹⁷.*

Dîsa Divê helbestê de hozanvan ji 'eşqa welatê xwe weha dibêje:

*Tu çiyayekê ser bilindî
Dê her rêka te şeqînim
Tu berçavkê çav rohinkerî
Ez jîbilî te kes nabînim
Mala min bê te wêrane
Lewma Divêt hert bibînim³¹⁸*

Her weha dinav helbestên kurdî de corekê ji pesina here ber belav û gelek caran dihête dîtin hozanvan pesina evîndara xwe diket û bi gul û nêrgiz û reyhan û dîmenê ciwanê kurdistanê di dete hevber kirin:

*Sorgulê ter jixunavê
Lêv gulîka bîn gulavê
Ruy çu heyva pur sîtavê
Kuştîm te bi daxa evîne³¹⁹*

Dîsa divê helbestê de Azad 'Ebidurehman pesina dilbera xwe diket, û dibêjê:

*Tu gulekî gula hêştê
Baxê vîne nexemilandî
Tu nêrgizî ewa hêştê
Baxevana
Linav baxê xo hêş neçandi³²⁰*

Her weha di dîwana bizavê de diçendîn helbestan de hozanvan pesina şarê xwe û cihê ji dayk bûna xwe diken û dibêjê:

*Dihokamin şarê rengîn
Tuîy şana pîr hingvîn
Dihokamin xaka pîroz
Tuîy welatê mey zêrîn
Dibêjin her şam şekire
Xanim tuîy xuş hingvîn³²¹*

Dîsa selahedîn selman bêrsivê dihelbesta xwe de bi şarê xwe heldibêjê:

Zaxu bingeha min li jînê

³¹⁷. Hekar Babekir, *Gerdana Welatî Her Mrarî Ye*, R.B, J 2, 8/8/1989, r.4.

³¹⁸. Mihemed Saleyî, *Viyante bê beş dîdewanî*, R.B, J 8, 19/9/1989, r.5.

³¹⁹. Melayê Cizîrî, *Sor Gul*, R.B, J 29, 13/2/1990, r.8.

³²⁰. Azad 'Ebdurehman, *Solîn*, R.B, J 1, 1/8/1989, r.4.

³²¹. Hisên 'Lî Erdenî, *Dihoka Min*, R.B, J18, 28/11/198, r.5.

Havîngeha min li havînê

Dilbera min li evînê

*Bê kesim ez tuy semyan*³²²

7.2.4. Helbestên Biyanî û Ewên Ji Latînî û Sîlavî Hatine Zivrandin:

Êk ji wan babetên bi ronî dinav rojamevanya kurdî de rengive didet û zivrandine ser elf û bêy 'erebî, ku her ji dest pêka vê rojnamê giringyeka baş bi evî babetî daye, lê eger li rojnamevanya kurdî li devera behdînan binêrîn li dîv ewan kawdan û qunaxên derbaz buy dê bînîn bizava wergêranê mil bimilê bizava rojnamevanyê bi qunaxên cuda cuda derbazdibît.

Em dikarîn berî raperînê bi qunaxa destipêka serhildana rojnamevanya kurdî li devera behdînan dabinêyn, ji encamê peydabuna bizava wergêranê rojnamevanyê ve mîna qunaxa destipêkê ya wergêrana edebî li deverê dihête hijmartin.

Di rojnama bizav de ji bo wê çendê bizav bi bîte meydaneke berfireh ji bo şa'êrên kurd ku dinav de kom bi bin û êk bigirin û berhemê xwe ji wê rê yê belav biken bîru boçonên xwe bê tiris û bê sansor belav biken, rojnama bizav dergehê xwe herdem li hember şa'êrên kurdan vekir bû ne bitinê ewên bi zimanê kurdî helbest dinivîsîn belku ewên helbest ji ser zimanê din jî zivrandîne ser zimanê kurdî, jimareka zora helebesta di rojnama bizav de berçav dikevin helbestên 'erebî û îngilîzî û ferensî û latînî û sîlavî veguhastîne ser zimanê kurdî, mîna:

Ev helbeste ya Tunsîtê Reşîd bi navê bo bîranîna ferîk polatbêkov " Segvan Yusif" ji latîniyê zivrandî ye :

Sergûne sergûne sergûna dûr

Karvan lipey hev – kûnabûna tune

Tu dibêjî karistan bûye sergûn

Rusistanî gişk qeydu zincîr kirye

*Li rustanê stiran tune*³²³

Dîsa di helbesteka din de ya "Mîkaîl Nalbendîyan" bi navê azadî "Birader Remezan Hacî Qadir" ji tîpên latînî sîlavî ve guhastî ye:

Min jî hîvî, lava dikir,

Girênede tu milêd min

Ji wê rojê min qirar kir,

Ku ji azadiyê ez hezbikim

Zimanê min çawa vebû

Û zarê min wekî gerya

*Jidengê zar – tîfalî*³²⁴

³²². Selahedîn Selman Bêrsivê, *Zaxokamin, R.B, J50, 10/7/1990, r. 5.*

³²³. Tunsîtê Reşîd, *Bo Bîranîna Ferîk Polatbêkov, Segivan Yusif Latînî Berhev Kirye, R.B, J 9, 26/9/1989, r.4.*

Dîsa di helbesteka din de ya " Emîn 'Elî Bedirxan" bi navê helbest ji zarokan delalya zaro wan "Hisin Kuxî" ji tîpêt latînî veguhastî ye:

Hewqas tu mebeje ev çi hale

Bê sebir mebe welê me nale

Ewn û kerema xwedê havale

*Binve kezamin, binve lo! Lo!*³²⁵

Dîsa di helbesteka din de ya "Celîlê Celîl" bi navê huzan bo zaroka stirana qîzka tiral "Newzad 'Elî Ehmed" ji tîpêt latînî veguhastî ye:

Ez diçme ser mişkê

Qam _ qudumê mi dişkê

Ez diçme ser şuxul

Şuxul mi derdu kul

Ez diçme ser têştê

*Têştê çima mi xuş tê*³²⁶

Dîsa di helbesteka din de ya " Mihemed Emîn" bi navê selaya şevê "Şewket Tahir Sindî" ji latînî veguhastî ye :

Gelo rabin zeman tenge

Xewa cehlê weha renga

Mehu û kirina wê bê denge

Temaşe halê kewê şenge

Xwedaya djimanan cenge

*Ji xew em têr nebûn yareb*³²⁷

Dîsa di helbesteka din de ya "'Elî Şerqawî" ji 'erebî" bi navê bîk "Dr. Nafi' Akreyî" zivrandiye ser zimanê kurdî û dibêjî:

Min bîkeka ciwana hey .. Navê wê miryeme

Çavêt wê weku kezana li warî pîrxeme

Pirça wê ya dirêje

Kezêt weku dar berya

Kirasê wê yê bi rengê ruhan û gulane

Dudanêt wê wekî denkêt hinarane

*Eger rêvebiçît weku ruybar bi leme*³²⁸

Dîsa di helbesteka din de " Hozanvan Qeşe Yusif Se'îd" bi navê hozana melarya zivrandiye ser zimanê kurdî û dibêjî:

³²⁴. Mîkaîl Nalbendyan, *Azadî*, Birader Remezan Hacî Qadir Ji Pîtên Latînî Silavî Ve Guhastî Ye. *R.B*, J10, 3/10/1989, r.5

³²⁵. Emîn 'Lî Bedirxan, *Helbest Ji Zarokan Delalya Zaro Wan*, Hisin Kuxî/ Jitîpêt Latînî Veguhastye, *R.B*, J 29, 13/2/1990, r.7.

³²⁶. Celîlê Celîl, *Huzan Bo Zaroka Stirana Qîzka Tiral*, Newzad 'Elî Ehmed/ Ji tîpêt Latînî Veguhastye, *R.B*, J 29, 13/2/1990. r.7

